WATA

DI NAVBERA SEMANTÎK Û PRAGMATÎKÊ DA

Şêrzad Sebrî Elî

Lêanîn: Nêçîrvan Evdilezîz

SZK

SZK

WATA

DI NAVBERA SEMANTÎK Û PRAGMATÎKÊ DA

Şêrzad Sebrî Elî

Lêanîn: Nêçîrvan Evdilezîz

Ziman

SZK 2007

SZK 03 | ZIMAN 02

Wata di Navbera Semantîk û Pragmatîkê da

Şêrzad Sebrî Elî

Navê pirtûkê yê resen (kurmancîya bi tîpên erebî)

واتا د ناڤبەرا سیمانتیک و پراگماتیکێدا

Lêanîn

Nêçîrvan Evdilezîz

Edîtorî

Ferhad Mûsa

Redakte

Elî Evdo

Rûpelsazî

Ferîd Xelîl

Bergsazî

Mihemed Şêxo

Çapa yekem

Qamişlo, 2023

Weşanên SZKyê, Qamişlo

szkkurdi@gmail.com

00963992854574

Danasîn ne tê da, bêyî destûra SZKyê nabe ku ev berhem ji nû ve bihête çapkirin û weşandin. Hemû mafên vê berhemê ji bo SZKyê parastî ne.

Prof. Dr Şêrzad Sebrî Elî

Sala 1980yî li Sêmêla Dihokê hatîye dinyayê. Li Zanîngeha Dihokê master û li Zanîngeha Soranê doktora qedandîye. Ew aniha li Zanînegeha Dihokê, beşa zimanê kurdî mamosta ye.

Nêçîrvan Evdilezîz

Sala 1993yan li Qamişloyê hatîye dinyayê. Li Fakulteya Ziman û Zanistên Civakî, beşa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Rojavayê lîsansa xwe wergirtîye herwiha Enstîtûya Zanistên Perwerdehîyê qedandîye. Ji 2019an ve endamê Sazîya Zimanê Kurdî (SZK) ye.

Ev pirtûk, nameyeka "master"ê ye, di sala 2008an da pêşkêşî Kolêja Adabê ya Zankoya Dihokê bûye, wekî pişkek ji pêdivîyên pileya masterê di edebê kurdî da. Name bi serperiştîya "Dr Ebdilwahid Xorşîd Dizeyî" bû.

Dîyarî bo ...

Dayik û bavên delal û hêja.

Xwişk û bira û hevalên min.

Hemû hezkerên peyva "kurdî"yê.

NAVEROK

PÊŞGOTIN.....17

PÊŞEK.....21

PIŞKA YEKEM: WATA Û YEKEYÊN WATAYÎ.....25

A. TÊGIHA WATAYÊ.....27

B. FORM Û WATA.....33

C. WATA Û WATAYA PÊWENDÎYÊ.....40

1. PÊWENDÎYA STÛNÎ.....44

2. PÊWENDÎYA ASOYÎ.....46

D. CUREYÊN WATAYÊ.....49

1. WATAYA FERHENGÎ.....51

2. WATAYA FONOLOJÎ.....54

3. WATAYA RÊZIMANÎ.....56

- WATAYA MORFOLOJÎ.....57

- WATAYA SENTAKSÎ.....60

4. WATAYA ŞÊWAZÎ.....66

5. WATAYA DEWRÛBER.....69

6. WATAYA BABETÎ.....73

7. WATAYA MÎTAFORÎ.....74

8. WATAYA VEŞARTÎ.....77

E. YEKEYÊN WATAYÎ....78

1. MORFEMA BEND....80

2. PEYV....80

3. LÊKDAN....80

- PEYVA DARIŞTÎ....81

- PEYVA LÊKDAYÎ Û FRAZA JI PEYVEKÊ MEZINTIR...81

• PEYVA LÊKDAYÎ....81

• FRAZA JI PEYVÊ MEZINTIR....81

-ÎDYEM....82

4. RISTE....82

5. GOTIN....83

6. DEQ....84

7. GOTAR....85

PIŞKA DUYEM: ASTÊN WATAYÊ....87

A. DESTPÊK....89

1. SEMANTÎK....91

2. PRAGMATÎK....93

- NÎŞANKAR....99

- DERKEVTE....101

- GIRÎMANÊN PÊŞÎYÊ....103

- KIRDEYÊN AXIFTINÊ....105

B. WATAYA SEMANTÎKÎ....108

C. BINEMAYÊN WATAYA SEMANTÎKÎ....112

1. HÊMA....118

2. DÎYARDE....122

- HIZIR....122

- TEN....127

D. WATAYA PRAGMATÎKÎ....131

E. BINEMAYÊN WATAYA PRAGMATÎKÎ....136

1. FIRÊKER....138

2. WERGIR....143

3. BABET....145

4. DEWRÛBER....148

PIŞKA SÊYEM: WATA DI NAVBERA SEMANTÎK Û PRAGMATÎKÊ DA....155

A. BOÇÛNÊN ÇEND ZIMANNASAN SEBARETÎ WÊ CUDAHÎYA DI NAVBERA SEMANTÎK Û PRAGMATÎKÊ DA....157

B. PABENDNEBÛNA BI DEWRÛBERÊ VE Û PABENDBÛNA BI DEWRÛBERÊ VE....163

1. PABENDNEBÛNA BI DEWRÛBERÊ VE....163

2. PABENDBÛNA BI DEWRÛBERÊ VE....163

C. YEKEYÊN SEMANTÎKÎ Û YEKEYÊN PRAGMATÎKÎ....164

1. "MORFEMA BEND, PEYV Û FRAZ" Û ÎDYEM.....164

- "MORFEMA BEND Û PEYV Û FRAZ".....164

- ÎDYEM.....167

2. RISTE Û GOTIN.....168

- RISTE.....168

-GOTIN.....168

3. DEQ Û GOTAR.....173

- DEQ.....173

- GOTAR.....173

D. ŞÎYANA ZIMANÎ Û ÇALAKÎYA AXIFTINÊ.....176

1. ŞÎYANA ZIMANÎ.....176

2. ÇALAKÎYA AXIFTINÊ.....177

E. GIRINGÎNEDANA BI NÎŞANKARAN Û GIRINGÎDANA BI NÎŞANKARAN.....180

1. GIRINGÎNEDANA BI NÎŞANKARAN.....180

2. GIRINGÎDANA BI NÎŞANKARAN.....180

F. BICIHANÎNA BINEMAYÊ ALÎKARÎYÊ Û BEZANDINA WÎ BINEMAYÎ.....182

1. BICIHANÎNA BINEMAYÊ ALÎKARÎYÊ.....182

2. DERBASKIRINA BINEMAYÊ ALÎKARÎYÊ.....185

G. XWENDINA HÊMAYÊ Û XWENDINA MÊJÎYÎ.....190

1. XWENDINA HÊMAYÊ.....191

2. XWENDINA MÊJÎYÎ.....191

H. WATAYA FERHENGÎ Û WATAYA MEBESTDAR.....193

1. WATAYA FERHENGÎ.....193

2. WATAYA MEBESTDAR.....195

I. WATAYA AŞKERA Û WATAYA VEŞARTÎ.....195

1. WATAYA AŞKERA.....195

2. WATAYA VEŞARTÎ.....196

ENCAM.....199

LÎSTEYA JÊDERAN.....201

FERHENGOK.....211

ملخص البحث.....215

ABSTRACT.....217

PÊŞGOTIN

"Wata di Navbera Semantîk û Pragmatîkê da", nameya masterê ya Prof. Dr Şêrzad Sebrî Elî ye ku sala 2008an li Zanîngeha Dihokê hatîye pêşkêşkirin û Weşanxaneya Spîrêzê di 2011an da wekî pirtûk weşandîye.

Di vê berhemê da, danerî yeke û cureyên watayê berfireh şirove kirine û di navbera semantîk û pragmatîkê da rola wê berbiçav kirîye. Herwiha her babeteka watayê, bi gelek tewer û binemayan ve û bi nimûneyan zelal kirîye.

Berhema orjînal bi tîpên erebî, binzaravayê behdînî hatîye lêkirin. Ji bo ku berfirehtir belav bibe û berdestî gelek xwîner û xebatkarên zimanî bibe, me baştir dît ku vê berhemê bînin kurmancîya bi tîpên latînî.

Di xebata lêanînê da, bi şertê ku metina resen ji watayê ve wekî xwe bimîne û naverok neyê guhartin, me ev berhem ji hêlên ferheng û ristesazîyê ve li kurmancîya standard guncandîye.

Herçi terma zimannasîyê ku me xwestîye biguhêrin, me cara pêşîn ranekirîye û tenê berginda wê ya ku em bi kar tînin, di nava kevanekê da daye. Nimûne: girê (fraz), gover (devok). Ji cara pêşîn û pê da, me ewa orjînal rakirîyê û tenê berginda wê bi kar anîye.

Me dest nedaye nimûneyên orjînalê û hew ew guhastine tîpên latînî. Belê di nav nimûneyan da hin peyv û riste hene divîyabû -ji bo têgihaştinê- bêne zelalkirin. Loma me bergindên wan peyv û risteyan di nava kevanekê da dane. Nimûne: Hewe (we) stran gotin. / Ez ê birsî me. (Ez birçî me.)

Çi yên kurmancî û soranî bin çi jî yên erebî, farisî û îngilîzî, me sernavên wan berhemên ku wekî çavkanî hatine destnîşankirin, herwekî orjînalê hiştine. Ango ne me wergerandine ne jî anîne tîpên latînî.

Ji ber ku di prosesa lêanînê da bi me ra alîkar bû û pirsên nezalal yek bi yek bersivandin, em malavayîya danerê vê berhemê Prof. Dr Şêrzad Sebrî Elî dikin. Herwiha em gerînendeyê Weşanxaneya Spîrêzê spas dikin ku destûra lêanîna vê berhemê da me.

Sazîya Zimanê Kurdî (SZK)

PÊŞEK

Nav û nîşana vekolînê:

Ev name li jêr navê "Wata di Navbera Semantîk û Pragmatîkê da" ye ku ji bo şirovekirin û dîyarkirina rola watayê di navbera her du astên watayê "semantîk û pragmatîk" da hatîye terxankirin; ji ber ku ev her du astên watayê vekolînê li watayê dikin, lê her yek ji wan di biwareka taybet da.

Giringîya vekolînê:

Giringîya vê vekolînê di wê çendê da ye ku heta niha nameyeka akademî bi vê nav û nîşanê nehatîye encamdan. Herçende di nav zimannasîya kurdî da bi tenê takevekolîneka serbixwe li dor wê cudahîya di navbera semantîk û pragmatîkê da hatîye encamdan, lê belê ji ber giringîya vê babeta watayê û kêmbûna jêderên kurdî li dor vê babetê, me hewl daye heman nav û nîşana wê takevekolînê ku her a serperiştê vê nameyê ye, bikin nav û nîşan ji bo nameyeka akademî.

Keresteyê vekolînê:

Ev vekolîn bi şêwezarê badînî hatîye nivîsîn û nimûneyên wê jî ji axiftina xelkê wê goverê (devok) hatine wergirtin, bi tenê jimareka kêm a nimûneyan ji vekolîn û jêderan hatîye wergirtin.

Rêbaza vekolînê:

Ev name li gor rêbaza erkî şîkarî (analîzî) hatîye encamdan.

Naveroka vekolînê:

Ev vekolîn ji bilî pêşek, encam û kurteya vekolînê bi zimanê erebî û înglîzî, ji sê pişkan pêk dihê:

Pişka yekem: Di vê pişkê da vekolîn li watayê û yekeyên watayî hatîye kirin ku pênc tewereyan bi xwe ve digire, ew jî ev in: "têgiha watayê", "form û wata", "wata û wataya pêwendîyê", "cureyên watayê". Di tewereya cureyên watayê da behsa van cureyên watayê hatîye kirin: wataya ferhengî, fonolojî, rêzimanî, şêwazî, dewrûber, babetî, mîtaforî û veşartî. Di tewereya dawîn da behsa yekeyên watayî hatîye kirin ku ew jî ji "morfema bend", "peyv", "lêkdan", "riste", "gotin", "deq" û "gotar"ê pêk dihên.

Pişka duyem: Di vê pişkê da behsa astên watayê hatîye kirin. Astên watayê jî pênc tewereyan bi xwe ve digirin: "Seretayek ji bo astên watayê", "wataya semantîkî", "binemayên wataya semantîkî" ku ew jî "hêma û dîyarde" ne û dîyarde jî dabeşî hizir û tenî dibe. Di tewereya çarem da behsa wataya pragmatîkî hatîye kirin û di tewereya dawîn da ku tewereya pêncem e amaje bi binemayên wataya pragmatîkî hatîye dan ku ew jî çar binema ne: "firêker, wergir, babet û dewrûber".

Pişka sêyem: Ev pişk taybet bi "wata di navbera semantîk û pragmatîkê da" ye ku neh tewereyan bi xwe ve digire: "boçûnên çend zimannasan sebaretî cudahîya di navbera semantîk û pragmatîkê da", "pabendnebûna bi dewrûberê ve û pabendbûna bi dewrûberê ve", "yekeyên semantîkî û yekeyên pragmatîkî" ku ew jî dabeşî "morfema bend û peyv û lêkdan" û "îdyemê" dibin; herwiha riste, gotin, deq û gotarê jî bi xwe ve digirin. Di tewereya çarem da behsa "giringînedana bi nîşankaran û giringîdana bi nîşankaran", "bicihanîna binemayê alîkarîyê û derbaskirina wî binemayî", "xwendina hêmayê û xwendina mêjîyî", "wataya ferhengî û wataya mebestdar" û "wataya aşkera û wataya veşartî" hatîye kirin.

PIŞKA YEKEM

WATA Û YEKEYÊN WATAYÎ

A. TÊGIHA WATAYÊ

Her ji kevn da giringîyeka zor bi watayê hatîye dan. Bê guman giringîdana bi watayê ji alîyê zanayên gelek zanistan ve, li rola watayê di biwara zanistên wan da vedigere. Ji ber vê yekê gelek caran dihê dîtin ku fîlozof û zanayên cuda cuda li gel zimannasan, di nav vekolînên xwe da behsa watayê dikin û hewl didin ku watayê wekî kakila zanistên xwe bihejmêrin.

Ji ber pişkdarîya zor a watayê di vekolînên felsefe, lojîk û zimanî da; dihê gotin ku watasazî sê cure ne, ew jî: watasazîya felsefî, lojîkî û zimanî.[1] Herçende tu taybetmendîyên hevpişk di navbera wan her sê zanistan da nînin jî bi tenê eger kêmek hebin, lê belê pêdivîyeka zor a wan her sê zanistan û heta wekî niha bi hemahengîya li gel hev heye.[2]

Her zanistek ji zanistên li jor vekolînê li dabêşa (mijar) watayê û wataya hêmayan dike; ew jî ji bo sûd û mifaya xwe ya taybet an ji bo rajeya taybet a zanista xwe.[3] Di vê vekolînê da hewl hatîye dan, bi tenê watasazîya zimanî bihê wergirtin û bi navê semantîk bihê binavkirin û her du cureyên din bihên paşguhkirin.

---

(1) كوروش صفوى، ١٣٨٣، ٢٩.

(2) ستيفن أولمان، ١٩٩٧، ٢٠.

(3) بير جيرو، ١٨، ١٩٩٢.

Zanayên zimanî ji van alîyan ve giringîyê bi vekolînên watayê didin: "wataya peyv û risteyan" û "pêwendî di navbera form û watayê da". Herwisa heman giringîyê bi watayên veşartî û aşkera û civakî jî didin, li gel hewl û pêkolên rijd ên berdewam ji bo danîna teorîyekê ji zanista watayê ra, da ku ev zanist wekî pişkeka binçîneyî ji teorîya zimannasîya nû bihê hejmartin.[4]

Wata wekî asteka zimanî ya serbixwe ku vekolîn li ser hatibe kirin, sala 1838an dîyar bûye, lê ew vekolîn bi vî navê aniha nehatibû binavkirin. Heta ku sala 1883yan, zanayê fransiz "M. Breal" navê "Semantique" li vê asta zimanî kir. Paşê her zû ji bo têgiha "Semantic"ê ya înglîzî hate wergêran.[5] Semantic ji peyva "sema"ya girîkî hatîye ku bi wataya "nîşane" yan "remiz"ê dihê.[6]

Ji bo pênaseya watayê, heta niha pênaseyeka yekgirtî ji layê zanayan ve nehatîye raberkirin, lê her zanayekî li gor boçûna xwe wata pênase kirîye. Hindek ji wan pênaseyan:

1. Plato:

Wata ji pêwendîyeka du layanî ya di navbera du tiştan da pêk hatîye; keresteyek an peyvek di nav zimanî da û tenek ji derveyî zimanî.[7]

---

(4) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ٢٥-٢٦.

(5) ستيفن أولمان، ١٩٩٧، ٢٠.

(6) محمد معروف فتاح، ١٩٩٠، ١٥٦.

(7) ئارا عەلی نەحمەد، ٢٠٠٧، ٤.

"Plato" pêwendîya di navbera peyv û tenî da bi pêwendîyeka yekser dihejmêre ku bi pêwendîya amajeyî dihê nasîn.[8]

Peyv "d+a+r" pêwendîya amajeyî ten

2. Ixwan El-Sefa[9], watayê bi vî rengî pênase dikin:

Ew boçûn e ku yekem car di derûnê da hizir lê dihê kirin.[10] Bi dîtina van zanayan watayeka bingehîn a her peyvekê di her zimanekî da heye ku ji alîyê wê civakê ve ji bo wê hatîye danîn û her dema ew waje yan peyv dihê gotin, yekser wataya wê li dev mirovî dîyar dibe. Bo nimûne, dema peyva "şêr"ê dihê gotin, yekser hizira me bo gîyanwerekê bihêze diçe.

3. Ibn Faris[11], ji bo destnîşankirina wataya peyvên risteyan, li sê astan radiweste:

a. **Wata**: Derxistina tiştê ku di axiftinê da giringî pê hatîye dan ango tiştê mebestdar; ji ber vê yekê delaleta yekê ji bo watayê, mebest e.

---

[8] Jêdera berê, 4.

[9] Ixwan El-Sefa, komeka zanayan bû. Li bajarê Besrayê li başûrê Iraqê sala "983"yan peyda bûne. Zanyarîyên xwe bi şêwazeka dirêj di "52" nameyan da nivîsîbûn. Bitiris Herfûş, 2000, 30.

[10] عبدالقادر عبدالجليل، ٢٠٠٦، ١٤٧.

[11] Ibn Faris, di biwara zimanî da yek ji zanayên ereb ê bi nav û deng e. Navê wî "Ebûl-Hesen Ehmed Bin Zekerîya Bin Faris" e û danîna ferhenga "Meqayîs El-Luxe"yê yek ji karên wî ye. Di sala "395"ê koçî da çûye ber dilovanîya Xwedayî. Receb Ebdilcewad Ibirahîm, 2001, 180.

b. **Ravekirin**: Ango bi dirêjî li ser rawestîn, ji bo şirovekirin û aşkerakirina tiştên ku hatine nixumandin û veşartin.

c. **Şirovekirin (تأويل)**: Ew jî erka dawîn û encama wê ye.[12]

4. Bi dîtina "De Saussure û Ullmann"î, wata di navbera form û watayê da pêwendîyeka alûgor e ku her yek ji wan bêyî ya din dirust nabe.[13] "De Saussure û Ullmann" ber bi wê yekê ve diçin ku nabe form û wata ji hevdu bihêne cudakirin, lê her yek ji wan daxwaza ya din dike, ev jî di mêjîyê takekesên civakeka dîyarkirî da parastî ne.



Hêjayî amajepêkirinê ye em bibêjin her ku guherînek di rêxistina dengên her peyveka destnîşankirî da rûde, yekser ew peyv dê wê wataya heyî ji dest bide û dê watayeka din bide û reng e jî eger ew peyv di ferhenga wî zimanî da nebe, tu watayan nede.

5. Pierre Giraud dibêje: "Wata kêşeyek e; babetek, têgihek û rûdanekê bi xwe ve digire, li gel hebûna amajeyekê ku bikare wê kêşeyê dîyar bike.[14] Giraud watayê bi dorhêlê

---

(12) جمعة سيد يوسف، ١٩٩٠، ١٢٦-١٢٧.

(13) (a) نور الهدى لوشن، ٢٠٠٦، ٢٧.

(b) عبدالقادر عبدالجليل، ٢٠٠٦، ١٤٦.

(14) خضر أكبر حسن كصير، ٢٠٠٤، ٣٩.

ve pabend dike, çinku ew kêşeya ku bi amajeyê wataya wê dîyar dibe, eger di dorhêlê da bi rewiştek an têgihek an rûdanekê ve ne girêdayî be, wê demê ew kêşe tu watayan hilnagire. Herwekî di nimûneyên "destrakirin", "henasekirin" û "ewrhatin"ê da dîyar dibe ku destrakirin amaje ye ji bo silavê û henasekirin amaje ye ji bo gîyandarîya zindîwerî û kombûna ewran amaje ye ji bo hatina baranê."

6. Bi dîtina "Frege"î, "Wata cîhaneka serbixwe ye. Dema ku 'Frege' cîyawazîya di navbera navê taybet û laşê amajepêkirî da dîyar kir, ev hizir li cem wî peyda bû û pê ra derket ku cudahî di navbera 'dal' û 'medlûl'ê da heye. Herwisa amaje bi wê yekê da ku wataya "medlûl'ê nîne ku piranîya zimannasan ji vê yekê ne razî ne, lê belê hemû nav amaje ne ji bo wata yan xwedîyê. 'Frege'î wêneyên berceste yên ku dirust dibin û pêwendîya wan a bi zanîna pêştir ve heye, ji hev cuda kirin. Ev wêne jî têkileka ji hest, soz û vîyana kesî ye. 'Frege' sê cîhanan ji hev vediqetîne: cîhana watayî, cîhana xwedî (bîr, boçûn, hest û soz) û cîhana madî (ten, tişt, rûdan)".[15]

Nebûna pênaseyeka temam û yekgirtî ji bo watayê, wekî di van pênaseyên navborî da hatîye dîyarkirin, li van egeran vedigere:

1. "Wata ne tiştekê berceste ye.

2. Çend cureyên watayê hene.

---

[15] عەبدولواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٣٩.

3. Çend boçûn ji bo pêkhatina watayê hene".[16]

4. Nebûna sînoran ji bo watayê.[17]

Tiştê ku pêdivî pê heye were dîyarkirin ew e ku du astên watayî yên watayê hene û li gor pêkhatin û erka wan di siruşta zimanî da, her astek ji asta din cuda dibe:

Asta yekem: Peyv di mebesta xwe ya resen da bi kar dihê û tu wata û ramanên lawekî (nesereke) bi xwe ve nagire ku bi navê wataya mebestdar dihê binavkirin.

Asta duyem: Peyv di wataya xwe ya resen da bi kar nahê û wata û ramanên nesereke bi xwe ve digire ku bi navê wataya pêwendî dihê binavkirin.[18]

Vêca her dema ku peyv bi wataya xwe ya ferhengî yan bi wataya xwe ya rêzimanî bi kar hat, ev dê bibe semantîk û her dema ku wataya peyvê ya ferhengî hate dûrxistin û mebest hate hebûnê, wê demê ew wata dê biçe di nav biwara pragmatîkê da.

Bo nimûne peyva "baş"ê, eger di çarçoveya wataya xwe ya ferhengî da bi kar hat ku hilgira watayeka gîştî ye, wê demê ew wata dê bi asta semantîkê ve girêdayî be; lê belê eger li gor mebestê wataya peyva "baş"ê hate destnîşankirin, wê demê pragmatîk dê serederîyê di gel bike. Pêdivîya vê yekê jî

---

[16] Jêdera berê, 22.

[17] ئارا عەلی ئەحمەد، ٢٠٠٧، ٨.

[18] شكور كاظم العوادي، ١٩٩٠، ٨٢-٨٣.

bi dewrûbereka guncav heye ku di navbera firêker û wergirî da hebe, herwekî mebesta firêker û wergirî ji peyva "baş"ê, wataya berevajî ya wê be, ango wataya "xirab" be.

Herwisa di vê risteya jêrîn da, eger peyva "gîyanewer"ê bi wataya xwe ya ferhengî li gel wê wataya ku ji encama rêzkirina peyvan di wê risteyê da hat, wê demê ew nimûne dê here di biwara semantîkê da; lê belê eger li dûv mebestê wataya peyva "gîyanewer"ê hate destnîşankirin, wê demê pragmatîk dê serederîyê di gel bike. Vêca li vir ew wataya ku dihê destnîşankirin, çêdibe li dûv mebestê bi wataya "mirov"î bihê yan bi her watayeka din bihê. Pêdivîya vê yekê jî bi dewrûbereka guncav heye ku wê watayê dîyar bike. Ew riste jî eva li xwarê ye:

Ewî gîyanewerî derbêxe (derxe).

B. FORM Û WATA

Hêma (Sign) li du pişkan dabeş dibe: form (Signifier) û wata (Signified). Form di zimanî da peyv e. Bi dîtina "De Saussure"î (1857-1913) peyv ji du regezan pêk dihê:[19] "Yekem wêneyê dengî (Sound image); ev wêneyê dengî ji 'dal'ê pêk hatîye herwiha di şîyan da ye ew wêne şêweyê komkirin û derbirîna peyvê be. Duyem çemk û watayê digihîne, ev jî ji 'medlûl'ê pêk hatîye. Medlûl bi xwe jî ew tişt e ya ku hêmayê dinimîne".[20]

---

[19] سەلام ناخۆش، ٢٠٠٥، ٣٥.

[20] Jêdera berê, 35.

Girêdaneka bihêz û mukum a form û watayê di nav hêmaya zimannasîyê da bi hevdu heye û her yek bi ya din ve girêdayî ye. Hizirkirina di her yekê ji wan da daxwaza ya din dike û tu form nabe form eger wata nebe û tu axiftin jî li ser watayê nabe eger form nebe. Form bê watayê bi tenê wekî tiştekê bêbiha dihê hejmartin, wata jî bê formê nahê hizirkirin û bicihanîn.[21] Ji ber wê pêkvegirêdana bihêz a di navbera form û watayê da, "De Saussure" rijd bû van her du rûyan, form û wata, bi du rûyên pereyî bilêkçûyîne (bişebihîne).[22]

Hêmayên zimanî yekeyên sîstema zimanî pêk tînin ku ew jî pêk ve girêdayî ne û bihayê her yekeyekê ji wan bi bihayê ya din ve girêdayî ye; herwekî "De Saussure" wê çendê di vî wêneyê jêrîn da dîyar dike:[23]



Li vir her bazineyek, nîşandera yek ji hêmayên zimanî ye ku ji form û watayekê pêk dihê.[24] Saussure her hêmayek ji hêmayên zimanî bi hebûneka saykolojî dide zanîn ku du

---

(21) نور الهدى لوشن، ٢٠٠٦، ٢٧-٢٨.

(22) شكور كاظم العوادي، ١٩٩٠، ٩٣.

(23) كوروش صفوى، ١٣٨٣، ٣٩.

(24) Jêdera berê, 39.

alîyan bi xwe ve digire. Herwekî di vî wêneyê jêrîn da dîyar dibe.[25]



Hizir: Mebest pê "wata" ye

Wêneyê dengî: Mebest pê "form" e.

Ji ber vê yekê "De Saussure" dibêje: "Ziman, di navbera deng û hizirê da bazineya pêwendîyê ye ango di hizira wî da deng li beranber "form"ê ye û hizir li beranber "medlûl"ê ye. Dîsa "De Saussure"î ew her du têgih li beranber "derbirîn" û "wata"yê jî bi kar anîne, loma derbirîn dibe deng an form û wata jî dibe hizir an medlûl."[26]

Bi dîtina "De Saussure"î divê sê merc di hêmaya zimanî da hebin:

1. Divê hêmaya zimanî watayekê bide.

2. Divê di nav zimanê civakekê da bihê bikaranîn û ew civak di wê hêmayê da bigihe.

---

[25] فردينان دي سوسير، ١٩٩٨، ٨٥.

[26] مهری باقری، ١٣٨٣، ٢٠٥-٢٠٦.

3. Bikare biçe di nav rêxistinekê da ji hêmayên din ên zimanî.[27]

Bo nimûne peyva "mirov"ê hêmayeka zimanî ye, xwedî watayeka dîyarkirî ye û di nav civaka kurd da dihê bikaranîn û hemû kurd di wataya wê digihin; dîsa dikare biçe di nav rêxistinekê da ji hêmayên din ên zimanî, wekî hatina wê li gel hêmayeka din a zimanî dema dirustkirina frazekê yan dema hatina wê li gel hêmayên din ên zimanî di asta risteyê da:



Ji ber ku têgihîştina watayê ne gelekî dîyar û aşkera bû ku hin caran bi ramana hizir û boçûnê hatîye, ango bi kakila zanista saykolojî yan lojîkê hatîye hejmartin û li hin cihên din bi hevwataya "tiştî-choose" hatîye danîn; ji ber vê yekê piştî "De Saussure"î, hewleka mezin ji bo danîna têgiheka hûr ji bo hizira hêmaya zimanî ji layê zimannasan ve hatîye dan; bi taybetî ji alîyê her du zanayan "Ogden û Richards" ve.[28]

---

(27) منقور عبدالجليل، ٢٠٠١، ٥٨.

(28) كلود جرمان وريمون لوبلان، ٢٠٠٦، ١٩-٢٠.

Her du zanayên înglîz "Richards û Ogden" sêgoşeya watayî, li bin navê "sêgoşeya bincî (bingehîn)-basic triangles" xistîye berçav, ew jî di pirtûka wan da ye, ya bi navê "Wataya Watayê-The Meaning of Meaning" ku di sala 1923yan da belav kirine û bi vî rengê li xwarê ew sêgoşe nîşan dane:[29]

Form: Wêneyê dengî ye ku peyvê dirust dike, yan em dikarin bibêjin hêma ye.

Wata: Hizir û boçûn e.

Jêder: Tiştên berceste û neberceste ne li derveyî zimanî.

Xala giring li vir ew e ku tu pêwendîyeka yekser di navbera form û jêderê da nîne, lê pêwendîyeka rêkeftî ye, loma wekî dîyar e di wê sêgoşeyê da xal di navbera form û jêderê da hatine danîn.[30]

"Claude Germain û Raymond Leblanc" dibêjin: Herçende di wê pêwendîya di navbera boçûn û tiştan da hindek hûrî û detayî di sêgoşeya "Ogden û Richards"î da hene, lê belê tu

[29] Jêdera berê, 19-20.

[30] جمعة سيد يوسف، ١٩٩٠، ١٣٣.

tiştên nû li boçûna "De Saussure"î sebaretî watayê da zêde nekirine. Herwiha ew kesên ku xwe dispêrin sêqolîya zimanî "form, wata, jêder", nikarîne pênaseyeka temam ji bo watayê raber bikin.[31]

"De Saussure", wê pêwendîya di navbera form û watayê da, bi pêwendîyeka "xwebixweyî-arbitrary" datîne ku ew pêwendî ji encama rêkeftina civakê peyda bûye. Herwiha ew peyvên ku ji encama lasayîkirina dengên siruştê hatine binavkirin, ew jî ne siruştî ne çinku ew dengên ku bi siruştê hatine binavkirin, lasayîkirinên siruştê ne, ango siruştên wan peyvan bûne eger ku bi wan navan bihên binavkirin û hejmara wan di nav zimanî da sînordar û kêm e ku bi navê "onomatopîya-onomatopoeia" binavkirî ne û ji encama rêkeftinê wataya xwe digirin.[32]

Ji bo bêhtir selimandina pêwendîya xwebixweyî di navbera form û watayê da, em dê bêhtir di van xalên jêrîn da dîyar bikin:

1. Peyva "dar"ê ji van dengan "d+a+r" pêk dihê ku ev form e, wata jî têgiha "dar"ê ye, li vir pêwendîya di navbera dengên peyva "dar"ê û wataya "dar"ê da heyî, pêwendîyeka remekî (xwebixweyî) ye, çinku eger destpêkê kurdan gotibûya "dar"ê "çîya", niha dê li dev kurdan tiştekê asayî bûya.

Herdîsa ew peyva ku di zimanê kurdî da, wataya "dar"ê dide, dengên wê ji zimanekî heta zimanekê din dihêne guhartin.

---

(31) كلود جرمان وريمون لوبلان، ٢٠٠٦، ٢١.

(32) ابراهيم أنيس، ١٩٥٨، ٧٠-٧١.

Bo nimûne di zimanê erebî da peyva "dar"ê ji van dengan "ش+ج+ر+ة" pêk dihê û di zimanê înglîzî da ji dengên "t+r+e+e" pêk dihê û di zimanê farisî da ji van dengan "د+ر+خ+ت" pêk tê.

2. Ji bo belgandina hebûna pêwendîya xwebixweyî di navbera wan peyvan da ku ji encama lasayîkirina dengên siruştî hatine binavkirin, ew jî ew e ku di hemû zimanên cîhanê da yek binavkirin ji bo wan peyvan nîne. Ne ku tenê bi rêkeftê be ku di nav çend zimanên xwedan yek malbat da wekî hev bin. Hin caran di yek zimanî da çend binavkirin ji bo wan peyvan hene. Herwekî peyva "kukixtî"yê di zimanê kurdî da ku ji bilî navdêra "kukixtî"yê çend navdêrên din jî hene, wekî "ga kotir", "kotir kêwî", "qumrî" û "qumrîyê navmalan".

3. Di nav pêwendîyên watayê da, çend dîyarde hene wê çendê dîyar dikin ku tu pêwendî di navbera form û watayê da nîne. Wekî di dîyardeya "hawbêj- homonymy" û "hevwatayê-synonym"ê da dîyar dibe[33], mebest ji hawbêjê ew e ku peyvek bêhtir ji watayekê hildigire, wekî: Di peyva "deq"ê da dîyar dibe ku du watayên vê peyvê di dîyalekta jor a zimanê kurdî da hene, ew jî: "1. Têkst" û "2. Deqên ku li ser çermê mirovan dihêne çêkirin". Herwiha dîyardeya "hevwatayê-synonym" jî wê çendê diselimîne ku tu pêwendî di navbera form û watayê da nîne, çinku çend peyv di nav her zimanekî da hene heman wataya wan heye; tevî ku şêweyên wan peyvan ji hev cuda ne. Wekî peyvên "wişe, peyv" di zimanê kurdî da.

---

(33) كريم ذكي حسام الدين ٢٠٠٠، ٦١.

Ji bilî çûna peyvê di nav risteyê da ku çend watayan bi xwe ve digire li gor wê dewrûbera ku tê da dihê, ji ber wê yekê eger pêwendî di navbera form û watayê da hebûya, divîyabû ev dîyardeyên ku berî niha hatine behskirin di nav zimanî da nebûna. Ev dîyarde jî wê çendê dîyar dikin ku pêwendîya di navbera form û watayê da heyî pêwendîyeka xwebixweyî ye û ji encama rêkeftina civakê peyda bûye.

4. Ji rastîyên mêjûyî dîyar dibe ku watayên peyvan ji dengên wan nehatine wergirtin, çinku eger watayên peyvan ji dengên wan bihatina wergirtin, divîyabû ew guherînên ku bi ser form û watayên peyvan da dihatin, rûnedabûna, çinku ew guherîn dibine eger ku bi tu rengî pêwendîya form û wataya peyvê bi form û wataya xwe ya resen a berê ve nemîne.[34]

C. WATA Û WATAYA PÊWENDÎYÊ

Ziman dîyardeyeka civakî ye. Bi rêya zimanî mirov hizir û bîrên xwe derdibirîne. Ew hizir û bîr bi peyvên zimanî ve girêdayî ne û bi rêya axiverên wî zimanî, ew peyv ji newekê (nifşek) ji bo nifşeka din dihêne veguhastin û di şîyan da heye bi rêya wan wata û hizirên ku peyv wan hildigirin, peyv di nav ferhengê da tomar bibin û bi navê "wataya ferhengî-lexical meaning" bi nav bibin.

Watayeka gîştî û berbelav a peyvê di ferhengê da heye, lê belê dema ku ew peyv li gel hin peyvên din dihê lêkdan, di çarçoveya risteyeka dîyarkirî da, bi tenê yek wataya

---

(34) ستيفن أولمان، ١٩٩٧، ٩٠.

destnîşankirî werdigire;[35] ew jî li ser wê dewrûbera ku tê da bi kar hatîye dimîne.[36] Lê eger tu wata û ramanên ferhengî yên wê peyva han a ku li gel peyvên din dihê lêkdan nebin, wê demê ew riste tu watayan nade.[37] Wekî di vê nimûneya jêrîn da dîyar dibe:

Azadî zex hajotin.

Di vê risteya jorîn da tu watayên ferhengî di zimanê kurdî da ji bo peyva "zex"ê nînin; ji ber vê yekê ev riste tu watayan nade.

Reng e wataya peyvê ya ferhengî hebe, lê çêdibe dema ku di risteyekê da li gel çend peyvên din bi kar bihê, tu watayan nede.[38] Wekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Dîwar çû.

Tu watayên semantîkî yên vê risteya li jor nînin; ji ber ku kara "çû"yê xwedî sîmayê watayî "biker <+ gîyandar>" e, lê belê di risteya "Dîwar çû" da bikera risteyê "<- gîyandar>" e, ev jî dibe egera dirustbûna risteya nawêze. Lê eger li gel kara "çû"yê bikereka xwedî sîmayê watayî "<+ gîyandar>" bihê, wekî peyva "Nazdar"ê; hingê ew riste dê ji alîyê semantîk ve dirust bibe, çinku watayeka dîyar a wê risteyê di zimanê kurdî da heye.

---

[35] رجب عبدالجواد ابراهيم، ٢٠٠١، ١٩.

[36] سازان رضا معين، ٢٠٠٥، ١٠.

[37] رجب عبدالجواد ابراهيم، ٢٠٠١، ١٩.

[38] Jêdera berê, 19.

Ji bo vê jî heta ku semantîk sûdê ji peyvên ferhengê bibîne, divê du merc li ber çavan bihên wergirtin:

1. Watayeka wê peyvê hebe.

2. Dema ku ew peyv li gel çend peyvên din bihê bikaranîn, watayekê bide.[39]

"Wataya pêwendîyê-Sense relation"[40] sîstemeka aloz e ji wan pêwendîyên ku di navbera keresteyên zimanî bi xwe (bi taybetî peyvan) da heyî pêk dihê ango bi tenê giringîyê bi pêwendîyên di nav zimanî da dide.[41] Bi watayeka din, ev pêwendîya watayî ji pêwendîya peyvê bi berî û piştî xwe ve pêk hatîye. Bo nimûne li wan hemû pêwendîyan vedigere yên ku peyvê di bikaranînê da bi peyvên din ve girê didin.[42] Herwekî peyva "kêşa"yê di van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

Min cigare kêşa.

Min xwe kêşa serî.

Min xwe kêşa ka çend kîlo me.

Di van risteyên jorîn da pêwendîya peyva "kêşa"yê bi berî xwe û piştî xwe ve heye û dîyarkirina wataya wê bi wan peyvan ve girêdayî ye û bê wan peyvan wataya "kêşa"yê aşkera

---

(39) Jêdera berê, 19.

(40) Wataya pêwendî di zimanê kurdî da bi navê "pêwendîya cihî" jî dihê binavkirin.

(41) أف. آر. بالمر، ١٩٨٥، ٣٧.

(42) Aitichison,1993, 81.

û dîyar nabe. Ji vê yekê dîyar dibe ku wataya ferhengî ya her peyvekê dibe beşek ji wataya wê di nav risteyê da. Loma dihê gotin ku: "Riste hêmana sereke ya watayê ye û şeş hêmanên biçûk ji wataya giştî ye."[43]

"De Saussure" di wê bawerîyê da ye ku ziman peyrewekê pêwendîyan e, peyvan bi hevdu ve girê dide û nirx û bihayê her peyvekê di wî cihî da ye yê tê da dihê ku di rastîyê da ziman pêkhatek e ji "dijyekbûnan-opposition".[44] Ev jî wê çendê diselimîne ku bihayê peyvê di risteyê da li gor cihê wê dîyar dibe; ji ber vê yekê guherîna peyvên heman risteyê bi cihên hevdu, bêyî ku bibe egera şikandina yasaya rêzimanî ya wî zimanê dîyarkirî, dibe egera guherîna wataya wê risteyê. Wekî di van nimûneyên jêrîn da dîyar dibin:

Azadî Newzad û Hêriş birin.

Newzadî Azad û Hêriş birin.

Hêrişî Azad û Newzad birin.

Dîsa wataya pêwendîyê, du peyvan an zêdetir bi rêya watayê jî bi hev ve girê dide û çendîn dîyardeyên giring wekî: "hevwata, dijwata, cîyawazî, pêwendîya beş û gişt û bixwevegirtinê" dihêne hebûnê. Jixwe eger di nav wan peyvan da jî amaje nebe yan ne wekî hevdu bin, bi vî rengî "wataya

---

(43) سازان رضا معين، ٢٠٠٥، ٩.

(44) مليكا أفيتش، ١٩٩٦، ٢١٨.

pêwendîyê" û "pêwendîya amajeyî-reference relation"[45] ji hevdu cuda dibin.[46] Wataya pêwendîyê li du cureyan dihê dabeşkirin.[47]

1. Pêwendîya stûnî-Paradigmatic relation:

Pêwendîya stûnî ji wê pêwendîya ferhengî ya di navbera peyvan da û guherîna peyvekê bi peyveka din di heman jîngehê da di asta stûnî da pêk hatîye. Ev jî hokareka sereke ye ji bo jevcudakirina polên rêzimanî yên cîyawaz, wekî polînkirina "navdêr", "hevalnav", "kar" û hwd. Bi watayeka din, bi rêya pêwendîya stûnî di şîyan da ye beşên axiftinê, her yek ji wan li bin pola xwe ya rêzimanî bihê polînkirin, wekî dema ku navdêrek li cihê navdêreka din an hevalnavek li cihê hevalnaveka din ... di heman jîngehê da bihê danîn. Wekî di van nimûneyan da dîyar dibe:

1- Azad yê zîrek e.

2- Newzad yê dirêj e.

3- Hejar yê xirab e.

4- Bêkes yê law (xweşik) e.

---

[45] Pêwendîya amajeyî, mebest pê pêwendîya peyvê bi cîhana jiderve ra ye ku amajeyê bi tişt an rûdan an çawayî yan dîyardeyekê yan her tiştekê din di wê cîhanê da dike. Mihemed Mihemed Yûnis Elî, 2007, 111.

[46] بن خال عبدالله سعيد، ١٩٨٩، ٧٤.

[47] جون لاينز، ١٩٨٦، ٢١.

Di risteya jimar "1" da, peyva "Azad"ê ji pola "navdêran" e û peyva "zîrek"ê ji pola "hevalnavan" e. Peyvên "Newzad", "Hejar" û "Bêkes" di risteyên jimar "2", "3" û "4" da hemû "navdêr" in û li cihê "Azad"î hatine bikaranîn û peyvên "dirêj", "xirab" û "law" di risteyên jimar "2", "3" û "4" da hemû "hevalnav" in û li cihê hevalnava "zîrek"ê hatine bikaranîn. Bi vî rengî polên rêzimanî ji hev dihêne cudakirin.

Dêmek di asta sentaksî da, em dikarin hejmareka bêsînor ji risteyan berhem bînin, ew jî dema ku peyvên her poleka rêzimanî, bi şêweyekê stûnî, li gor yasayên rêzimanî yên zimanekê dîyarkirî, li cihên hevdu bihên bikaranîn. Herwekî di van nimûneyên jêrîn da, ev çende zêdetir dîyar dibe:

1- Azad hat.

2- Newzad çû.

3- Şêrwan mir.

4- Nesrîn kevt.

5- Şirîn sot.

... û hwd.

Di van risteyên jorîn da peyvên "Azad", "Newzad", "Şêrwan", "Nesrîn" û "Şirîn" ... "navdêr-biker" in. Û "hat", "çû", "mir", "ket" û "sot" ... û hwd "kar" in; ango li gor wê yasaya li jor: "biker + kar" em dikarin hejmareka bêsînor ji risteyan berhem bînin.

Pêwendîya stûnî, di nimûneyên berî niha da bi şêweyekê sînordar û bi rêk û pêk nebûye, lê dema ku ev pêwendîya han di nav asta semantîkî da derdikeve, "di şêweyê 'pêwendî'yê da birêkûpêkî û sînordarî dihên dîtin; wekî di hevwatayî, dijwatayî û cîyawazî da"[48] dîyar dibe. Herwekî di vê nimûneya hevwatayê da, ew pêwendîya bi rêk û pêk û sînordar darîçav dibe:

Şirîn ya berketî ye. (Sêmêl)

Şirîn ya can e. (Dihok-Amêdî)

Şirîn ya taze ye/delal e. (Zaxo)

Şirîn ya xin e. (Akrê)

Şirîn ya spehî ye. (Şingal-Şêxan)

Ev nimûneya hevwatayê ya li jor li gor şêwezarên jevcuda bi dest ve hatîye.

2. Pêwendîya asoyî-Syntagmatic relation:

Pêwendîya asoyî, ji pêwendîya sentaksî ya di navbera peyvan da û derketin û guncavbûna wan bi hevdu ra di çarçoveya risteyê da bi şêweyekê asoyî pêk hatîye.[49] Wekî di van nimûneyên jêrîn da dîyar dibe:

Xanî herifî.

Min xanî herifand.

---

[48] فیان سلێمان حاجی سلێڤانەیی، ٢٠٠١، ٩٣.

[49] طالب حسين علي، ١٩٩٨، ٣٣.

Di van nimûneyên jorîn da pêwendîyeka asayî û guncav di navbera peyvên wan risteyan da heye ku bi şêweyekê lojîkî û dirust û li gor yasayên rêzimanî yên dirustkirina risteyan ketine di rêxistin û rêzkirineka temam da. Reng e ku dema bipaşxistin an bipêşxistin di peyvên wan risteyan da bihê kirin, dibe egera şikandina yasaya rêzimanî. Wekî birina peyva "xanî"yê, di wan her du risteyan da li pişt karên "herifî û herifand".

Herwiha cihguherîna karên "herifî" û "herifand"ê di her du risteyên jorîn da li cihên hevdu dê bibe egera têkçûna wata û rêzimana wan risteyan; ew jî ji ber ku desthilata "kar"ê li ser hilbijartina peyvên din heye. Bi watayeka din "kar" biryara wergirtina bi tenê "biker" an "biker" û "berkar"ê dide ku di risteya jimar "1" da, ji ber ku "kar"a risteyê têneper e, bi tenê "biker" wergirtîye, lê di risteya jimar "2" da, "kar"a risteyê têper e, loma "berkar" û "biker" wergirtine.

Ji alîyê semantîkî ve, pêwendîya asoyî bi rêya sîmayên watayî, peyva desthilatdar, peyvên din hildibijêre.[50] Wekî di vê nimûneyê da dîyar dibe:

Azadî stranek got.

Di risteya jorîn da kara "got"ê, peyva desthilatdar e û pêdivîya wê bi "biker"ekê heye ku xwedî van sîmayên watayî be:



(50) ڤیان سلێمان حاجی سلێڤانەیی، ٢٠٠١، ٩٣-٩٤.

Ev sîmayên watayî yên "biker"a "kar"a "got"ê, cîgir in û her ku sîmayek ji sîmayên li jor bihê guhartin, ew riste dê bi risteyeka nawêze bihê nasîn. Wekî di van risteyan da dîyar dibe:

Gîyanewerî stranek got.

Dîwarî stranek got.

Bayî stranek got.

Di risteya "Gîyanewerî stranek got." da sîmayekê watayî ji sîmayên li jor hatîye guhartin, ew jî: "<+ Mirov >" bûye "<- mirov>". Di risteya "Dîwarî stranek got." da du sîmayên watayî hatine guhartin, ew jî: "<+ Mirov> û <+ gîyandar>" bûne "<- mirov> û <- gîyandar> û di risteya "Bayî stranek got." da her sê sîmayên watayî yên "biker"a "kar"a "got"ê hatine guhartin û bûne:

Ji ber vê yekê ew her sê risteyên li jor, dê bi risteyên nawêze bihên hejmartin.

Em dikarin wê karkirina borî ya cureyên wataya pêwendîyê: "1. Pêwendîya stûnî. 2. Pêwendîya asoyî" di nav zimanî da di vî wêneyê jêrîn da ronî bikin:



D. CUREYÊN WATAYÊ:

Hin kes di wê bawerîyê da ne ku ji bo zanîn û dîyarkirina wataya peyvê, bi tenê rêyek heye; rê jî ew e ku mirov vegere ferhengê û wê watayê bizane. Eger ev rêya han ji bo zanîna wataya hindek peyvan guncav be jî em nikarin wataya hemû peyvan bi vê rêyê bizanin, çi ew peyv bi tena serê xwe be yan di nav risteyekê da be, ji ber vê yekê zanayên semantîkê neçar bûn ku cureyên watayê ji hev cuda bikin[51], lê li gel vê yekê jî her zanayekî li gor boçûna xwe cureyên watayê polîn û dabeş kirine. Bo nimûne:

a) Zimannasê ereb "Ibrahîm Enîs", watayê dike çar cure:

1. Wataya fonolojî-Phonological meaning.
2. Wataya morfolojî-Morphological meaning.
3. Wataya sentaksî-Syntactic meaning.
4. Wataya ferhengî-Lexical meaning.[52]

---

(51) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٣٦.

(52) ابراهيم أنيس، ١٩٥٨، ٤٦-٤٨.

b) Zimannas "Leech", heft cureyên watayê destnîşan dike:

1. Wataya çemkî-Conceptual meaning.

2. Wataya barkiraw-Connotative meaning.

3. Wataya şêwazî-Stylistic meaning.

4. Wataya derûnî-Affective meaning.

5. Wataya rengvedanê-Reflected meaning.

6. Wataya pêkvehatinê (hawrêtî)-Collective meaning.

7. Wataya babetî-The matic meaning.[53]

c) Zimannasê kurd "Ewrehmanî Hacî Marif" bi tenê wataya peyvê di zimanê kurdî da destnîşan dike:

1. Wataya rasteqînî-Direct (proper) meaning.

2. Wataya mecazî-Transferred meaning.[54]

d) "John Lyons" watayê li du cureyan dabeş dike:

1. Wataya pesinî-Descriptive meaning.

2. Wataya nepesinî-Non- Descriptive meaning.[55]

e) Zimannas "Cruse" behsa du cureyên watayê dike:

1. Wataya azirandinê (wirujandin)-Propositional meaning.

---

[53] Leech: 1974, 10.

[54] ئەورەحمانی حاجی مارف، ١٩٧٥، ١٠-١١.

[55] جون لاینز، ١٩٨٧، ٣٥.

2. Wataya derbirînê-Expressive meaning.[56]

Dîyar e ku ev cudahîya boçûnan û nebûna polîneka yekgirtî ji bo cureyên watayê, ji ber tertûbelavbûna babeta watayê ye, bi rengekê wisa ku xwe bi hêsanî nade dest û herdem di guherînê da ye.[57] Le belê, tevî vê yekê jî me hewl daye ku em behsa van cureyên watayê bikin:

1. **Wataya ferhengî-Lexical meaning:**

Wataya ferhengî: Ew wata ye ku di gencîneya ferhengê da dihê dîtin. Amajeyê bi wataya peyvê dike, bê ku temaşeyî bikaranîna wê peyvê bike dema ku li gel peyvên din ên zimanî dihê bikaranîn; ku ev yek dibe egera peydabûna watayeka nû ji wê peyva dîyarkirî ra.[58]

Herwiha pêwendîya vî cureyê watayê bi sîmayên watayî ve heye yên ku wataya hoşekî (aqilî) ya peyvê jê dirust dibe.[59] Wekî:



(56) Cruse,1997, 271.

(57) قيس كاكل توفيق، ٢٠٠٠، ٣٨-٣٩.

(58) يحيى عبابنة وآمنة الزعبي، ٢٠٠٥، ٨٣.

(59) عەبدولواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٤٥.

Hin zimannas her du cureyên wataya ferhengî û civakî bi yek cureyê didin zanîn, bê ku tu cudahîyê di navbera wan da bibînin. Çinku bi bawerîya wan erka sereke ya ferhengan ew e ku watayên civakî zelal û şirove bikin. Herwiha çêdibe ku ferheng bi karê vekolîna mijarên sentaksî û morfolojî jî rabin. Herwiha ferhengnivîs ji kevn ve û niha jî watayên peyvan ji watayên civakî werdigirin û di ferhengên xwe da tomar dikin. Ev gav dibe egera wê yekê ku zimannas tu cudahîyê nekin di navbera wan da.[60] Lê di rastîyê da cudahî di navbera wataya ferhengî ya peyvê û wataya wê ya civakî da heye. Cudahî jî ew e ku wataya ferhengî ew wataya peyvê ye ku di ferhengê da heye, lê wataya civakî ew wataya peyvê ya di bikaranînê da ye.[61] Bi watayeka din, wataya ferhengî ew wata ye ku bi rengekê gîştî nûnertîya wataya peyvê dike. Lê wataya civakî di nav risteyê da û li gor dewrûbera zimanî ya ku tê da hatîye, watayê dide peyvê.

Dêmek erka sereke ya ferhengan ew e ku vekolînê li wataya ferhengî ya peyvê bikin ji alîyê şirovekirin û ravekirina wataya wê peyvê ve, ew jî bi rêya anîna watayên gîştî yên wê peyvê. Hindek caran jî ferheng amajeyê bi nijada peyvê jî dike; wekî dema ku ew peyv ne peyveka resen a wî zimanî be, lê ji encama kartêkirina zimanekê din ew peyv hatibe di nav wî zimanê dîyarkirî da. Herwiha şîyanên wisa yên ferhengan hene ku bi karê dîyarkirina mijarên morfolojî yên peyvê rabin; ka gelo ew peyv "navdêr" e yan "kar" e yan "hevalnav" e ... û hwd.

---

(60) ابراهيم أنيس، ١٩٥٨، ٥٠-٥١.

(61) رانيا سالم سلامة الصرايرة، ٢٠٠٢، ١٩١.

Lê belê ev yek wê çendê nagihîne ku peyva ferhengî xwedî watayeka dîyarkirî ye. Wataya ferhengî ya peyvê wê demê dîyar dibe, dema ku di nav dewrûbereka zimanî da bi kar bihê. Wataya peyvê, ji encama kartêkirina peyvên din li ser wê peyvê di wê rêzkirina ku tê da hatîye, dîyar dibe. Ev jî dibe egera wê yekê ku wataya ferhengî bibe beşek ji wataya wê di nav risteyê da.

Zanayên nû yên zimanî sê taybetmendîyan ji bo wataya ferhengî dîyar dikin ku ew jî "wataya gîştî, wataya hemecor û wataya necêgîr" in.[62]

a) Wataya gîştî:

Herwekî hatîye dîyarkirin, mebest ji wataya gîştî ew e ku watayeka gîştî ya her peyvekê di nav ferhengê da heye û dema ku peyv di nav risteyekê da dihê bikaranîn, wê demê wataya wê peyvê dihê destnîşankirin. Bi watayeka din, wataya ferhengî ya peyvê bi rêya peyvên berî û piştî wê peyvê di nav çarçoveya risteyê da dîyar dibe. Wekî çawa wataya peyva "bilind"ê di van risteyan da dîyar dibe:

1. Ev çîyaye yê bilind e.	(bi wataya berzî û mezinîyê hatîye.)
2. Evro dular yê bilind e.	(bi wataya nirx û bihayîyê hatîye.)
3. Astê wî mamostayî yê bilind e.	(bi wataya zanîn û zanistê hatîye.)

(62) a) عبدالقادر عبدالجليل، ٢٠٠٦، ٢١٩.

b) فريد عوض حيدر، ٢٠٠٥، ٥١.

b) Wataya hemecor:

Mebest ji vê taybetmendîyê ew e hin peyv di nav ferhengê da hene ku xwedî watayên hemecor in ango zêdeyî watayekê ji wan ra heye. Çi ew peyv hawbêj bin an bi ber her dîyardeyeka din bikevin û dema ku di dewrûbereka dîyarkirî da derkevin, wê demê wataya wan peyvan dîyar dibe. Wekî derketina peyvên "ber" û "şîr" di dewrûberên jevcuda da.

c) Wataya necêgîr:

Ji ber ku wataya peyvê tûşî guherînê dibe, wataya ferhengî watayeka necêgîr e. Vêca çêdibe ku wataya peyvê berfireh bibe yan berteng bibe yan ji bo her watayeka din bihê veguhastin, herwiha çêdibe ku wataya peyvê bilind bibe yan nizm bibe. Zanayên zimanî li bin navê "guherîna watayê-semantic change yan semantic shift" vekolînê li vê guherînê dikin.[63]

Hêjayî gotinê ye ew guherînên ku di watayên peyvên ferhengî da rûdidin, guherîna wan li gel guherîna civakî peyda dibe.

2. **Wataya fonolojî - Phonological meaning:**

Ew wata ye ku alîyê dengî roleka mezin di dîyarkirina wê da dilîze.[64] Bi watayeka din wataya fonolojî bi rêya "fonemên kertî-segmental phoneme" û "fonemên nekertî-suprasegmental phoneme" yên zimanî dîyar dibe.[65]

---

(63) فريد عوض حيدر، ٢٠٠٥، ٥١.

(64) صفية مطهري، ٢٠٠٣، ٣١.

(65) a) ابراهيم انيس، ١٩٨٥، ٤٦-٧٧. b) محمود عكاشة، التحليل اللغوي، ٢٠٠٥، ١٧-١٨.
c) فريد عوض حيدر، ٢٠٠٥، ٣٠.

Bo nimûne di nav fonolojîya kurdî da, dema destnîşankirina fonemên wê bi rêya "cotukeyan-minimal pair".[66] Fonem roleka mezin di dîyarkirina watayê da dilîze û her li ser vê bingehê wataya peyvan ji hev dihê cudakirin. Herwekî derketina fonemên: /b/, /s/, /d/ di peyvên "bar", "sar" û "dar"ê da ku li vir ji ber hatina wan her sê fonemên cuda di wan her sê peyvên jorîn da, watayên cuda li wan peyvan peyda kirine. Herwiha fonemên nekertî jî roleka mezin di dîyarkirina wataya wan yekeyên watayî da dilîzin; ewên ku li gel derdikevin.

Bo nimûne cihguherîna "hêzê-stress" di peyveka dîyarkirî da, dibe egera guherîna wataya wê peyvê. Wekî di peyva "firîn"ê da dîyar dibe; dema ku hêz bikeve ser dengdêra birga yekem a wê peyvê, dê bi wataya "ew firîn" bihê. Lê dema ku hêz bikeve ser dengdêra birga dawîn ji heman peyvê, dê bibe "navê karê". Herwiha di "awazeyê-intonation" da jî li gor guherîna rade yan pileya wê di heman risteyê da, çend wata jê dirust dibin. Wekî di van risteyan da dîyar dibe:

1. Azad qutabîyekê zîrek e. (ragihandin)

2. Azad qutabîyekê zîrek e! (sersurman, matmayîn)

3. Azad qutabîyekê zîrek e? (pirsyar)

[66] Cotuke: "Ew peyvên ku ji bilî takedengekî, hemû dengên wan wekî hev in û ev cîyawazîya wî takedengî watayeka cuda dide wan peyvan." Wirya Umer Emîn, 1982, 434

"Firth", cextê li wê yekê dike ku dirustkirina peyvan bi rêya pêkvehatina fonemên ku li dûv hev dihên, babeteka giring e ji bo şirovekirina zimanî; çinku rola pêkvehatina foneman di dîyarkirina watayê da heye.[67] Wekî di van nimûneyan da dîyar dibe:

1. "Sertiraşxane, strî".

2. "Sişar, lrîn".

Eger em li peyvên jimar "1" binêrin, em ê bi rengekê asayî bibînin ku peyvên watadar ên zimanê kurdî ne; ji ber ku hatina wan foneman li dûv hev di wan peyvan da di siruşta fonemên kurdî da guncav e. Lê belê di peyvên jimar "2" da hatina fonemên /s/, /ş/ di peyva "sişar"ê da û fonemên /l/, /r/ di peyva "lrîn"ê da li dûv hev ne guncav e. Ev yek ne li gor siruşta fonemên kurdî ye, loma peyvên "sişar û "lrîn"ê di zimanê kurdî da tu watayan nadin.

3. Wataya rêzimanî-Grammatical meaning:

Ev cureyê watayê dabeşî du cureyan dibe, ew jî "wataya morfolojî û wataya sentaksî" ne. Herçende wataya morfolojî vekolînê li wataya peyvê dike û wataya sentaksî vekolînê li wataya risteyê dike jî lê belê pêwendîyeka mukum û bihêz di navbera wan her du cureyan da heye.

---

(67) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١١٠-١١١.

a) Wataya morfolojî-Morphological meaning:

Ew curewata ye ku vekolînê li pêkhata morfolojî ya peyvê dike ku bi rêya şêweyê peyvê, wataya peyvê dîyar dibe.[68] Bi watayeka din peydabûna wataya morfolojî girêdayî şêwe û pêkhata wê peyvê ye ya ku dihê dîtin.[69] Bê guman her guherîna ku di pêkhat û şêweyê peyvê da rûde, dê bibe egera guherîna wataya wê peyvê; ew jî bi rêya zêdekirin an kêmkirina morfemekê bi ser pêkhata morfolojî ya wê peyvê[70] da. Wekî di van nimûneyan da dîyar dibe:

1.	Hat	———	hatim.
2.	Çû	———	çûyîn.
3.	Girt	———	girtn.
4.	Axêvt	———	axivt.
5.	Brajt	———	birijt.
6.	Heraft	———	herift.
7.	Hingavt	———	hingivt.[71]

Di nimûneyên "1", "2" û "3" da, morfemên "m", "în" û "n" ku hin ji wan ji yek fonemê dirust bûne wekî: /m/, /n/ û hinek ji fonemekê zêdetir wekî morfema "în"ê ku ji du

---

(68) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ١٣.

(69) صفية مطهري، ٢٠٠٣، ٣٢.

(70) عبدالقادر عبدالجليل، ٢٠٠٦، ٢٠٦.

(71) Nimûneyên "6-7" ji Fadil Umer, 1986, 270. hatine wergirtin.

foneman pêk dihê û piştî zêdekirina van morfeman li karan, hemû guherîne û wataya wan jî hatîye guhartin. Herwiha morfemên: "ê û a"yê jî ji yek fonemê pêk dihên û piştî rakirina wan di nimûneyên jimar "6" ,"5" ,"4" û "7" da, ew kara têper kirine têneper û herwekî nimûneyên "2" ,"1" , "3" wataya wan jî hatîye guhartin.

Her di nav asta morfolojî da, di piranîya peyvan da zêdekirina morfemekê li destpêk an li nav an li dawîya peyvê, dibe egera guherîna wataya wê peyvê.[72] Wekî di van nimûneyan da dîyar dibe:

Kar	Pêşgir	Nêvgir (navgir)	Paşgir
Gera	vegera	gêra	gerave
Rijt	darijt	rêjt	rijteve[73]

Di van nimûneyên borî da karên "gera û rijt"ê du karên sade yên têneper in, lê dema ku "pêşgirên-prefix" "ve-" û "da-"yê berî wan karan cih bigirin, wan ji karên sade dikin darîştî. Bê guman wataya wan jî dihê guhartin. Lê dema morfema "-ê-"yê di nav wan da dihê ku "nêvgir-infix" e; wan her du karan dike têper û wê demê wataya wan jî dihê guhartin. Herdîsa dema ku "paşgira-suffix" dubarekirinê "-eve" bi wan karan ve dibe, herwekî hatina "pêşgir"ê li gel wan karan, wan dike darîştî û wataya wan jî diguhêre.

---

(72) عبدالكريم مجاهد، ٢٠٠٥، ٣٦٤.

(73) فاضل عمر، ١٩٨٦، ٢٧١ -٢٧٢.

Bê guman kartêkirina şêweyê morfolojî yê peyvan li wataya sentaksî heye û ev jî kartêkirinê li wataya gîştî dike.[74]

Bo nimûne karên "gera" û "rijt"ê bi tenê pêdivîya wan bi "biker"ê heye û hin caran "berkara nerasterast" jî werdigirin; çinku ew kar têneper in. Lê belê pêdivîya karên "gêra" û "rêjt"ê bi "biker" û "berkar"ê heye, li gel wergirtina "berkara nerasterast", çinku ew kar têper in. Ev jî bê guman kartêkirinê li wataya gîştî dike. Wekî di van nimûneyan da dîyar dibe:

Hwîn (hûn) geran. (têneper e)

Azadî hwîn gêran. (têper e)

Av rijt. (têneper e.)

Azadî av rêjt. (têper e)

Ango kartêkirina yekeya morfolojî, "morfemê-morpheme", li watayê heye[75], ew jî dema ku pişkdarîyê di çêkirina peyvên nû da dike ku hin caran dikare wê peyva ku di gel hatîye ji beşeka axiftinê bo beşeka din a axiftinê biguhêre. Herwekî di van nimûneyan da dîyar dibe:

Hat	"kar" e	—	hat + î	—	navê bikerê "navdêr".
Sot	"kar" e	—	sot + î	—	navê bikerê "navdêr".
Keft	"kar" e	—	keft + î	—	navê bikerê "navdêr".
Girt	"kar" e	—	girt + î	—	navê berkarê "navdêr".

(74) محمد محمد داوود، ٢٠٠١، ١٨٣.

(75) Jêdera berê, 183.

hilbijart	"kar" e	—	hilbijart + î	—	navê berkarê "navdêr".
Serjêkir	"kar" e	—	serjêkir + î	—	navê berkarê "navdêr".
Çû	"kar" e	—	çû + n	—	navê karê "navdêr".
Bû	"kar" e	—	bû + n	—	navê karê "navdêr".
Şirîn	"hevalnav" e	—	şirîn + î	—	navdêra dariştî "navdêr".
Bilind	"hevalnav" e	—	bilind + î	—	navdêra dariştî "navdêr".
Xweş	"hevalnav" e	—	xweş + nav "navdêr"	—	navdêra lêkdayî "navdêr".
B	"pêşgir" e	—	b + dil "navdêr"	—	hevalnava dariştî "hevalnav".
Bê	"pêşgir" e	—	bê + dil "navdêr" e	—	hevalnava dariştî "hevalnav".
Bejn	"navdêr"	—	bejn + zirav "hevalnav" e	—	hevalnava lêkdayî "hevalnav".

b) Wataya sentaksî-Syntax meaning:

Wataya sentaksî ew wata ye, "ya ku ji encama pêwendîyên sentaksî di navbera peyvan da peyda dibe ku her peyvek li gor yasayên rêzimanî cihekê dîyarkirî werdigire û divê erkeka sentaksî ya her peyvekê di wê pêkhatê da li gor cihê wê hebe".[76] Ev rêxistina endazeyî ya ku di navbera regezên risteya zimanekê dîyarkirî da heye, ji encama pêwendîya regezên sentaksî û regezên semantîkî peyda dibe[77], çinku

---

[76] عبدالكريم مجاهد، ٢٠٠٥، ٣٧٠.

[77] صفية مطهري، ٢٠٠٣، ٣٣.

"karlêkkirin di navbera regezên sentaksî û regezên semantîkî da heye, herwekî çawa regeza sentaksî di nav risteyê da wataya binçîneyî dide regeza semantîkî ya ku alîkarîya wê dike ji bo cudakirin û destnîşankirina regeza semantîkî, herwiha regeza semantîkî jî alîkarîya regeza sentaksî ji hin alîyan ve dike ji bo cudakirin û destnîşankirina regeza sentaksî ku di navbera her du alîyan da wergirtin û dan û alûgorkirineka bandorker a berdewam heye".[78] Ji ber vê yekê "John Lyons" dibêje: Sentaks û semantîk bi hev ve girêdayî ne û zehmet e ku em sînoran di navbera wan her du şaxan da deyînin[79], ji ber ku eger riste ji alîyê sentaksî ve dirust be û ji alîyê semantîkî ve çewt be, wê demê ew riste dê risteyeka nawêze û nepesendkirî bihê hejmartin. Wekî di van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

! Me şerbet xwarin.

! Bera duhî lê kir.

! Pezî stran gotin.

! Azadî wane kujt.

! Wan zad vexwar.

Ev risteyên li jor, dema ku ji layê semantîk û sentaksî ve dirust bibin, dê pesend bibin. Herwekî li xwarê dîyar dibe:

Me kutilk xwarin.

Gijlukê (teyrok) duhî lê kir.

Hewe (we) stran gotin.

Azadî balindeyek kujt.

Ewan (wan) av vexwar.

---

(78) محمد حماسة عبداللطيف، ٢٠٠٦، ١٤٣.

(79) نور الهدى لوشن، ٢٠٠٦، ٨٦.

"Chomsky", xwedîyê teorîya berhemînan û veguhastinê, cextê li wê çendê dike ku ji bo ravekirina risteyê bi ravekirineka watayî ya dirust, zanîna pêwendîyan di "rûyê jinavda-deep structure" da pêwîst e. Ango vekolîn li regezên pêkhata risteyê bihê kirin û herçî regezên veguhastinê di wê risteyê da hene bihên dîyarkirin.[80] Wekî di vê risteya jêrîn da dihê dîtin:

Rûyê jiderve - Ez jî dê dergehê wê girim.



(80) عبدالقادر أبو شريفة وآخرون، ١٩٨٩، ٣٩.

Her li ser wataya risteyê her du zanayên zimanî "J.J. Katz" û "J.A. Fodor", sala 1963yan gotarek bi navê "Pêkhat di Teorîya Semantîkê da-The Structure of Semantic Theory" belav kir. Di wê gotarê da amaje bi wê yekê kirin ku wataya risteyê bi rêya wataya peyvan û pêwendîyên wan di çarçoveya risteyê da dîyar dibe.[81] Dîsa "Katz û Fodor"î her di wê gotarê da çar armanc dîyar kirin ku di watasazîya risteyê da dihêne bicihanîn, ew jî:

1. Dîyarkirina mijî û mijdarîya nerêzimanî ji bo risteyê.

2. Destnîşankirina hejmareka ravekirinan ji bo risteyê, ew jî bi rêya wan parçeyan dîyar dibe yên ku li gel wê risteya destnîşankirî dihên.

3. Dîyarkirina nawêze û namoya semantîkî ji bo risteyê.

4. Dirustkirina hindek risteyan, çi ew riste bihên ravekirin an nehên ravekirin ji bo risteyên din.[82]

Bê guman ji bo rêxistina peyvan di nav sînorê risteyê da, yasayên rêzimanî yên her zimanekî hene û ji encama wê rêxistinê wataya wê risteyê dîyar dibe û her ku bipaşxistin an bipêşxistinek di nav peyvên wê risteyê da rûde, dê yekser wataya wê risteyê bihê guhartin. Ew jî eger ji yasayên rêzimanî yên wî zimanî derneketibin, lê bi tenê cihê peyvan û erka wan a rêzimanî hatibin guhartin. Herdîsa divê ew riste ji

---

(81) علي زوين، ١٩٨٦، ٩٣-٩٤.

(82) كلود جرمان وريمون لوبلان، ٢٠٠٦، ٣١-٣٢.

alîyê semantîkî ve jî dirust û pesend be. Herwekî van risteyên li xwarê ku li ser vê yasaya rêzimanî ya zimanê kurdî hatine birêxistin: "biker + berkar + kar", ew riste jî ev in:

Azadî	Newzad	bir.
Biker	berkar	kar
Newzadî	Azad	bir.
Biker	berkar	kar

Di zimanê kurdî da hertim "biker" û "berkar" berî "kar"ê dihên û her dema ku "kar" berî her yekê ji wan pişkdaran bihê, wê demê ew riste dê bi risteyeka nerêzimanî bihê nasîn, wekî:

* Azadî	bir	Newzad.
Biker	kar	berkar
* Bir	Azad	Newzad.
Kar	biker	berkar

Hin caran "biker" dikeve dawîya risteyê, ew jî ji bo mebesta derbirîna sersurman û şanazîyê ye.[83] Wekî di van risteyan da dîyar dibe:

Biraderê min î tu!	———	sersurman.
Deyika Azad î tu!	———	sersurman.
Qutabî ne em.	———	şanazî.
Pêşmerge me ez.	———	şanazî.

(83) أحمد حسن فتح الله، ١٩٩٠، ٤٥-٤٦.

"Berkar" jî "hin caran ... dihê serê risteyê ew jî ji bo ku bêhtir tekezîyê li watayê bike... ev rewş bi tenê wê demê çêdibe dema ku berkar navdêr be".[84] Wekî di van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

Deyika wî	mast	mehand.
biker	berkar	kar
Mast	deyika wî	mehand.
berkar	biker	kar
Azadî	zad	xwar.
biker	berkar	kar
Zad	Azadî	xwar.
berkar	biker	kar
Ewê	landik	hejand.
biker	berkar	kar
Landik	ewê	hejand.
berkar	biker	kar
Azadî	serê wî	şikand.
biker	berkar	kar
Serê wî	Azadî	şikand.
berkar	biker	kar

[84] ڤیان سلێمان حاجی سلێڤانەیی، ٢٠٠١، ٨٨.

4. Wataya şêwazî-Stylistic meaning:

Ev cureyê watayê, parçeyek ji zimanî ye ku di bikaranîna xwe da girêdayî barê civakî ye. Hin peyv hene ku di şîyan da heye bi rêya wan an şêweyê gotina wan cureyê dîyalektê bihê zanîn.[85]

Bo nimûne, di van risteyên jêrîn da, bi rêya gotina wan peyvên ku tê da bi kar hatine, dîyar dibe ka ew mirov bi ser kîjan dîyalekt, devok û navçeya cografî ve ye. Bo nimûne:

Hingêt nivistîn. — Amêdîyê

Destê hevala min şewitîye. — Şingal[86]

Kevnika li serê wê. — Zaxo

Tu diqarî bihê. — Şêxan

Devoka behdînî (dîyalekta jor)

Ewan goşt bijart. — Dihok

Tu yê çi tovî. — Akrê

Em ê çin Nevrozê. — Sêmêl

Min nan dexom. — Hewlêr

Dîyalekta naverast

Min sibeyînê erom. — Silêmanî

---

[85] Leech: 1974, 16.

[86] سەعید حەجی تاهر و پیرۆز حسێن ئەحمەد، ١٩٩٨، ١٣٨.

Hin ji peyvên din "cureyê babetê aşkera dikin (zanist, edeb an ragihandin ...) û herwiha pêwendîya fermî û nefermî ji hev cuda dikin".[87] Wekî pêwendîya di navbera "ajokar û siwar"î, "hemwelatî û desthilat"ê, "heval û heval"î, "dayik û keç"ê, "polîs û efser"î da û hwd.

Li vir bikaranîna peyvan dimîne li ser barê rewşenbîrî jî regez, ayîn, rêzgirtin, cureyê pêwendîkirinê (serzarî yan nivîskî) û wê pileya civakî ya di navbera firêker û wergirî da.[88]

Bo nimûne, dema ku efserek di bingeha polîsan da gazî polîsekî dike, bi navê polîsî bi xwe gazî dike. Lê belê dema ku polîs bersiva wî bide, bi navê wî efserî gazî nake, lê dê bibêjîyê "ezbenî yan gewrim an efser ... û hwd". Ev jî sînor û astengîyan dixe di rêya bikaranîna zimanî da. Lê belê dema du heval li gel hev biaxivin, dê bi navê hevdu gazî hev bikin. Bi vî rengî pêwendîyên fermî û nefermî ji hev dihên cudakirin.

Mirov dikare wataya hin peyvên di nav deqeka dîyarkirî ya zimanekê destnîşankirî da bi rêya zanîna rehend û astên cuda yên wan peyvan, destnîşan bike.[89] Wekî:

Steed (poetic)

Horse (general)

Abode (poetic)

Home (general)

---

(87) بن خالّ عبدالله سعيد، ١٩٨٩، ١٧.

(88) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٢.

(89) سازان رضا معين، ٢٠٠٥، ١٢.

Di zimanê înglîzî da, xelk bi gişti peyvên "horse" û "home"ê bi kar tînin ku "horse" ji bo "hesp"î û "home" ji bo "xanî"yî bi kar tînin. Lê torevan (wêjevan), nivîskar û hozanvan di nav berhemên xwe da li şûna peyva "horse"ê peyva "steed"ê bi kar tînin û li şûna peyva "home"ê peyva "abode"ê bi kar tînin.[90]

Ev cureyê peyvan di zimanê erebî (dîyalekta Iraqê) da jî hene. Wekî:

ملعقة	"edebî" ye.
خاشوگه	"gişti" ye.
طبق	"edebî" ye.
صحن	"gişti" ye.

Herwiha heman peyv di zimanê kurdî (dîyalekta jor) da jî hene. Wekî:

Hevjîn	"edebî" ye.
Jin	"gişti" ye.
Bazar	"edebî" ye.
Sîk	"gişti" ye.

Di wataya şêwazî da, "Crystalî şêwazên cur bi cur di zimanê înglîzî da ji hev cuda kirine:

1- Taybetîyên şêwazî yên herdemî:

a. Kesayetî (zimanê filan û bêhvan)

b. Dîyalekt

Dem (zimanê sedsala nozdehan)

---

[90] Leech, 1974, 17.

2- Guftûgo:

a- Şêwe (nivîsîn, axiftin)

b- Beşdarîkirin (du kes, ji ber xwe ve)

3- Taybetîyên şêwazî yên demkî:

Babet (zimanî, zanistî)

Paye (bi rêzdarî, bazarî ...)"[91]

Divê bihê gotin ku ew peyvên navbirî yên ji alîyê xelkê giştî yê wan zimanên ku berî niha hatine destnîşankirin, ango zimanên "înglîzî, erebî û kurdî" li gel wan peyvên beranberî wan dihêne bikaranîn ji alîyên nivîskar û torevanên wan zimanan ve, watayeka çemkî bi xwe ve digirin; lê ew guherîna bi ser wataya wan da dihê, ji alîyê şêwazî ve ye, "vê yekê jî hêla hin kes guman bikin ku peyvên hevwata yên temam di zimanî da hene".[92]

5. Wataya dewrûber-Contextual meaning:

Tu watayên dîyarkirî yên peyvê di nav ferhengê da nînin, lê watayeka wê ya giştî heye. Dema ku peyv li gel hin peyvên din di nav çarçoveya risteyeka dîyarkirî yan deqekê da bi kar bihê, hingê ew peyv dibe xwedî watayeka rasteqîneyî û dîyarkirî. Ev jî wê yekê digihîne ku ne merc e bikaranîna heman peyvê ji risteyekê heta risteyeka din heman watayê bide, lê çêdibe

---

(91) محمد معروف فتاح، ١٩٩٠، ١٥٩.

(92) محمد معروف فتاح، ١٥٩-١٦٠.

ku çend watayên cuda bide. Ev yek jî li ser wê dewrûbera zimanî dimîne ya ku ew peyv tê da bi kar dihê. Herwekî "Fêrs-Firth" û layengerên wî cextê li vê yekê dikin û dibêjin: "Piranîya yekeyên watayî dikevine bi rex û dorên yekeyên din ve û wataya wan yekeyan nahê saloxkirin û destnîşankirin, bêyî liberçavgirtina yekeyên din ên ku dikevine rex û dorên wê yekeya watayî."[93] Wekî di van risteyan da dîyar dibe:

1- Ev zade yê xweş e.

2- Ev xanîye yê xweş e.

3- Ev ezmûne ya xweş e.

4- Ev geşte ya xweş e.

Di van risteyên jorîn da peyva "xweş"ê di her risteyekê da li gor wê dewrûbera zimanî ya ku tê da bi kar hatîye, wataya wê ji risteyekê heta risteyeka din dihê guhartin.

Bo nimûne, di risteya jimar "1" da, peyva "xweş"ê bi wataya "tam û çêj"ê hatîye. Di risteya jimar "2" da, her ew peyv ango "xweş" bi wataya "birêkûpêkî"yê hatîye. Di risteya jimar "3" da, her heman peyv bi wataya "sanehî"yê (hêsan) hatîye û di risteya jimar "4" da, ew peyv bi wataya "keyf û şadî"yê dihê.

Nimûne ji bo deqê:

"Berî sala 1974 z malek nêzîkî rwîbarekê û di nav gundekî da bû. Jîyana wî gundî li ser terş û tewalî û çandinê bû. Ew rwîbar ji werzekî bo werzekî dîtir ava wî kêm û zêde dibû,

---

(93) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٦٨-٦٩.

hindek caran ava wî gelek kêm dibû û hindek carên dîtir, dema ku berf û baran dihatin ava wî rwîbarî gelek zêde dibû. Rojekê ava wî rwîbarî gelek rabû heta ku buye egerê hindê ew mal ji wêrê biçît."

Di vê deqê da du caran peyva "mal"ê û du caran peyva "gund"ê dubare bûne ku her peyvek ji wan peyvan her carekê bi watayekê hatîye. Peyva "mal"ê cara yekem bi wataya "xanî-bînayet"ê hatîye ku nêzîkî robarî cih digire û cara duyem bi wataya "xêzan-ayle"yê hatîye ku rabûna avê bûye eger ew xêzan ji wir bar bikin. Herwisa peyva "gund"ê jî wekî peyva "mal"ê her carekê watayekê dide; cara yekem peyva "gund"ê wekî "dever" hatîye ku ew mal li wê deverê ye û nêzîkî robarekî bi cih dibe û cara duyem peyva "gund"ê bi wataya "xelk û mirov"an hatîye ku jîyana wan li ser terş û sewal û çandinîyê ye.

Ev nimûneyên li jor cextê li wê çendê dikin ku wataya peyvê bi tenê di dewrûberê da dîyar dibe "ji ber vê yekê Firth biryarê dide ku eger ne di nav dewrûberên yekeyên zimanî da be ango danîna peyvê di dewrûberên jevcuda da, wataya peyvê dîyar nabe".(94)

Ji vê çenda borî dîyar dibe ku du alî ji wataya dewrûbera zimanî dihêne zanîn ku eger ew her du alî jev cuda bin jî lê belê ew her du alî dibine temamkerên hevdu. Ew her du alî jî ev in:

---

(94) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٦٨.

1- Wataya peyvê li gor dewrûbera zimanî ya tê da dihê gotin, dihê destnîşankirin ku wataya peyvê dibe beşek ji wataya dewrûberê hemûyî.

2- Wataya dewrûberê heye ku bi rêya watayên wan peyvên ku tê da dihêne gotin, dihê destnîşankirin û ew pêwendîyên di yek pêkhatê da wan peyvan pêk ve girê didin.[95]

Hin caran ji bo dîyarkirina "wataya dewrûber" divê dewrûbera nezimanî jî bihê raçavkirin ku mebest pê komeka regezan e ku helwesta axiftinê jê dirust dibe. Hin ji wan regezan: Kesayetîya firêker û wergirî û barê wan ê rewşenbîrî û kesayetîyên din, eger hebin, ên di axiftinê da amadebûyî ji bilî firêker û wergirî û dîyarkirina wê pêwendîya wan a bi reftara zimanî ve heye, li gel wan hokar û dîyardeyên civakî yên pêwendîya wan bi axiftinê ve heye, wekî seqayê û rewşa sîyasî û cihê ku axiftin lê dihê gotin, herwiha regeza kartêkirina ku axiftin li pişkdaran dike, wekî qayilbûn an êşandin an kenandin ...[96] û her regeza din a pêwendîya wê bi wê axiftinê ve hebe ya ku dihê gotin.

Wate, dewrûbera nezimanî wan hemû regezan vedigire yên ku kartêkirinê li dewrûbera zimanî dikin. Wekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Hêşta bo muhazereyê (semîner) zû ye.

---

(95) عزمي اسلام، ١٩٨٥، ٦٥.

(96) محمد السعران، ١٩٩٢، ٣١١.

Ev risteya li jor bi wê watayê dihê ku ji bo destpêkirina muhazereyê hîna jî "dem-wext" maye ango muhazereyê hîna jî dest pê nekirîye. Lê belê eger mamosta çûbe odeya xwendinê (fêrgeh) û piştî mamostayî xwendekar bihê hundir û mamosta heman risteya jorîn bibêje xwendekarî, wê demê peyva "zû"yê di nav risteya jorîn da dê wataya xwe berevajî bigihîne, ji ber ku dê bi wataya "dereng"ê bihê.

6. Wataya babetî-Thematic meaning:

Wataya babetî giringîyê bi wê rêyê dide ya ku firêker an nivîser di gihandina mebestê da bi rêxistina wê nameya ku digihîne radibe, bi şêweyekê rêxistî û wekî xwe, ew jî dema ku cextê li pişkdarekê risteyê dike, dema peyvan di nav risteyê da rêz dike. Ev jî ji ber wê çendê ye da ku nameyê wekî xwe bigihîne wergirî yan xwendevanî.[97] Wekî di van risteyan da dîyar dibe:

1- Jinkê xanî sot.

2- Xanî jinkê sot.

3- Zelamî dîwar herifand.

4- Dîwar zelamî herifand.

Eger em temaşeyî risteyên jimar "1" û "3" bikin, em ê bibînin ku cext û dakokî li ser "biker"ê hatîye kirin ku di risteya jimar "1" da bikera risteyê peyva "jinkê" ye û di risteya jimar "3" da bikera risteyê peyva "zelam"ê ye. Lê belê di risteyên jimar "2" û "4" da dakokî û cext li ser "berkar"ê hatîye

[97] Leech: 1974, 22.

kirin ku di risteya jimar "2" da berkara risteyê peyva "xanî"yê ye û di risteya jimar "4" da berkara risteyê peyva "dîwar"ê ye. Eger em temaşeyî risteyên jimar "1" û "2" bikin, em ê bibînin ku heman têgih heye, herwisa di risteyên jimar "3" û "4" da jî her heman têgih heye, lê belê cudahîya di rêzkirina peyvên wan risteyan da dibe egera wê yekê ku risteya jimar "1" ji alîyê mebestê ve ji risteya jimar "2" cuda be, herwisa risteya jimar "3" jî ji risteya jimar "4" cuda dibe. Ev cudahîya han jî bi rengekê zelaltir dîyar dibe dema ku "... em her du risteyan bikin pirsyar, em dikarin bibêjin ku her yek ji wan xwedî bersiveka cîyawaz e û mebesta ji bersivê biguhêrin".[98]

Bo nimûne, eger em bibêjin: "Jinkê çi sot?", bersiva wê pirsê dê "xanî" be, lê belê eger em bibêjin: "Kê xanî sot?", bersiva wê dê "jinkê" be. Her heman tişt ji bo risteyên jimar "3" û "4" jî dirust e. Wekî eger em bibêjin: "Zelamî çi herifand?", bersiva wê dê "dîwar" be, lê eger em bipirsin: "Dîwar kê herifand?", bersiv dê bibe "zelamî". Ango, risteyên: "Jinkê çi sot?" û "Zelamî çi herifand?", "biker"ên wan aşkera ne; lê belê risteyên: "Xanî kê sot?" û "Dîwar kê herifand?", "biker"ên wan ne aşkera ne, ev dibe egera wê yekê ku risteyên jor ji alîyê mebestê ve ji hev cuda bin.

7. Wataya mîtaforî-Metaphorical meaning:

Wataya mîtaforî ew curewata ye ya ku peyv tê da watayeka cuda ji wê wataya xwe ya ferhengî ya berbelav werdigire;[99] ji ber ku di vî cureyê watayê da peyv ji bo watayeka mîtaforî

---

(98) سازان رضا معين، ٢٠٠٥، ١٥.

(99) محمد علي الخولي، ١٩٨٢، ١٦٨.

ya dîyarkirî bi kar dihê ku ferheng nikare bi dîyarkirina wê watayê rabe. Lê di şîyan da heye li gor dewrûbereka dîyarkirî ew wataya mîtaforî bihê destnîşankirin, ji ber vê yekê "pêwîst e nasîna mîtaforî jî dewrûberekê raber bike; eger na, bê hebûna dewrûberê destnîşankirina xwastekê hêsan nabe..."[100] Em dikarin di vê risteya jêrîn da dîyar bikin:

Çavê xwe bide ewê şemalkê (mûm).

Di vê risteya jorîn da eger em wekî "keç" serederîyê di gel peyva "şemalk"ê bikin, hingê ew peyv dê watayeka mîtoforî bi xwe ve bigire. Vêca heta ku ew wata bihê dîyarkirin, divê dewrûbereka destnîşankirî li ber çavan bihê wergirtin, eger na, destnîşankirina wê wataya mîtaforî bi hêsanî bi dest ve nahê.

Herwiha ew risteyên nepesend ên semantîkî, di vî cureyê watayê da dikarin li gor dewrûberê watayeka mîtaforî hilgirin.[101] Herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Ber girnijî.

Ev risteya li jor ji alîyê wataya semantîkî ve risteyeka nepesend e; ji ber ku "ber" nagirnije. Lê belê firêker û wergir dikarin li gor dewrûbereka dîyarkirî watayeka mîtaforî ji bo wê dirust bikin. Vêca li vir firêker û wergir dikarin peyva "ber"ê li şûna "mirov"î bi kar bînin an jî ji bo her mebesteka din bi kar bînin.

---

(100) سازان رضا معين، ٢٠٠٥، ٤٨.

(101) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٥٩.

Dîsa di nav vî cureyê watayê da, hin caran wataya ferhengî ya peyvê û wataya wê ya mîtaforî ji hev dûr dikevin û hin carên din pêwendîyek di navbera wan da dimîne.[102] Herwekî di van nimûneyên jêrîn da ew çende dîyar dibe:

1- Mifayên asinî gelek in.

2- Dilê wî asin e.

3- Rwîvî gîyanewerekê fêlbaz e.

4- Ew mirovekê rwîvî ye.

Pêwendîya peyva "asin"ê (hesin) di risteyên jimar "1" û "2" da bi hev ve nîne; ji ber ku di risteya jimar "1" da peyva "asin"ê bi wataya xwe ya ferhengî hatîye ku ew jî cureyek ji cureyên kanzayan e. Lê belê di risteya jimar "2" da peyva "asin"ê li gor dewrûberê bi wataya "bêrehm" hatîye; ev jî wataya mîtaforî ya wê peyvê ye. Vêca wekî dîyar bû pêwendî di navbera wataya ferhengî ya peyva "asin"ê û wataya wê ya mîtaforî di wan her du risteyan da nîne. Lê eger em temaşeyî risteyên jimar "3" û "4" bikin, em ê bibînin ku curepêwendîyek di navbera her du peyvên "rwîvî" (rovî) di wan her du risteyan da bi hevdu ve heye ku ew jî wataya "fêlbaz" e; çinku rovî ji bo fêlbazîyê sembol e ku di risteya jimar "3" da peyva "rwîvî" bi wataya xwe ya ferhengî bi kar hatîye ku ew jî cureyek ji cureyên gîyaneweran e. Lê belê di risteya jimar "4" da li gor dewrûbera ku tê da bi kar hatîye, ew rovî bi wataya mirovekê fêlbaz hatîye ku ev jî wataya mîtaforî ya wê peyvê ye. Ev çende dibe egera wê yekê ku curepêwendîyek di navbera her du peyvan da, di wan her du risteyan da hebe.

---

(102) سازان رضا معين، ٢٠٠٥، ٤٨-٤٩.

8. Wataya veşartî-Internal meaning:

Pênase:

a) Wataya veşartî: Wergir ji bilî têgihîştina wî ji wataya aşkera ra, hin caran watayeka din li dev wî peyda dibe ku em dikarin bi navê wataya veşartî binavînin. Wataya veşartî bi rêya têgihîştina wî ji deqê ra li dev wî dihê derencamkirin. Herwekî di vê deqa jêrîn da dîyar dibe:

Eve ew zelam nîne, ewê hatîye seredana me, ji ber ku vî zelamî rihên heyîn.

(ev ne ew zilam e yê ku hatîye seredana me; ji ber ku riha vî zilamî heye.)

Wataya veşartî ya di vê deqê da ew e, ew zilamê ku seredana me kirîye, bêrih bû ango riha wî nebû.[103]

b) Wataya veşartî: "Wê wataya veşartî ya ku li pişt gotinê heye bi xwe ve digire û mebesta veşartî û nerasterast dîyar dike û li gor dewrûberê dihê guhartin. Li vir mebest û axiftina zimên ji ber van egeran 'rêzgirtin, tirs, şerm û hwd' hevdu nagirin."[104] Wekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Çewa te ew kiç bo wî kurî xwast?

Ji bo dîyarkirina wataya veşartî di vê risteyê da divê dewrûber li ber çavan bihê wergirtin; ji ber ku eger dewrûber li ber çavan nehê wergirtin, em ê bibînin ku derbirîn û

---

[103] داوود عبدة، ١٩٨٤، ١٧.

[104] عەبدالواحید مشیر دزەی، ٢٠٠٦، ٧٧٣.

mebesta wê gotinê hev nagirin, çinku tevî ku ew riste bi pirs hatîye gotin jî lê li gor dewrûberê ew riste di naveroka xwe da gilî, gazin û nerazîbûnê digihîne.

Vêca eger derbirîn û mebesta firêkerî ango rûyê jiderve û rûyê jinavda yê risteyan hevdu girt, wê demê ew cureyên risteyan dê bi şêweyekê rasterast wataya xwe bigihînin ku ev jî bi navê wataya aşkera dihê binavkirin.[105] Lê belê eger derbirîn û mebesta firêkerî hevdu negirt, herwekî berî niha amaje pê hatîye dan, wê demê ew riste dê bi şêweyekê nerasterast watayê bigihîne; ji ber wê ew wataya ku di van cureristeyan da bi dest ve dihê, bi navê wataya veşartî dihê binavkirin.

E. YEKEYÊN WATAYÎ

Nêrînên zimannasên nû li barê pênaseya yekeya watayî cuda ne, herwisa li ser têgihê bi xwe jî li hev nekirine. Hin ji wan têgiha "semantic unit"ê bi kar tînin û hinên din têgiha "sememe"yê bi kar tînin. Têgiha "sememe"yê cara yekem di nav zimannasîyê da sala 1908an ji alîyê zimannasê swêdî "Adolf Noreen" ve hate bikaranîn. Paşê li sala 1926an di nav zimannasîya amerîkayî da û ji alîyê zimannas "Bloomfield" ve hate bikaranîn.[106]

---

[105] Jêdera berê, 773.

[106] أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٣١.

Dîtinên zimannasan li ser pênaseya yekeya watayî cuda ne, ji wan pênaseyan:

1. **Yekeya watayî:** Biçûktirîn yekeya watayê ye.

2. **Yekeya watayî:** Kombûna çend sîmayên cudaker e.

3. **Yekeya watayî:** Her dirêjbûnek di axiftinê da cudahîyeka watayî reng vedide.[107]

Zimannas "Nida" yekeyên watayî li çar beşên sereke dabeş dike.[108]



[107] Jêdera berê, 31.

[108] Jêdera berê, 32.

1. Morfema bend-Bound morpheme:

Morfema bend biçûktirîn yekeya watayî ye. Eger ne li gel "morfemeka serbixwe-free morpheme" be, bi tena serê xwe nahê bikaranîn.[109] Wekî:



2. Peyv-Word:

Peyv giringtirîn yekeya watayî ye, çinku giringtirîn asta binçîneyî ji bo yekeyên watayî dirust dike; ev jî bû eger ku hin zimannas peyvê bi biçûktirîn yekeya watayî bihejmêrin.[110]

3. Lêkdan-Compound:

Ev yekeya watayî ji encama lêkdana çend forman pêk hatîye.[111] Ew jî dibe sê cure:

---

[109] Yule, 2006, 63.

[110] أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٣٣.

[111] عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٤١.

a) Peyva darîştî-Derived word:

Ev cureyê lêkdanê ji peyveka sade û zêdehîyekê pêk dihê. Vêca çêdibe ku ew zêdehî pêşgir an paşgir be yan pêşgir û paşgir pev ra be. Wekî:

Dagirt.

Girteve.

Dagirteve.

b) Peyva lêkdayî û fraza ji peyvekê mezintir:[112]

- Peyva lêkdayî-Complex word:

Ew curepeyv e ku ji encama lêkdana du peyvên watadar bi dest dihê.[113] Wekî:

Çavreş.

Avemast.

- Fraza ji peyvê mezintir:

Li vir divê fraz ji peyvekê mezintir be. Çi ew fraz ji dîyarkirî (ravekirî) û dîyarkerekê (raveker) pêk hatibe yan ji dîyarkirîyekê û çend dîyarkeran. Wekî li xwarê dîyar dibe:

Kurê zîrek hat.

Ew kurê zîrek hat.

---

[112] Çinku çêdibe fraz bi tenê takepeyvek be ku ew jî dîyarkirî (head) ye; çi ew dîyarkirî navdêr be yan kar be.

[113] Yule, 2006, 54.

c) Îdyem-Idiom:

Îdyem (biwêj) ew derbirîn e ku watayeka wê ya teybet heye û ev wata ji watayên wan peyvên ku di nav wê derbirînê da hatine cuda ye.[114] Bi watayeka din, ew wataya ku îdyem dide, ji watayên peyvên ku ew îdyem ji wan dirust dibe, dûr e. Herwekî di van îdyeman da dîyar dibe:

Ezmanpîs (zimanpîs).

Dilreş.

Di van her du nimûneyên jorîn da watayên ku ew her du îdyem didin, cuda û dûr in ji wan watayên peyvên ku ew her du îdyem ji wan dirust bûne. Îdyema "ezmanpîs"ê bi wataya "xeberreş"ê dihê û îdyema "dilreş"ê bi wataya "çavçinokî (çavnebarî) û hesûdî"yê dihê.

4. Riste-Sentence:

Hin zimannas risteyê bi giringtirîn yekeya watayî dihejmêrin û hin ji wan ji peyvê jî giringtir dibînin. Bi dîtina wan peyv bi tena serê xwe bêwata ye, lê wataya wê di nav wê risteyê da ye ya ku tê da bi kar dihê. Eger em bibêjin ev peyv an fraza "ha"yê hilgira watayê ye, ev wê çendê digihîne ku risteyek an çend riste hene, ew peyv û fraza "ha"yê di wan da hatine û ew riste hilgirên watayê ne.[115] Wataya her risteyekê jî "ji 'wataya peyvan + karîgerîya rêzimanî' pêk hatîye".[116] Herwekî di van her du risteyan da dîyar dibe:

---

(114) a) ن. ي. كولنج، ١٤٢١. ١٠١٦. b) محمد علي الخولي، ١٩٨٢، ١٢٥.

(115) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٣٤.

(116) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٤٢.

Azadî Newzad girt.

Newzadî Azad girt.

Di van her du risteyên jorîn da herçende heman peyv dubare bûne jî lê belê wataya wan her du risteyan jev cuda ye; ji ber ku erka rêzimanî ya wan peyvan di wan her du risteyan da ne wekî hev e.

Hêjayî gotinê ye ku ji bilî wan yekeyên watayî yên jor, çend yekeyên din jî hene ku ew jî "gotin, deq û gotar" in.[117]

5. Gotin-Utterance:

Gotin risteyek e ku di dewrûbereka destnîşankirî da bi kar hatîye. Ev jî wê watayê dide ku gotin berhema wataya riste û dewrûberê ye.[118] Wekî:

Ez ê birsî me.[119] (ez birçî me.)

Eger em vê risteya li jor bixin di dewrûberê da, wê demê dê bibe gotin û dê li gor wê dewrûbera ku tê da dihê bikaranîn, çend watayan bi xwe ve bigire. Wekî van watayên li xwarê:

1. Zadî bo min bîne.

2. Ez dê çime mal. (ez ê biçim malê).

---

[117] Jêdera berê, 42.

[118] محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٣٩.

[119] جيفري ليش وجيني توماس، ١٤٢١، ١٨٥.

3. Ez dê zadî le gel hewe xwim. (ez ê zadî li gel we bixwim).

4. Ez nahême nêçîrê.

5. Dabçîne xwaringehê. (de em biçin xwaringehê.)

û hwd.

6. Deq-Text:

Deq pêkhateka zimanî ye yan şêweyê axiftinê ye ku ji zincîreka risteyên lidûvhevhatî saz bûye ku di nav wan risteyan da hevgirtinek û pêkvegirêdanek heye.[120] Ew riste bi rêya firêkerî ji bo wergirî dihêne veguhastin û wergir wan risteyan wekî xwe werdigire.[121] Çinku di nav deqê da ew rewş û mebestên heyî li ber çavan nahên wergirtin.[122] Ango deq, ew şêweyê rût e yê ku tê da takekes an dem an cih ... ne mebest e û piranîya caran ji alîyê rêziman û ferhenga zimanî ve vekolîn lê dihê kirin.[123] Ev jî wê watayê digihîne ku di vekolîna deqê da dewrûber li pişt guhî dihê avêtin.

---

(120) محمود عكاشة، لغة الخطاب، ٢٠٠٥، ٤٣-٤٤.

(121) روبرت شولز، ٢٥١، ١٩٩٤، ٢٥٢.

(122) عبدالهادي بن ظافر الشهري، ٢٠٠٤، ٣٩.

(123) محمود عكاشة، لغة الخطاب، ٢٠٠٥، ٤٥.

7. Gotar-Discourse:[124]

Gotar "deqek e ku di dewrûberekê da hatîye bikaranîn".[125] An girêdana deqê bi dewrûberê ve ye[126] ku berhemînan, dirustkirin û ravekirina gotara zimanî bi rêya regezên dewrûbera wê bi dest ve dihê ku ew regez ji firêker, wergir û regezên hevbeş wekî pêwendîya di navbera her du alîyên gotarê da û zanîna hevbeş û rewşên civakî yên giştî pêk hatine. Ango sînorê gotarê wê zarkirinê hemûyî bi xwe ve digire ya ku bi rengekê taybet û mebestdar ji bo alîyê beranber dihê arastekirin ji bo wê merema ku ew tê bigihe.[127] Ji ber vê yekê tevî ku gotar pêkhateka zimanî ye dîsa pişkdarên axiftinê û mebest û dem û cih jî tê da û her regezeka din jî ya ku pêwendîya wê bi wê yekeyê ra hebe, li ber çavan dihêne wergirtin.[128]

---

[124] Ji bilî gotara zimanî, gotara nezimanî jî heye ku ew jî bi rêya hêmayên nezimanî dihê berhemînan. Herwekî niwandina (nimayîşkirin) bêdeng an wêneyê karîkatorî yan gotara rîklama bazirganî ya ku bi rêya hêmayên nezimanî dihê bikaranîn. Ebdilhadî Binzafir El-Şehrî, 2004, 39.

[125] عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٤٤.

[126] دومینیك مانغونو، ٢٠٠٨، ٤٠.

[127] عبدالهادي بن ظافر الشهري، ٢٠٠٤، ٣٩.

[128] محمود عكاشة، لغة الخطاب، ٢٠٠٥، ٤٥.

PIŞKA DUYEM

ASTÊN WATAYÊ

A. DESTPÊK

Fîlozofê amerîkayî "Charles Morris" sala 1938an di pirtûka xwe da ya bi navê "Hêmalojî-Semiotics"[129] zanista hêmayan li sê astan dabeş dike, ew jî "sentaks- syntax, semantîk-semantics û pragmatîk-pragmatics" in.

1- **Sentaks:** Ev ast vekolînê li pêwendîya hêmayên zimanî li gel hevdu dike.

2- **Semantîk:** Ev ast pêwendîya hêmayên zimanî bi wan tiştan ve ku amajeyê bi wan dikin vedikole.

3- **Pragmatîk:** Ev ast pêwendîya hêmayên zimanî bi kesî ve dikole li gel raçavkirina dem, cih û dîyardeyên hemû cureyên ku pêwendîya wan bi van hêmayan ra hebe.[130]

Berî "Morris"î, zimannasî ji van astan pêk dihat:

---

[129] Hêmalojî, ew zanist e ku vekolînê li hemû cureyên hêmayan dike, ji wan jî hêmayên zimanî, li ser wî binemayî ku hemû cureyên hêmayan ji bo pêwendîkirinê amraz in. Hin zana wekî "De Saussure"î, zimannasîyê dike beşek ji zanista hêmayan (hêmalojî) û hinên din wekî antrobologê (mirovnas) amerîkayî "Bir Dwhistell" û rexnegirê fransiz "Roland Barthes", hêmalojîyê dikine paşko (تابع) ji bo zimannasîyê yan jî şaxekê zimannasîyê, ji ber ku sîstema hêmayan a ku civak dizane heta pileyeka zor wekî sîstema zimanî ye. Ebdilqadir Ebdilcelîl, 2006: 42-43.

[130] (a) Levinson, 1997, 1-2.

(b) Crystal, 1991, 275.

1. Zanista dengî

2. Rêziman

3. Zanista watayê (semantîk)[131]

Di nav zimannasîya nû da, zimannasan ji bo astên zimanî dabeşkirineka din danîye ku ev dabeşkirin jî her li ser binemayê dîtina kevn e, çinku her yek ji van astên jor (deng-rêziman-wata) dabeşî pêkhateka din dibe. Herwekî di vî wêneyê jêrîn da dîyar dibe.[132]



(131) هۆگر محەمەد فەرەج، ٢٠٠٥، ١١٢.

(132) Jêdera berê, 119.

Yên ku pêwendîya wan bi watayê ve heye, her du astên "semantîk û pragmatîk" in ku ev her du astên watayê vekolînê li watayê dikin:



1. Semantîk:

Sebaretî pênaseya semantîkê, hemû zanayan ji bo pênaseya semantîkê li ser yek dîtinê li hev nekirîye, lê belê bi çend şêweyan pênaseya wê hatîye kirin. Bo nimûne:

1. Di ferhenga "Winston"ê da hatîye, semantîk ew zanist e ku vekolînê li wataya peyvan li gel werara mêjûya têgihîştin û zanîna wataya wan peyvan dike. Herwisa amajeyê bi wê yekê dike ku semantîk bi temamî ji zanista dengî û zanistên ku dihêne bihîstin, cuda ye.[133] Eger em bi hûrî temaşeyî vê pênaseyê bikin, em ê bibînin sînorê semantîkê zor berteng kirîye ku bi tenê behsa vekolîna peyvan û geşekirina wataya wan peyvan ji qonaxekê bo qonaxeka din kirîye bê ku behsa risteyê bike ku di bingeha xwe da riste jî mil bi milê peyvê ve yek ji pêkhatên sereke yên semantîkê ye. Dîsa ev pênase, vê zanistê ji zanista dengî û zanistên ku dihêne bihîstin cuda dike; ji ber ku her zanistek ji zanistên navborî xwedî taybetmendî û babetên taybet pê ye.

---

(133) رجب عبدالجواد ابراهيم، ٢٠٠١، ١٢.

2. "Frank Palmer" dibêje: Têgiheka gişti ya vê asta zimanî heye û ev têgiha han girêdayî watayê ye, herwisa pêwendîya her asteka zimanî "fonolojî, morfolojî, sentaks û pragmatîk" bi watayê ve heye; semantîk rola xwe di karkirina wê zanistê da dibîne.[134] Li gor pênaseya "Frank Palmer"î, wataya fonolojî û morfolojî, sentaksî û wataya pragmatîk heye; çinku wata rola xwe di karkirina her astek ji astên jor da, eger ne bi temamî be jî di biwareka berfireh a wê da, dibîne.[135]

3. "Dr Mehmûd Ukaşe" dibêje: "Semantîk ew zanist e ku vekolînê li şirovekirin û ravekirina watayê dike û giringîyê bi mijar û kêşeyên watayê dide herwiha hemû hêmayên hilgir ên watayê vedigire; çi ew hêma zimanî be yan nezimanî (wekî livîn, amaje, wêne, dengên nezimanî û her hêmayeka din ku watayê di pêwendîkirina civakî da bide) be."[136] Ev pênase sînorê semantîkê zor berfireh dike, heta digihîne hêmayên nezimanî ku di bingeha xwe da zanista hêmayan (hêmalojî) vekolînê li hêmayên nezimanî dike. Ev çende jî dê bibe egera wê yekê ku em nikaribin semantîk û hêmalojîyê ji hevdu cuda bikin û ji alîyekê dîtir ve pragmatîk serederîyê di gel alîyekê hêmayên nezimanî dike. Ev jî dê di nav pênaseya pragmatîkê da ji me ra dîyar bibe.

---

(134) عبدالقادر عبدالجليل، ٢٠٠٦، ١٤٨.

(135) Ji bo pêzanînên pirtir der barê wataya fonolojî, morfolojî û sentaksî da li pişka yekem ji vê vekolînê binêre.

(136) محمود عكاشة، التحليل اللغوي، ٢٠٠٥، ٩.

4. "N.Y. Cooling" dibêje: Semantîk şaxekê sereke yê zimannasîyê ye. Yek ji wan her sê pişkên hêmalojîyê ye ku ew jî sentaks, semantîk û pragmatîk in. Ev zanist ango semantîk vekolînê li watayê dike, herwiha vekolînê li wê pêwendîya di navbera hêma û binavkirina wê hêmayê da dike.[137] Ka gelo ew pêwendîya di navbera hêma û binavkirina wê da, pêwendîyeka hoyî (egerî) ye yan remekî (xwebixweyî) ye?

5. "Dr Wirya Umer Emîn" dibêje: "Semantîk-Semantic ew şaxê zanista zimanî ye ku hewl dide pêwendîya di navbera form û çemkê da destnîşan bike. Sîma û keresteyên semantîkî yên morfem û peyvan raber dike û di çarçoveya peyv û risteyê da li pêwendîya watayan dinêre."[138] Zimannasê kurd bi şêweyekê zor zanistane behsa pênaseya semantîkê kirîye, ew jî dema ku behsa sîmayên watayî û pêwendîyên watayî û form û wataya keresteyan dike ku ev jî babetên sereke yên semantîkê ne. Tiştê ji hemûyan çêtir ew e ku behsa her du pêkhatên semantîkê kirîye, ew jî "peyv û riste" ne, çinku di hindek pênaseyên amajepêkirî da bi taybetî di pênaseya jimar "1" da, vekolîna wataya risteyê bi pişt guh ve hatîye avêtin ku bi tenê erka semantîkê bi vekolîna wataya peyvê ve girê daye.

2. Pragmatîk:

Ev ast jî herwekî asta din a watayî bi gelek rengan hatîye pênasekirin. Ji wan pênaseyan:

---

(137) ن. ي. كولنج، ١٤٢١، ١٠٤٣.

(138) وريا عومەر ئەمين، ٢٠٠٧، ٣٥.

1. Her du zimannas "Mihemed Elî El-Xulî û Izet Eyad" dibêjin: "Pragmatîk vekolînê li hêmayên zimanî û nezimanî dike."[139] Ev pênase her du hêmayên zimanî û nezimanî bi vekolîna pragmatîkê ve girê dide. Hêmayên zimanî di vê astê da bi wê rêya ku di asta semantîkê da bi dest ve dihên, dîyar nabin ango eger "kes" nebe, "ten û hizir" bi tenê nikarin wê watayê dîyar bikin. Lê ew jî bi rêya wê dewrûbera ku ew hêma tê da dihê gotin, mebesta firêkerî li dev wergirî dîyar dibe. Wekî dema ku azmûn bi xwendekaran bihê kirin, xwendekarek derneçe û nimreyeka kêm wergire û dema mamosta pelên wan bide wan, bibêje wî xwendekarê derneçûyî:

Zor baş e!

Ev gotin wê demê dê wataya xwe berevajî bide, çinku gotina "zor baş"ê ji bo xwendekarê xwedî nimreyeka baş, derçûyî û zîrek dihê gotin; ne ji bo xwendekarekê tembel û derneçûyî.

Ji bo hêmayên nezimanî, zanayê zimanî "David Abercrombie" dibêje: "Em bi rêya endamên ku di çêkirina dengî da pişkdar in axaftinê dikin, lê belê em bi rêya hemû endamên laşî danûstandinê dikin."[140] Ev hêmayên nezimanî "gelek caran ... wataya semantîkî berevajî dikin ... bo nimûne dema ku bi 'çavniqandin' û bi amadebûna keçekê û çend kesên din û bê agahîya keçikê jê ra bihê gotin:

---

(139) a) توبى لحسن، بێ سال، ١٢.

b) محمد علي الخولي، ١٩٨٢، ٢٢٢.

(140) هدسون، ١٩٨٧، ٢٢٨.

Zor ciwan î!

Ev, watayê berevajî dike û dibe tiwanc (teilîq) ji bo wê. Eger pê bihese, dê tûre bibe".[141]

2. "Levinson"î çend pênaseyên cuda ji bo pragmatîkê gotine:

a. Pragmatîk vekolînê li wan binemayan dike yên ku çareserîyê ji bo wan risteyên nawêze yan ji bo wan gotinên ku ne guncav in bihêne gotin, dibîne; Wekî:

Eristo yê grîkî bu, belê ez bawernakem! (Aristotle girîkî bû, lê belê ez bawer nakim!)

Ez fermanê li te dikem tu pêgîrîyê bi fermana min nekey!

(ez fermanê li te dikim tu pêgirîyê bi fermana min nekî!)

Ev risteyên li jor risteyên nawêze ne, lê pragmatîk dikare wan risteyan şirove bike û watayeka guncav ji bo wan risteyan bîne.

b. Pragmatîk ji alîyê erkê ve vekolînê li zimanî dike, ew hewl dide ku bi erka şirovekirina saloxetên (taybetmendî) pêkhata zimanî rabe, bi rêya amajekirina bi hokarên nezimanî. Ev pênase nikare pragmatîkê ji zimannasîya derûnî û kozimannasîyê cuda bike; çinku ev her du astên zanistê jî giringîyê bi alîyê erka di zimanî da didin.

---

(141) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٦٨.

c. Pragmatîk giringîyê bi regezên bikaranîna zimanî dide û tu pêwendîya wê bi dîyarkirina pêkhata zimanî ra nîne. Mirov dikare şirovekirina vê pênaseyê ji bo wê cudakirina di navbera "çalakî-performance" û "şîyana zimanî-competence" da vegerîne ya ku "Chomsky"î amaje pê kir ku pragmatîk girêdayî regezên çalakîyê ye di bikaranîna zimanî da bi rêya bikarhênerên wê. Katz di zelalkirin û şirovekirina vê pênaseyê da dibîne ku teorîyên sentaksî li dor wan şêweyên bi pêkhata risteyê ve girêdayî digerin. Lê belê pragmatîk bi tememî berevajî wê çendê ye ango ne karê pragmatîkê ye ku bi dîyarkirina pêkhata zimanî yan girêdan û pêwendîyên sentaksî rabe, lê li dor wê pêwendîya alûgor a di navbera firêker û wergirî da di nav wê dewrûbera ku riste tê da hatîye gotin, digere; ji ber vê yekê teorîya pragmatîkê pişkek ji "çalakîya zimanî" [142] dihê hejmartin.

d. Pragmatîk vekolînê li wê pêwendîyê dike ya ku bi rêya rêzimanê di navbera ziman û dewrûberê da peyda dibe. Ev pênase pragmatîkê bi vekolîna rûyên destnîşankirî ji pêkhatên zimanî ve girê dide ku ev jî berevajî pêşnîyaza "Katz"î radiweste; pêşnîyaza ku dibêje tu pêwendîya pragmatîkê di bikaranîna zimanî da bi alîyê rêzimanî ve nîne.

---

[142] Çalakî: Mebest pê bikaranîna rasteqîne ya zimanî ye li gor dewrûbera ku tê da bi kar dihê. Ji ber vê yekê bi rêya çalakîya zimanî mirov dikare bi şêweyekê dirust wataya risteyan şirove bike, herwisa şirovekirina guncav ji bo risteyên nepesend û nawêze bibîne ku têgihîştin û ravekirina wan cureristeyan dikeve ser milê wergirî. Mihemed Mihemed Yûnis Elî, 2007, 148-149.

e. Pragmatîk vekolînê li wan rûyên watayê dike yên ku nikarin bi rêya semantîkê bigihin. "Chazdar" şirovekirina vê pênaseyê li wê yekê dizivirîne ku semantîk li dor wan risteyên girêdayî bi rewşên rastgoyê di zimanî da digere, lê pragmatîk bi lêgerîna wan rûyên watayê radibe yên taybet bi derbirînên ku di şîyan da nîne bi amajekirineka dîyar bi rewşên rastgoyê di risteyan da bi sînor bibin. Ango:

Pragmatîk - wata - rewşên rastgoyê.

f. Pragmatîk vekolînê li wan pêwendîyan dike yên ku di navbera zimanî û dewrûberê da hene; ji ber ku ew pêwendî ji bo têgihîştina zimanî sereke ne. Ev pênase wê yekê digihîne ku heta ziman bi dirustî bihê fêmkirin, divê ew peyv û risteyên zimanî bi dewrûbereka dîyarkirî ve bihêne girêdan.

g. Pragmatîk vekolînê li nîşankar, derkevte, girîmanên (hîpotez) pêşîyê, kirdeyên axiftinê û rûnana axiftinê dike.[143]

3. "Leech" di pênasekirina pragmatîkê da dibêje: Pragmatîk vekolînê li çawanîya watadarbûna gotinan-utterances dike, di wan helwestên ku tê da bi kar dihên.[144] Em dikarin şirovekirina vê pênaseyê li wê cudahîya di navbera riste û gotinê da bizivirînin. Di vê biwarê da "John Lyons" sebaretî wê cudahîya di navbera riste û gotinê da dibêje: Yek ji wan hokarên ku riste û gotinê ji hevdu cuda dike, ew e ku heman riste dikare ji bo çend gotinên cuda bihê

---

[143] Levinson, 1997, 6-27.

[144] محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٤، ١٣.

bikaranîn û watayeka her gotinekê ji wan gotinan hebe li gor wê dewrûbera ku tê da dihê, bê ku wataya risteyê bihê guhartin.[145] Ev jî wê çendê digihîne ku yek risteya watadar dikare bibe çend gotinên watadar, ew jî li gor wê dewrûberê dimîne ya ku ew riste tê da bi kar dihê. Herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Birayê xwe ji mal derneêxe. (birayê xwe ji malê dernexe.)

Di vê risteya jorîn da gelek watayên nedîyar hene ku her watayek ji wan watayên nedîyar ên wê risteya jorîn dibe gotinek. Ew wata jî ev in:

1. Halê te xweş e.

2. Tu birayê mezin î.

3. Ew jî her birayê we ye.

4. Birayê te mirovekê baş e.

5. Dê birayê te bibe mirovekê xirab.

6. Baştir e ku tu wî dernexî.

4. "Dr Salim Silêman El-Xemaş, di pênasekirina pragmatîkê da dibêje: Pragmatîk ew zanist e ku giringîyê bi wê watayê dide ya ku firêker divê ji axiftina xwe di dewrûbereka destnîşankirî da dîyar bike.[146] Wekî aşkera ye di nav kirdeyên axiftinê da sê cureyên risteyan dihêne

[145] Lyons,1979, 643.

[146] سالم سليمان الخماش، ١٤٢٨، ٦١.

bikaranîn, ew jî "ragihandin, pirs, fermandan" in. Vêca bi rêya dewrûberê, wergir dikare bi hêsanî di mebesta firêkerî da bigihe. Herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Çewa te ew zelam kujt? (çawa te ew zilam kuşt?)

Ev risteya li jor, ji wê gavê zêdetir ku bi pirsê hatîye derbirîn, li vir bi şêweyekê veşartî û li gor dewrûberê, firêker gazinê ji wî kesî dike ka çawa ew zilam kuştîye. Bê guman pêdivîya vê jî bi dewrûbereka destnîşankirî heye ku wê mebestê dîyar bike.

- Nîşankar-Deixis:

Mebest ji têgiha "nîşankar"ê ew e ku hin peyvên zimanî hene ku mijdarîyeka zor bi xwe ve digirin û wataya wan peyvan bi tenê bi rêya dewrûbera ku tê da bi kar dihên, dîyar dibe û ev prosesa ku "mebest" pê dihê destnîşankirin, bi rêya wan peyvên zimanî bi têgiha "nîşankar"ê dihê binavkirin.[147] Ev nîşankar jî dibine çend cure:

1. **Nîşankarên kesî:**

a) Cihnav:

- Serbixwe: ez, tu, ew, min, me ...

- Likaw: m, î, în, n ...

b) Navê kesî "Jack, Mr. Brown ..."

---

[147] محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٤، ٢١.

c) Cihnav û hevalnavên amajeyê (nîşander):

Cihnavên amajeyê:

- Ji bo nêzîk: evî/ê, eve, evan.

- Ji bo dûr: ewê/a he, ewên he.

Hevalnavên amajeyê:

- Ji bo nêzîk: evî/ê ...î/ê, ev ...e, evan ...an.

- Ji bo dûr: ewî/ê ...ê/a he, ew ... ê/a he, ewên ...he.

2. **Nîşankarên demê** "niha, paşî, sibe, piştî du rojan, piştî niha, piştî borîna du hefteyan ..."

3. **Nîşankarên cihî** "li vir, li wir, li vî bajarî, li vî cihî, li vê parkê ..."[148]

4- **Nîşankarên civakî:** Nîşankarên civakî "pile û payeya pişkdarên axiftinê" derdixin ku ew jî ji van xalan pêk dihên:

1- Nasnav:

a- Civakî (rihspî ...)

b- Xizmayetî (mam, xal ...)

c- Pîşe (hosta, doktor ...)

2- Cihnav: Ji bo cihnavên yekhejmar bikaranîna pirhejmarîyê. Wekî:

---

[148] Farrokhpey,1997, 323-324.

Min: Me biryara xwe da ku em bên.

To: Hûn ê kengî bihên?/Hûn kengî dihên?

Belam hin caran bi rêya hindek peyvên ferhengî wekî "cenab, berêz, gewrem ..." peyda dibe yan jî bi nerastexweyî bi dest ve dihê.[149] Wekî:

Tirumbêlê bivemirîne. (rêz tê da nîne)

(tirimpêlê vemirîne.)

Dê şêyî tirumbêlê vemirînî? (rêz tê da heye)

(tu dê bikarî tirimpêlê vemirînî?)

- Derkevte-Implicature:

Derkevte babeteka din ji babetên pragmatîka zimanî ye ku tê da wataya mebestdar a gotinê bi rêya derencamê dihê dîyarkirin. Vêca eger wataya derencamkirî, li dev firêker û wergirî dîyar û aşkera be, hingê ew derencam dê biçe nav çarçoveya girîmanên pêşîyê. Lê belê eger ew wataya derencamkirî li dev wergirî berî wê demê ne aşkera û dîyar be; wê demê ew derencam dê biçe nav çarçoveya derkevteyan.[150] Di vê biwarê da "Grice"î hewl daye têgiha derkevteyan li gor binemayekî rave bike û li sala 1975an ew derxist; ew jî "binemayê alîkarî"yê ye. Bi dîtina "Grice"î binemayekê

---

(149) عەبدولسەلام نەجمەدین عەبدوڵڵا، ٢٠٠٧، ٧٦-٧٧.

(150) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٦٨-١٦٩.

alîkarîyê di navbera firêker û wergirî da heye ku axiftinê di navbera wan da bi rê ve dibe.[151]

"Binemayê alîkarîyê-The cooperative principle" ew binema ye ku alîkarîya firêker û wergirî dike da ku pişkdarîya wan di axiftinê da wekî ya daxwazkirî be, herwiha da ku axiftin şêweyekê nimûneyî wergire. Ev binema dabeşî çar binemayên din dibe, ew jî "çendêtî, çawayî, şêwazî û pêwendî" ne.[152]

1- Binemayê çendêtîyê-Maxim of quantity:

- Bila pişkdarîya te di gotinê da bi tenê bi qasî bireya (kemîye) pêdivîyê be (ango ne kêm be û ne zêde be).

- Bila pişkdarîya te di gotinê da ji bo wê pêdivîya daxwazkirî bimifa be.

2- Binemayê çawayîyê-Maxim of quality:

- Wî tiştî nebêje yê ku gumana te li ser rastîya wî hebe.

- Wî tiştî nebêje yê ku tu belgeyên te yên dîyar pê nebin.

3- Binemayê pêwendîyê-Maxim of relation:

Bila pişkdarîya te bi pêdivîyatîya gotinê ra pêwendîdar û guncav be.

4- Binemayê şêwazî-Maxim of manner:

Bila pişkdarîkirina te zelal û aşkera be, ew jî bi rêya:

---

(151) أف. آر. بالمر، ١٩٨٥، ١٩٩.

(152) عادل فاخوري، ١٩٨٩، ١٤٦.

- Dûrketina ji mijdarîya derbirînê.

- Kurtebir be.

- Dûrketina ji neaşkerayîyê.

- Bila gotina te bi rêk û pêk be.[153]

Her dema ku binemayek ji binemayên jor "hate derbaskirin"; hingê derkevteyên axiftinê bi dest ve dihên; çinku wê demê axiftin dê hindek pêzanînan bi xwe ve bigire ku yekser nahêne derbirîn. Herwekî di vê nimûneya jêrîn da dîyar dibe:

1. Firêker: Tu çarenivîsa kurda li gel Emerîka çewa dibînî?

2. Wergir: Wana min bi ser ve çû.

Li vir wergirî binemayê pêwendîyê derbas kirîye, ev jî bûye egera wê yekê ku derkevteyên axiftinê bi dest ve bihên; çinku firêker dê ji wê bersiva wergirî ya nepêwendîdar û neguncav tê negihe ku wî navê behsa mijarên sîyasî bike.

- Girîmanên (hîpotez) pêşîyê-Presupposition:

Fîlozofan demekê giringî bi barê hin risteyan da, wekî risteya: Paşayê Fransayê yê serrwît e (paşayê Fransayê serrût e). Eger bi dirustî li Fransayê paşa nebe, ev riste dirust nabe. Bi dîtina "Bertrand Russell"î (1905 z) ev riste du tiştan bi xwe ve digire:

---

[153] (a) Verchuerence, 2003, 32.

(b) George Yule, 2000, 37.

1- Li Fransayê paşa heye.

2- Ew paşa serrût e.

Vêca eger li Fransayê paşa nebe, hingê ew riste dê çewt be.[154]

"Strosten" (1964 z) çareserîyekê ji bo vê çendê dibîne, ew jî gava ku dibêje: Dema ku firêker derbirînên wekî "paşayê Fransayê ..." bi kar tîne, girîmanê ji bo wê yekê dike ku di şîyana wergirî da heye ku kes an tiştê ku axiftin bi xwe ve digire, destnîşan bike. Wergir ne piştrast e ku ew kes an ew tişt heye, lê girîmanê jê ra dike. Vêca eger ew kes an ew tişt nebe, wê demê ew girîmana han bi ser nakeve, ew riste jî dê ne çewt be, lê ne rast e û ne jî çewt e. Ev çende ji bo risteyên nerê (neyînî) jî dirust e. Herwekî em bibêjin: "Paşayê Fransayê yê serrwît nîne." (paşayê Fransayê ne serrût e) Ev riste wekî risteya jorîn eger ew kes an ew tişt nebe, tu bihayê wê yê rasteqîneyî nîne.[155]

Berfirehtirîn dîtin ji bo girîmanên pêşîyê dîtina "Fillmore"î ye (197 z) ku rewşa gotinê şirove dike, herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Hîvî ye (hêvî ye) dergehî bigire.

Ev risteya jorîn pêwendîyê di navbera firêker û wergirî da dîyar dike û wergir dikare dergehî bigire. Dergeh vekirî ye û firêker dixwaze ku wergir dergehî bigire. Tu gotin ji van hemû gotinan di wê risteyê da nehatîye gotin.[156]

---

(154) أف. آر. بالمر، ١٩٨٥، ١٩٢.

(155) Jêdera berê, 192-193.

(156) Jêdera berê, 1985, 198.

Wate, em dikarin bibêjin ku girîmanên pêşîyê ew têgiha pragmatîkî ye ya ku tê da pêzanînên hevbeş û nasîneka pêşîne li dor wan pêzanînan di navbera firêker û wergirî da hene ku ew jî ji risteyê dîyar dibin dema ku di dewrûberekê da dihê gotin.[157] Herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Ez êdî nahême yarîgeha tepa pêyî.

Ev risteya li jor çend watayan bi xwe ve digire ku wergir bi rêya dewrûberê dikare bigihe mebesta firêkerî û wê wataya mebestdar destnîşan bike. Ew wata jî ev in:

1- Rêya yarîgehê dûr e.

2- Tirumbêla me nîne ku em pê biçin yarîgehê.

3- Çûna jurve ya yarîgehê giran e. (derbasbûna yarîgehê giran e.)

4- Ezmûnên me dest pê kir.

5- Cemawerê yarîgehê me bêzar dike.

... û hwd.

- Kirdeyên axiftinê-Speech acts:

Erkên cur bi cur ên axiftinê hene ku dema kiryara gihandinê dihê encamdan, wê demê axiftin bi wan erkan radibe; ji wan jî "wataya jîrî-المعنى العقلي" ye. Herwekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Hesp yê birîndar e.

---

(157) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٧٦.

Watayeka jîrî ya semantîkî ya aşkera ji risteya jorîn ra heye ku bi rêya wan her du peyvên ferhengî yên ku ew riste jê dirust bûye, wata dîyar dibe. Lê belê çêdibe ku ew riste bi hin watayên pragmatîk jî rabe, herwekî xwedîyê hespî bi mebesta wê yekê risteyê bibêje ku bivê kartêkirinê li wergirî bike da ku hespî derman bike. Ev jî wê demê dê bibe "daxwazî". Çêdibe ku her heman riste ango "Hesp yê birîndar e." di dewrûbereka din da bi wataya "lêborînê" bihê; ew jî dema ku xwedîyê hespî nevê di pêşbirka hespan da beşdar bibe.[158]

Ev dîtina li jor li filozof "J. L. Austin"î dizivire, dema aşkera kir û got ku axiftin bi tenê bi dîyarkirina wataya semantîkî ranabe, lê piranîya caran kirdeyekê dirust dike.[159] Di vê biwarê da "Austin" kirdeyên axiftinê li sê cureyan dabeş dike:

1- Kirdeya gotinê: Mebest ji vê kirdeyê ew prosesa zarkirinê ye ji bo risteya dirust a ku li gor yasayên zimanî bi rê dikeve.

2- Kirdeya mebestê: Ev kirdeya han mebesta firêkerî ji risteyê dîyar dike, wekî fermandan, amojgarî.

3- Kirdeya karlêkirinê: Ew karlêkirin e ku kirdeya zimanî li wergirî dike, wekî guhdana fermanê yan qayilbûna bi amojgarîyê yan bi rastgo derxistina firêkerî yan bi derewîn derxistina wî.[160]

---

[158] Jêdera berê, 179.

[159] شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٧٩.

[160] محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٤، ٣٤-٣٥.

Bi dîtina "Sêrl"î kirdeyên axiftinê pênc cure ne:

"1. Kirdeya niwandinê. 2. Fermandan an rênimayîkirin. 3. Pêwîstbûn. 4. Ragihandin û belavkirin. 5. Hestderbirîn".[161]

Bi şêweyekê giştî kirdeyên axiftinê dabeşî du cureyên sereke dibin, ew jî "kirdeyên axiftinê yên rasterast û kirdeyên axiftinê yên nerasterast" in.

1. Kirdeyên axiftinê yên rasterast:

Di kirdeyên axiftinê yên rasterast da "... mebesta axiverî ji forma risteyê aşkera dibe ..."[162] Çi ew riste "ragihandin" an "pirs" an "fermandan" be. Wekî li xwarê dîyar dibe:

Risteya ragihandinê: Bes tu biçî, dê ewî dergehî vekey. "gef"

Risteya pirsê: Kengî te dergeh vekir? "pirs"

Risteya fermandanê: Zehmet nebît ewî dergehî veke. "daxwazî"

2. Kirdeyên axiftinê yên nerasterast:

Ev curekirde, herwekî kirdeyên axiftinê yên rasterast "şêweyê 'agahdarî, pirsyar û fermandanê' digirin"[163], lê belê cudahîya vî cureyî ji kirdeyên axiftinê yên rasterast ew e ku di

---

(161) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ١٠٣.

(162) بەکر عومەر عەلی مەعروف، ٢٠٠٠، ٨٣.

(163) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ١٠٤.

kirdeyên axiftinê yên nerasterast da "... awaze roleka giring dilîze".[164] Herwekî di van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

Risteya ragihandinê: Te dergeh her girt. "gazin"

Risteya pirsê: Ez dergehî bigirim? "redkirin"

Risteya fermandanê: Dergehî spêdahîya zwî bigire. (dergehî sibehan zû bigire.) "amojgarî"

B. WATAYA SEMANTÎKÎ

Wataya semantîkî ew curewata ye ku girêdayî wataya hoşekî ya peyvê ye ku bi rêya sîmayên watayê dirust dibe.[165] Wekî peyva "kur"ê ku xwedî van sîmayên watayî ye:



Watayeka ferhengî, asayî û dîyar a vê wataya hoşekî ya peyvê heye ku hemû kesên civakê li ser wê watayê rêkeftî ne ango li vir ew wataya ku dihê bikaranîn, ne watayeka taybetî ye ku bi tenê rêkeftina du kesan an çend kesên dîyarkirî li ser hebe, lê watayeka wê ya giştî û berbelav li nav civakê heye.

---

[164] Jêdera berê, 104.

[165] صفية مطهري، ٢٠٠٣، ١٣.

Herwisa wataya semantîkî girêdayî wataya pêwendîyê ye ku wataya peyvê di vê pêwendîyê da bi rêya peyvên berî wê û piştî wê bi dest ve dihê. Ev çende dibe eger ku wataya semantîkî ji "wataya peyvê + karîgerîya rêzimanî"[166] pêk bihê. Herwekî di van risteyan da dîyar dibe:

1- Min "Ciwan" dît.

2- "Ciwan"ê ez dîtim.

3- Min pertûk bo "Ciwan"ê bir.

4- Ew kiç "ciwan" e.

5- Ew "ciwan" dinvêsît.

Herwisa wataya semantîkî dîyardeyên "hevwata, dijwata, bixwevegirtin, pêwendîya beş û gişt û cîyawazî" bi xwe ve digire û ev dîyarde bi rêya wataya pêwendîya stûnî dihêne hebûnê.

Herwiha guherîna wataya semantîkî bi guherîna civakî ra ye. Herwekî guherîna peyva "şîn"ê di nav civaka kurd da ku "ev hevalnava ku niha di zimanê kurdî da navê rengekê taybet e, li heyamên kevn ji bo rengên tarî bi kar dihat".[167]

Herwisa di vî cureyê watayê da hêma amajeyê bi tenekê di cîhana jiderve da dike, çi ew ten berceste be yan ne berceste be û piştî ku hizir li wataya wê hêmayê dihê kirin, wê demê ew ten di mêjîyê wergirî da dîyar dibe. Wekî di hêmaya "xanî" da dîyar dibe:

---

(166) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٧٩.

(167) عەبدوڵلا عەزیز مجەمەد، ١٩٩٠، ٨٠.



Dîsa "wataya semantîkî yasa û binemayê alîkarîyê pêk tîne".[168] Ku mebest ji "yasa"yê ew asteng û kosp (kelem) in ên ku civak li dema axiftinê dixe rêya firêkerî. Wekî dema ku xwendekarek bibêje mamostayê xwe:

Were cigarê bikêşe.

Ji ber ku civak rê nade xwendekarî ku bi vî rengî bi mamostayê xwe ra bipeyive; loma ne guncav e ku ev cureyê risteyan bihêne gotin.

Pêwendîya wataya semantîkî bi alîyê asayî yê watayê ve heye[169], wekî:

Sêv: Cureyekê ji fêkî ye.

Rwîvî (rovî): Gîyanewer e.

Dîsa di vî cureyê watayê da jixwe eger kêmtirîn pile hebe ku amajeyê bi dewrûbera wê risteyê bike, da jê were fêmkirin ku firêkerek heye, çi tak be yan kom be ku dem û cihê wê

---

[168] عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٨٠.

[169] Jêdera berê, 2005, 50.

axiftinê dîyar bike, lê belê her ew wata dê bimîne xwedî watayeka gişî û rût.[170] Bi watayeka din ew dem û cih û kes bi temamî nahên dîyarkirin, ji ber vê yekê gelek caran dihê gotin ku wataya semantîkî "bi dewrûberê ne pabend e".[171] Ev çende jî dibe egera wê yekê ku wataya semantîkî xwedî watayeka mijdarî be. Wekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Wê hinar kirîn.

Di vê risteya jorîn da cihnava "wê" xwedî watayeka gîştî ye. Dema ku dewrûbereka dîyarkirî di navbera firêker û wergirî da hebe, wê demê dîyar dibe ka "wê" kî ye.

Wataya semantîkî dîsa "girêdayî şîyan û yasayên zimanî ye".[172] Ku mebest ji "tiwansit"ê, wate "şîyana zimanî", ew zanîna mirovî ya veşartî ye ji bo zimanê wî ku bi rêya wê zanînê firêker dikarin hejmareka bêsînor ji risteyan darêjin û tê bigihin, herwiha risteyên pesend û nepesend ji hevdu cuda bikin ku yasayên bikaranîna zimanî vedigire ku ev şîyana han her di jîyê zaroktîyê da li dev mirovî peyda dibe.[173] Herwekî di van risteyan da dîyar dibe:

Şîrê wê mîhê yê xweş e. "risteyeka pesend e"

Şîrê wî beranî yê xweş e. "risteyeka nawêze ye"
(nepesend e)

---

[170] شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٦١.

[171] عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٧٩.

[172] Jêdera berê, 779.

[173] میشال زکریا، ١٩٨٣، ٤٥.

C. BINEMAYÊN WATAYA SEMANTÎKÎ

Wata di zimannasîyê da arîşeyeka sereke ye. Herwiha xaleka hevbeş di vekolînên çend cureyên zanistan da ye. Lê belê bi rastî di nav babeta watayê da mijdarîyeka gelekî zêde di nav têgihan da heye. Berî hemûyan jî ew mijdarî gelekî di têgiha "wata"yê bi xwe da heye. Her li ser vê babetê ango watayê, hejmareka boçûn û dîtinan vekolînê lê dike û di van vekolînan da hejmareka zêde ji têgihên hevdij ên di nav hev da çûyî bi kar hatîye. Ev bikarhatina zor a têgihên di nav hev da bûye egera wê yekê ku wata giringî û desthilata xwe di biwara vekolînê da ji dest bide û hejmareka mezin ji vekoleran bi zanebûn watayê ji vekolînên xwe derxin.[174] Ev çende jî bû eger ku ew zana di vekolîna zimanî da bi tenê guh bidin alîyê rûxsar û formê, bê ku xwe bi alîyê watayê ve girê bidin.

Eger em li boçûna "Plato"yî ya li ser watayê temaşe bikin, em ê bibînin ku "Plato" watayê bi pêwendîyeka duqolî (alî) dibîne di navbera du binemayan da ew jî "peyv û ten" in. Piştî ku "De Saussure" hat, guhartin di van her du binemayên watayê da kir ku "De Saussure"î li şûna "peyv"ê "wêneyê dengî-form" bi kar anîye û li şûna "ten"î "hizir-wata" bi kar anîye. Ev her du binema ango "form û wata" ji bo şirovekirina wataya semantîkî berdewam bûn, heta ku her du zanayên înglîz "Ogden û Richards" di sala 1923yan da pirtûka xwe ya bi navê "Wataya Watayê-The Meaning of Meaning" belav kir ku wan her du zanayên navborî şirovekirina watayê li du

(174) ستيفن أولمان، ١٩٩٧، ٧٥.

binemayan dabeş kir, lê belê di pêwendîyeka sêqolî da ku ew jî "hêma, hizir û ten" e. Ev pêwendîya sêqolî bi binemayên wataya semantîkî dihê hejmartin. Wekî di vê sêgoşeya watayî da, wan her du zanayan ev binema berçav xistîye:



Di vê sêgoşeya watayî da hêma "peyv ... û hwd" bi rêya pêwendîyeka rasterast bi hizirê ve dihê girêdan. Herwiha ew hizir bi rêya pêwendîyeka rasterast bi tenê di cîhana jiderve da dihê girêdan; ji ber vê yekê ew hêla di navbera hêma û hizirê da û hizir û tenî da rasterast û yekser e ango hêma bi rêya hizirê amajeyê bi tenî dike ku di cîhana jiderve da ye. Dêmek ew amajeya di navbera hêma û tenî da ne rasterast e herwekî di wê sêgoşeya watayî ya jorîn da dîyar dibe.[175]

---

[175] شاهرالحسن، ۲۰۰۱، ۲۸.

Bi şêweyekê giştî zanayên semantîkê li ser binavkirina binemayên wê sêgoşeyê ji hev cuda ne. Bo nimûne "Gardner" dibêje "hêma"yê "nav-name" û dibêje "hizir"ê "wata-sense" û dibêje "ten"î "tiştê mebestdar-thing meant". "Maurice" dibêje "hêma"yê "sembol" û dibêje "hizir"ê "medlûl-significatum" û dibêje "ten"î "vegêran-denotatum".(176)

Hemû zanayên ku vekolînê li watayê dikin, ji fîlozof û zimannasan, ev rêbaza felsefeya jîrî, sêgoşeya watayî, pesend nekirin ku hin ji wan red dikin "hizir" bibe navend di navbera hêma û tenî da. Bi dîtina wan hêma yekser, bê hizir amajeyê bi tenê di cîhana jiderve da dike.(177) Ev dîtina han her me dizivirîne boçûna "Plato"yî (peyv û ten).

"Ullmann" sebaretî sêgoşeya watayî ya "Ogden û Richards"î dibêje: Em dikarin yekem car xwe ji "ten, tişt ... û hwd" xelas bikin; ji ber ku vekolerê zimanî peyv ji bo wî giring e ne "tişt an ten ... û hwd". Herwekî di wê sêgoşeya watayî da dîyar bû ku tu pêwendîyên yekser û rasterast di navbera peyv û tenî da nînin, lê belê ya giring ji bo zimannasîyê ew e ku giringîyê û cextê bide alîyê çepê yê wê sêgoşeyê ango giringîyê bi wê hêla di navbera hêma û hizirê da bide. Herwisa "Ullmann"î ew her du têgih "hêma û hizir" bi têgihên "form û wata"yê guhartin ango li şûna "hêma"yê "form" bi kar anî û li cihê "hizir"ê "wata", ew jî da ku bêhtir bi têgihên zimanî ra

(176) جورج مونان، ١٩٨١، ١٢٠.

(177) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ٢٨.

biguncin.[178] Ji ber vê yekê di pênasekirina watayê da wî digot ku wata di navbera form û watayê da pêwendîyeka alûgor e. Ev jî her heman boçûna "De Saussure"î ya ji bo watayê bû.

Bi dîtina me "De Saussure û Ullmann"î çareserîyeka herî giring ji bo mirovên kor dîtîye; çinku dema ku ew mirovên kor diçine di nav kiryara pêwendîkirin û gihandina watayê da bi tenê xwe dispêrin her du binemayên "hêma û hizir"ê; ji ber ku şîyana wan mirovan a dîtina "ten"î di cîhana jiderve da nîne. Ev jî wê watayê digihîne ku li dev wan mirovan tu giringîya wêneyê rasteqîneyî nîne, lê wêneyê endîşeyî (xeyalî) giring e yê ku hêma amajeyê pê dike.

Tevî wan boçûnên jor, niha em nikarin "ten" an "hizir"ê ji wan binemayan dûr bixin; ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku "hizir" dê di nav sêgoşeya watayî da wekî navendekê bimîne di navbera "hêma" û "ten"î da yê ku hêma amajeyê pê dike. Bi watayeka din dema ku firêker amajeyê bi tenê hêmayekê di cîhana jiderve da bike, yekser ew amajekirin li dev wergirî bi dest ve nahê, lê divê hizir li dev wergirî li wê hêmayê bihê kirin; paşê tenê wê hêmayê di mêjîyê wî da dîyar dibe. Ango bê hizir tenê hêmayê dîyar nabe; ji ber vê yekê hizir dibe navend di navbera "hêma" û "ten"î da. Bê guman dema ku firêker amajeyê bi hêmayê dike, wataya wê hêmayê ku "hizir" e li dev wergirî dîyar dibe. Lê belê dema ku wergir amajeyê bi hêmayê bike, hingê hizira wê hêmayê li dev firêkerî dîyar

---

(178) ستيفن أولمان، ١٩٩٧، ٧٨.

dibe ku li vir firêker dibe wergir û wergir dibe firêker û piştî vê kiryara hizirkirinê ya ku ji alîyê wergirî ve dihê kirin, dema ku hêma jê ra dihê gotin, tenê wê hêmayê li dev dirust dibe. Bi rengê kiryara pêwendîkirinê li gor binemayên sêgoşeya watayî dirust dibe.

Vêca ji ber vê yekê "hêma" û "hizir" di nav mêjîyî da ne û "ten" ji der ve ye;[179] ji derveyî mêjîyî ye. Em dikarin wan binemayên wataya semantîkî yên ku "Ogden û Richards"î di wê sêgoşeya watayî da danîne, bi sê pêwendîyên duqolî şirove bikin ku du ji wan sereke ne û ya sêyem nesereke ye. Ew her du pêwendîyên sereke, pêwendîya hizirê bi hêmayê ve û dîsa pêwendîya hizirê bi tenî ve ye. Pêwendîya nesereke jî ew pêwendîya nerasterast a di navbera hêma û tenî da ye ku bi rêya "hizir"ê ew her du binema bi hevdu ve dihêne girêdan ku "hizir" dibe navend di navbera wan da û hêma amajeyê bi hizirê dike û hizir jî amajeyê bi tenê di cîhana jiderve da dike.[180]

Hêjayî amajepêkirinê ye em bibêjin ku di babeta binemayê wataya semantîkî da em dikarin wekî hêmayekê yan wekî çend hêmayan serederîyê di gel "yekeyên" daneyên ji peyvê mezintir jî bikin, çinku "sînor ji dirêjîya hêmaya zimanî ra nîne. Em dikarin peyveka kurt yek kîte wekî 'bal' bi hêmayekê deyînin herwiha em dikarin risteyeka dirêj an axiftinekê jî hemûyî bi hev ra bi yek hêmayê deyînin. Dîsa em

---

(179) هۆگر مەحموود فەرەج، ٢٠٠٥، ١١٣.

(180) فوزي حسن الشايب، ٢٠٠٥، ٤٤٤.

dikarin bibêjin ku riste yan parçeyekê axiftinê ji lêkdana bi dehan û sedan hêmayên zimanî yên cuda cuda pêk hatine".[181] Wekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Azadî xanî firot.

Mirov dikare wekî hêmayekê serederîyê di gel vê risteya li jor bike, herwiha em dikarin bibêjin ku ev riste ji sê hêmayan pêk dihê, ew jî ev in: "Azadî", "xanî" û "firot".

Dîsa di nav binemayên wataya semantîkî da ew wataya ku hêma wê hildigire, divê ji wê wataya xwe ya asayî û berbelav û li ser zimanî ya di nav civakê da heyî dernekeve ango hemû kesên civakê di wê watayê da bigihin. Di vê biwarê da "F. R. Palmer" dibêje: "Ew wataya ku taybet bi kesekî ve nahê hejmartin, beşek ji vekolîna semantîkî ye ... her çawa be, pêdivîya me bi wê cudakirinê heye ya ku wataya asayî ya peyvê yan a risteyê cuda dike ji wê wataya ku ji wan peyda dibe dema ku bi rewşên dîyarkirî yên taybet ve dihê girêdan. Ku di şîyan da heye ev di navbera wata û bikaranînê da cudakirin be, yan herwekî fîlozof û zimannas dibêjin di navbera semantîk û pragmatîkê da."[182]

Li vir, em dikarin bi vî rengê li xwarê behsa wan binemayên wataya semantîkî bikin:

---

(181) محمد معروف فتاح، ١٩٨٥، ٤٧.

(182) أف. آر. بالمر، ١٩٨٥، ١١.

1- Hêma-Sign:

Hêma wekî "zincîreka rêxistinkirî ji dengan e ku peyvê pêk tîne"[183] dihê pênasekirin. Ew jî dibe du cure:

a. Hêmayên ku dihêne gotin.

b. Hêmayên ku dihêne nivîsîn.[184]

Bi dîtina "De Saussure"î, hêma di nav zimanî da peyv e ku ji du regezan pêk dihê, ew jî form û wata ne; form li cihê wêneyê dengî dihê û wata li cihê hizirê dihê. Em dikarin wan her du regezên hêmayê di vî wêneyê jêrîn da dîyar bikin:



Ev her du regezên hêmayê ango form "p + i + l + i + n + g" û wata "" pêwendîyeka bihêz di navbera wan da heye ango form bê watayê nabe û wata jî bê formê nabe; ji ber vê yekê her ku guherînek di dengên peyva "piling"ê da rûde; yekser wataya wê hêmayê dê bihê guhartin, loma ev her du regez bi hevdu ve dihêne girêdan û mirov nikare wan ji

---

(183) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٢٤.

(184) رجب عبدالجواد ابراهیم، ٢٠٠١، ١٣.

hevdu cuda bike. Ev pêwendîya bihêz a ku di navbera van her du regezan da heye, bûye eger ku "De Saussure" van her du regezan bi du rûyên pereyî bimînîne.

Sebaretî cureyên hêmayê, fîlozofê amerîkayî "Charles Peirce" hêmayê dabeşî van her sê cureyan dike:

1. Hêmaya îndêksî-Index sign: Di vî cureyê hêmayê da pêwendî di navbera form û watayê da pêwendîyeka hoyî (egerî) ye wekî ku dû nîşana agirî ye û agir jî ho ye ji bo dûyî.

2. Hêmaya aykonî-Icon sign: Di vî cureyî da curelêkçûneka wêneyî ya pêwendîya di navbera form û watayê da heye, wekî wêneyê bidestçêkirî yê rûyê kesekî.

3. Hêmaya sembolîkî-Symbol sign: Di vî cureyê hêmayê da pêwendî di navbera form û watayê da pêwendîyeka birêxistî ye. Wekî çawa hilbûna glopa sor di trafîklaytan da nîşaneya rawestinê ye.[185]

"Port Royal" hêmayan li van cureyan dabeş dike:

1- Cêgîrbûyî: Henasedan amajeyê bi wê yekê dike ku gîyanewer bigîyan e.

2- Cêgîrnebûyî: Wekî rengzerbûn û têkçûn sebaretî jina bihal.

3- Pêwendî pê ve heyî: Wekî sîmayên (nîşane) êşekê ji êşan ku mirov pê ageh bike.

---

(185) کوروش صفوی، ۱۳۸۳، ۳۵.

4- Pêwendî pê ve nînî: Wekî ku qurbandan niwandin (nimandin) e ji bo hilawîstina "Îsa"yî silavên Xwedayî lê bin.

5- Siruştî: Wekî wêneyê di xwedîkê (neynik) da.

6- Dirustkirî: Wekî ku peyv ji bo hiziran hêma ne yan jî wêne ji bo peyvan hêma ne.[186]

"Brockman" çend mercan ji bo zanîna hêmayê datîne, ew merc jî ev in:

1- Taybetmendîya hêmayê ya şêweyî-wêneyî: Li vir ew tiştê ku hêma amajeyê pê dike, ew bi xwe nîne.

2- Şîyana hêmayê ji bo gihandinê: Ango ew şîyana hêmayê heye ku wî tiştê nedîyar û veşartî veguhêze tiştekê dîyarkirî û aşkera.

3- Şîyana hêmayê ya xwedî (zatî): Hêzeka hêmayê ya taybet heye ku ji hêmayê bi xwe peyda dibe, ev çende dibe eger ku ji amajeyên din bihê cudakirin; çinku ew hêza wan amajeyan nîne wekî ku hêza hêmayê heye.

4- Wergirtina hêmayê: Li vir ew pêzanînên civakî û mirovayetî yên ku hêmayê ew hilgirtine, dihêne wergirtin.[187]

Divê em wê çendê jî dîyar bikin ku di nav babeta hêmayê da, çend têgih hene me pêdivî pê dît ku cudahîya wan li gel hêmayê bidin xuyakirin, ew jî "nîşane, sembol, îşaret" in.

---

(186) صالح الكشو، ١٩٨٥، ٤٦.

(187) صلاح فضل، ١٩٩٢، ٤٦.

Cudahîya hêmayê ji nîşaneyê ew e ku di nîşaneyê da ne merc e firêker û wergir hebin, lê belê di hêmayê da divê firêker û wergir hebin ku wê pêzanîna ku hêmayê hilgirtîye li hevdu biguhêrin.[188]

Bo nimûne, "ewr" nîşane ye ji baranê ra, lê belê eger wergir û firêkerî li ser wê yekê li hev kir ku hatina "ewr"an amajeya çûna nêçîrê û girtina balindeyan e, wê demê dê "ewr" bibe "hêma".

"Paul Ricœur" cudahîya hêma û sembolê di wê çendê da dibîne ku "sembol hêma ye, lê hêma ne sembol e. Yek rehenda hêmayê heye ku zelal û aşkera ye, herwiha yek wata û yek armanca wê heye, lê berevajî hêmayê, sembol xwedî du rehend û du armancan e ... di sembolan da wataya dengan dibine dala medlûleka din û her ev medlûla duyem e ya ku dibe sembol".[189]

Bo nimûne, du watayên forma "spî"yê hene, ew jî spî wekî rengek ji rengên di siruştê da heyî ku ev hêma ye, lê belê wataya duyem a ku ew form amajeyê pê dike; "aştî, rawestina şerî, nemana kuştinê ye ... û hwd" ku ev wataya duyem a wê formê dibe sembol.

Lê belê cudahîya hêmayê ji îşaretê ew e ku di hêmayê da amajekirina formê ji bo watayê yan bi rêya nivîsînê ye yan bi rêya gotinê ye, lê belê di îşaretê da nivîsîn û axiftin nînin, lê bi rêya îşaretan form amajeyê bi watayê dike, wekî çavniqandin (çavgirtin), girnijîn, silavkirina bi destî, tilîrakirin ... û hwd.

---

(188) عەبدولسەلام نەجمەدین عەبدوڵڵا، ٢٠٠٧، ١٤.

(189) Jêdera berê, 14.

2- **Dîyarde**

Ew jî dibe du cure:

- Hizir-Thought:

Ev têgih li cem "De Saussure"î yeksan bû bi "wata-medlûl"ê ra. Herwisa li dev heman zanayî, hizir mil bi milê formê ve regezek ji regezên hêmayê bû û ji her duyan hêma pêk dihat. Pêwendîyeka bihêz û mukum di navbera van her du regezan da heye.

Hizir di naveroka xwe da proseseka fîzyolojî ya mêjîyî ye ku tîvilê (qalik) mêjîyî encam dide; ew jî bi rêya rengvedanên ku ji jîngeha cografî û civakî dihên bi alîkarîya endamên hestpêkirinê û pişţspartina ziman û zanînê û derxistina encamên erênî û neyînî ji wê prosesê. Ev prosesa han berztirîn rengên çalakîyên mêjîyî ye ku li dev mirovî çêdibe. Herwiha ev proses bi tenê li dev mirovan heye, çinku wekî berî niha me got pêdivîya hizirê bi jîngeheka civakî heye ku giringtirîn regezên wê ziman û zanîn in û her du regez jî taybet bi mirovî ne. Dîsa pêdivîya vê prosesê bi tîvilê mêjîyî heye ku pê rabe ku ew jî niha gihîştîye berztirîn pileyên pêşketinê, ev jî herdîsa bi tenê li dev mirovan heye.[190]

Mêjî endamê hizirkirinê ye û hizir erka mêjîyî ye. Mêjî ne tenê jêdera hizir an hokara rûdana wê ye, lê belê ji bo rûdana hizirê dezgeh e. Mêjî bi tenê siruşta hizirê dirust nake, çinku ew şîyanên mêjîyî nînin ku bi tenê tu hiziran dirust bikin.

---

(190) نوري جعفر، ١٩٧١، ١٠٦.

Jêdera hizirê ew cîhan e ya ku mirov tê da dijî yan jîngeha siruştî û civakî ye[191] ku bi rêya hêmayê ew hizir di nav mêjîyê mirovî da dirust dibe, ew jî piştî ku dihê gotin, ev jî ji encamên wan serborên takekesî yan civakî, ew hêma wê hizirê hildigire ku di bingeha xwe da ew bi xwe nîne.[192]

Hizir û rengvedan her ji zaroktîyê ve bi rêya ziman û axiftinê li dev mirovî peyda dibin. Di vê biwarê da hizir û ziman pev ve dihêne girêdan û mirov nikare her duyan ji hev cuda bike. Ev jî sîmayê herî aşkera ye ku bi tenê li cem mirovî heye. Wate, ne bi rêya hêmayan be, şîyana hizirê nîne ku bibe tiştekê hestpêkirî yê rasteqîne ku bihê dariştin û veguhastin û hizir bê ziman dê bibe tiştekê rawestayî û cêgîrbûyî ku şîyana wê ya veguhastinê nebe ango ziman alav e ji bo rûdana hizirê û rê ye ji bo danûstandin û veguhastina wê ji nifşekê heta nifşeka din bi taybetî bi rêya hêmayên ku dihêne nivîsîn.[193]

Hêjayî dîyarkirinê ye em bibêjin ku hizir û dirkkirin (ادراك) (bîrbirin) du prosesên jevcuda ne, cudahîya hizirê ji dirkkirinê di wê çendê da ye ku hizir di dema dirustbûna wê da kêmtir ji dirkkirinê dikeve di nav hûrgilîyên babetê da, herwiha kêmtir ji dirkkirinê xwe dispêre her pênc endamên hestpêkirinê. Lê belê tevî vê yekê jî hizir her karekê mêjîyî ye ku ji serborên berê û wêne û rengê ku di mêjîyê mirovî

---

[191] Jêdera berê, 99.

[192] جاسم محمد العبود، ٢٠٠٧، ٧١.

[193] نوري جعفر، ١٩٧١، ١٠٥-١٠٦.

da hilgirtî bi dest ve dihê.[194] Her dema ku hêmayek ji alîyê firêkerekî ve ji bo wergirî bihê gotin, yekser ew hizira ku hêmayê ew hilgirtîye, dê di mêjîyê wergirî da dirust bibe, piştra bi tenê ew hêma dê bi rêya hizirkirinê li dev dîyar bibe. Dêmek hizir li vir "medlûl-wata" ye.

Bi şêweyekê gîştî ji bo dîyarkirina hizira hêmayê, zanayên semantîkê di serdema nû da gihîştine çend rêyan ji bo polînkirina hizirê (medlûl) ku "Morîs Ebû Nazir"[195] van rêyan dîyar dike: "rêya şêweyî, rêya dewrûberî, biwarên watayî û şirovekirin ji bo sîmayan."[196]

1- **Rêya şêweyî:**

Ev rêya han bi polînkirina hizirê radibe, li gor wî şêweyê ku wan hêmayan di yek pêkhatê da kom dike ku ji yek binyadê dabeş bûne û nêzîkbûneka dîyar di nav wan hêmayan da heye.[197] Wekî di karên "girt, dê bigire, girtî ... û hwd" da dîyar dibe.

---

(194) محمد الجزار، ٢٠٠٦، ٣٧.

(195) Hêjayî dîyarkirinê ye em bibêjin ku "Dr Morîs Ebû Nazir" behsa rêyeka din jî dike, ew jî "rêya cihî" ye. Bi dîtina vê rêyê hizir bi rêya cih û helwesta ku firêker tê da ye dihê destnîşankirin. Ji ber ku ev rê diçe nav asta pragmatîkê, me behsa wê nekir. Ji bo pêzanînên bêhtir li ser rêya cihî li van jêderan binêre:

a) شكور كاظم العوادي، ١٩٩٠، ٨٩.

b) منقور عبدالجليل، ٢٠٠١، ٦١.

(196) منقور عبدالجليل، ٢٠٠١، ٦٠-٦١.

(197) Jêdera berê, 60.

Ev rê ji bo aşkerakirina wê nêzîkbûna ku di nav hizirên wan hêmayan da heyî, destûrên klasîkî bi kar tîne; ji ber ku ew hêma li yek binyadê vedigere û her dema ku binyad tûşî guherînê bihê, wê demê di şîyan da nîne ku heman hizir bihê dirustkirin.[198] Wekî di karên "girt, çû, hat ... û hwd" da dîyar dibe.

2- **Rêya dewrûberî:**

Ev rêya polînkirinê giringîyê dide pişt bestinên bikaranîna zimanî ku ne bi rêya dewrûberê be, hêma li gor vê rêyê nahê têgihîştin; ji ber vê yekê ji derveyî dewrûbera zimanî hizira hêmayê dîyar nabe.[199] Bi watayeka din dîyarbûna têgihîştina hizira ku hêmayê hilgirtîye, dê bi rêya wê dewrûbera zimanî be ya ku tê da dihê; ji ber vê yekê şîyanên yek hêmayê yên hilgirtina çend hizir û watayên cîyawaz hene. Ev çende jî bêhtir zelal dibe dema ku yek hêma di çend dewrûberên zimanî yên jevcuda da dihê û ji encama kartêkirina wan hêmayên ku li dewrûbera wê hêmaya dîyarkirî dihên, hizir û wataya wê hêmaya dîyarkirî dihê guhartin. Herwekî di van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

Azadî Newzad dît.

Newzadî Azad dît.

Newzad mirovekê azad e.

Newzadî pertûk bo Azadî bir.

---

(198) جورج مونان، ١٩٨١، ١٢٢.

(199) شكور كاظم العوادي، ١٩٩٠، ٨٨.

3- **Biwarên watayî:**

Di vî cureyê polînkirinê da hejmareka hêmayan heye watayên wan bi hevdu ve girêdayî ne ku piranîya caran di bin têgiheka gîştî da kom dibin. Bi watayeka din da ku hizira têgiha taybetî dîyar bibe, divê li gel têgihên din ên taybet li jêr têgiheka gîştî kom bibe; loma di vê rêya polînkirinê da heta ku hizira hêmayê dîyar bibe, divê hizira hêmayên din ên ku bi wê hêmayê ve dihêne girêdan, bihê zanîn.(200) Ev jî bê guman biwareka watayî çêdikin, wekî têgiha gîştî ya "malbat"ê ku çend têgihên taybet bi xwe ve digire, wekî "bav, dayik, kur, xwişk, bira ... û hwd".

Ango bi dîtina vê rêyê heta ku hizira hêmaya "bav"ê dîyar bibe, divê hizira hemû hêmayên din ên bi hêmaya "bav"ê ve girêdayî di nav biwara "malbat"ê da ku "dayik, kur ... û hwd e" ew jî bihê zanîn û fêmkirin, paşê hizira hêmaya "bav"ê dîyar bibe.

4- **Şirovekirin ji bo sîmayan:**

Piranîya zanayên semantîkê yên ewropayî û amerîkayî giringîyê didin sîmayên watayî û wiha dihejmêrin ku ji bo polînkirina hizirê rûyekê temamker in li gor biwarên watayî. Li ser wî binemayî ku mirov dikare bi rêya sîmayên cudaker, hêmayê di biçûktirîn yekeya watadar a xwe ya zimanî da ku "morfem" e, şirove bike yan jî hizirê û bikaranînên wê destnîşan bike.(201) Herwekî leksîm an hêmaya "kiç"ê (keç) ku hilgira van sîmayên watayî ye:

---

(200) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٧٩-٨٠.

(201) شكور كاظم العوادي، ١٩٩٠، ٩٠-٩١.



Ev sîmayên watayî yên li jor, ên ku wataya hoşekî ya hêmayê ji wan dirust dibe, xwedîyên wê şîyanê ne ku bihêne guhartin.[202] Herwekî di hêmaya "kur"ê da dîyar dibe:



- Ten-Referent:

Çend têgihên din ji bo vî binemayê han li cem "Ogden û Richards"î dihêne bikaranîn, ew jî: "jêder, tişt, kes, rûdan ... û hwd" in

---

(202) a) نور الهدى لوشن، ٢٠٠٦، ١١٣-١١٤.

b) عبدالوهاب ترو، ١٩٨٩، ١١٤.

Mebest ji tenî ew tiştê jiderve ye yê ku em dikarin bi rêya hêmaya amajepêkirî bigihinê ku ew ne cîhaneka zimanî ye, lê derveyî zimanî ye. Ew ten jî bi tenê bi rêya tiştên berceste nahê dîyarkirin.[203]

Ango ne merc e ku ten berceste be wekî "mêze"yê û çêdibe ew ten berceste be. Herwiha çêdibe ku çawayîyek be wekî "şîn"ê yan jî rûdanek be wekî "kuştin"ê yan jî hizireka rût be wekî "mêrçakî"yê. Dîsa çêdibe ku ten ne destnîşankirî be, herwekî hêmaya "pênivîs"ê ku amajeyê bi pênivîseka dîyarkirî nake û mirov dikare wê hêmayê ji bo her pênivîsekê bibêje; ji ber vê yekê hin zanayan pêşnîyaz kir û gotin ku hêmaya "pênivîs"ê amajeyê bi komeka pênivîsan an cureyên pênivîsan dike. Kara "diçe" jî amajeyê bi hemû karên "çûn"ê dike.[204] Herwisa çêdibe ku hebûneka efsaneyî û aşopî ya tenî di nav deqeka dîyarkirî da hebe, herwekî tenên "xêw, dêw".[205]

Tenê hêmayan her di jîyê zaroktîyê da qonax bi qonax li dev zarokî aşkera dibe û dihê zanîn, ew jî bê guman ji encama wê amajekirinê ye ya ku bi tenê hêmayan dihê dan li gel wê danûstandina ku li gel zarokî dihê kirin.

Hêjayî dîyarkirinê ye em bibêjin ku gelek caran tenê hêmayan bi şêweyekê hûr û aşkera li cem mirovî dîyar nabe, herwekî "John Lyons" di vê biwarê da dibêje: Ne merc e

---

(203) a) منقور عبدالجليل، ٢٠٠١، ٥٨.

b) جاسم محمد عبد العبود، ٢٠٠٧، ٧٣.

(204) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٥٥-٥٦.

(205) جون لايتز، ١٩٨٠، ٤٤.

amajeya hêmayan hûr û temam be ku bibe egera wê yekê ku herdem zelal û aşkera be ango di danûstandina rojane da ew aşkerayî û hûrî hebe, çinku gelek caran sînorê amajeya hêmayan ne zelal û aşkera ye. Herwekî çawa em nikarin sînorekê temam ê cudaker di navbera "çîya û gir"î da, "mirîşk û mamirk (zîxan)"ê da û "kesk û şîn"î da deyînin. Lê belê ew hêma, wê çendê nagihîne ku têgiha amajeyê li ser wan peyrew nabe, çinku yek ji taybetmendîyên zimanî ew e ku polînkirineka ferhengî ya dîyarkirî bi ser cîhanê da peyrew bike û sînorekê remekî (عشوائي) di cihên jevcuda da jê ra deyîne.[206]

Ango heta niha vekolîna tenî li dev zanayên semantîkê, dawî li arîşeya girêdayî destnîşankirina tenan di cîhana jiderve da neanîye, loma ew tenê ku di dewrûbereka zimanî da dihê destnîşankirin an ê ku hêma wî dîyar dike, nikare bi şêweyekê hûr amajeyê bi tenekê dîyarkirî di cîhana jiderve da bike; ji ber ku ew tenên di cîhana jiderve da ji polînkirinên cur bi cur ên di nav hev da çûyî pêk hatine.[207] Herwekî di tenên gîyanewerên "kar, gîsk" da ev çende berçav dibe ku ne bi hêsanî tenê van her du gîyaneweran jî hevdu dihên cudakirin. Bi watayeka din tenên wan her du gîyaneweran di nav hev da çûyî ne û têkilî hev dibin. Ev çende dibe egera wê yekê ku arîşeya destnîşankirina tenî di cîhana jiderve da her berdewam bimîne.

---

[206] Jêdera berê, 45.

[207] منقور عبدالجليل، ٢٠٠١، ٦٢.

Ev jî dibe eger ku destnîşankirina tenî di cîhana jiderve da her bi çawayî bimîne ku nabe girft (asteng) di rêya kiryara pêwendîkirinê da. Ev jî ji wan mijaran e yên ku heta serdema nû zanayên semantîkê giringîyê pê didin; bi taybetî ew zanayên semantîkê gihîştine rêxistineka watayî ji bo jevcudakirina tenan ji hevdu, ew rêxistin jî ew bû ku ji bo zanîna her tenekê ji tenan divê hemû pêdivîyên wî tenî li ber çavan bihêne wergirtin, bi vî rengî dikare ji tenên din cuda bibe û tu mijdarî di dîyarkirina wî tenî da nemîne.[208]

Hêja ye em wê çendê jî dîyar bikin ku herdem ten û hizir wekî hev nabin, herwekî "Frege" di vê biwarê da dibêje: Reng e ku çend hêmayên yek tenî hebin, lê belê ne merc e ku yek hizir hebe, wekî "stêra êvarî", "stêra sibehê" û "extera (gerestêr) vînos"ê ku ji van her sê hêmayan ra yek ten heye, lê belê yek hizir nîne ango her hêmayek ji hêmayên jor, hizireka cuda bi xwe ve digire.[209] Dîsa berevajî wê çendê çêdibe ku çend ten ji yek hizirê ra hebin. Ev çende jî di cihnavên kesî yên serbixwe da dîyar dibe, herwekî di koma "ez, tu, ew, em, hûn û ew"ê da, ev çende berçav dibe. Bi watayeka din cihnava kesî ya serbixwe "tu", dibe ku "Azad" be yan "Newzad" be yan jî "Dilîn" be û ... hwd. Ev dibe eger ku ji wê hizirê ra çend ten hebin, ew jî tenê Azad, Newzad an Dilînê ye, lê belê ji wan hemû tenan ra bi tenê yek hizir heye, ew jî cihnava kesî ya serbixwe ji bo kesê duyem ê yekhejmar "tu" ye.

---

[208] Jêdera berê, 62-63.

[209] أزولد وتزيفان، ٢٠٠٠، ٣٦.

D. WATAYA PRAGMATÎKÎ

Ew cureyê watayê ye ku watayeka neherfî (netîpdar), neasayî û nedîyar bi xwe ve digire ku hemû kesên civakê li ser wê watayê ne rêkeftî ne. Ango li vir ew wataya ku dihê bikaranîn, watayeka xwedî (zatî) û taybetî ye ku bi tenê rêkeftina du kesan an çend kesên dîyarkirî li ser wê heye.[210] Bi watayeka din, wataya pragmatîkî ew wata ye ku ji encama "wataya semantîkî + wataya dewrûberê"[211] bi dest ve dihê. Wekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Bo çi tu nameya xwe ya doktorayê nanivêsî?

Eger em temaşeyî risteya li jor bikin, em ê bibînin ku zêdeyî wataya semantîkî ya wê risteyê ku ew jî pirsa egera nenivîsîna nameyê jê dike, li gel wê çendê jî ji alîyê şirovekirina pragmatîkî ve ew riste çend watayên din bi xwe ve digire ku bi rêya dewrûbereka dîyarkirî di şîyan da heye ew wataya mebestdar ji wan watayên ku ew riste bi xwe ve digire, bihê destnîşankirin û ew wata jî ev in:

1- Maweyê destnîşankirî yê nameyê bi ser ve çûye.

2- Tu xwendekarê doktorayê yî.

3- Hevalên te hemûyan gengeşeyên xwe kirine.

4- Şîyanên nivîsîna wê li cem te nînin.

5- Tu mamostayê zankoyê yî.

---

(210) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٦١.

(211) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٧٩.

6- Tu xema nivîsîna wê naxwî.

... û hwd.

Herwisa di vî cureyê watayê da hin peyv hene ku bi watayên taybet an bikaranînên taybet ve girêdayî ne ku heta ew peyv bi hev ra nehên, wataya wan dîyar nabe û ji encama wê pev ve girêdanê hin derbirîn dirust dibin û em nikarin wataya taybet a wê derbirînê ji wataya her peyvekê bi cuda ji peyvên din ên wê derbirînê bi dest ve bînin. Ev hemû wê çendê digihînin ku zehmet e em di wan derbirînan da wan peyvan bi tenê bînin an ji hevdu cuda bikin û hewl bidin wê wataya gişti ya wan derbirînan a ku bi cîhana jiderve ve dihê girêdan, dîyar bikin. Ji ber ku eger derfet hebe ev çende bihê bicihanîn, ji bo fêrbûna zimanekê nû bi tenê bes e ku mirov rabe komeka peyvan ji wî zimanî û ew peyvên ku beranberî peyvên di zimanê wî da heyî ji ber bike, paşê bi rêya fêrbûna wan peyvan rabe risteyên nû çêke.[212] Lê belê ev yek bi vê rêyê bi dest ve nahê. Ew derbirîn jî bi navê "îdyem-idiom" dihêne binavkirin. Wekî îdyemên: zimanreş, zikreş, dilreq, zimanxweş ... û hwd.

Dîsa wataya pragmatîkî "pabendîya bi binema û yasayan derbas dike".[213] Bi watayeka din, ew binemayê alîkarîyê yê ku ji binemayên çendêtî, çawayî, pêwendî û şêwazî dirust dibe, di nav wataya pragmatîkî da dihê ladan (dûrxistin) û

---

(212) يحيى عبابنة وآمنة الزعبي، ٢٠٠٥، ٨٥.

(213) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٧٩.

derbaskirin. Ev jî wê çendê nagihîne ku ev derbaskirin dibe girft di rêya têgihîştina watayê da. Herwekî ladana binemayê pêwendîyê di risteya jimar "2" da, dîyar dibe:

1- Bav: Tu derçûyî?

2- Kur: Uda, li hîvîya min. (dayika min li hêvîya min e.)

Di risteya jimar "2" da "kur"î binemayê pêwendîyê derbas kirîye, çinku bersiva wî ne wekî ya pêdivî ye ku bi dirustî bersiva bavê xwe bide, lê belê "bav" yekser di kurê xwe da digihe ku kurê wî derneçûye.

Herwisa wataya pragmatîkî vekolînê li hêmayên zimanî û nezimanî dike. Dîsa pêdivîya vê wataya han bi dewrûbereka dîyarkirî heye ku wataya risteyê pê dîyar bike, herwekî em bizanin ew kes kî ne û li kîjan dem û cihî ew riste hatîye gotin, çinku dema ku dewrûber ji wataya risteyê dihê dûrkirin, ew wata dê mijdar bibe. Wê demê ew riste dê zelal û aşkera be dema ku em wê dixin di dewrûbereka dîyarkirî û destnîşankirî da; ji ber vê yekê dihê gotin ku "wataya pragmatîkî ne watayeka mijdar e û dewrûber wê ronî dike".[214] Ev çende jî di nîşankaran da bi şêweyekê aşkera dîyar dibe.

Bo nimûne eger em cihnava kesî ya serbixwe "ew" wergirin, li vir pêdivîya me bi wê yekê heye ku bizanin ka "ew" kî ye; loma dewrûbera ku ew riste tê da dihê gotin, ji me ra dîyar dike bê "ew" kî ye. Ev jî dibe eger ku ew mijdarîya di cihnava "ew"ê da heyî, nemîne.

---

(214) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٨١.

Dîsa wataya pragmatîk "pabendî wê çalakîyê ye ku şirovekirineka guncav ji bo risteyên nepesend raber dike da ku li gel dewrûbera gotinê bigunce".[215] Wekî dema ku sibehê dayikek kurê xwe ji bo karî ji xew rake û bibêjîyê:

Ji xew rabe, êvar e.

Li vir ew bi xwe ne êvar e, lê belê kur dê tê bigihe ku dereng e û yekser dê ji xew rabe.

Herwiha di nav wataya pragmatîkî da fonemên nekertî roleka karîger dilîzin ji bo dîyarkirina wataya wan yekeyên ku di gel da dihên, ji ber ku ev fonemên nekertî bi erka guherîna watayê radibin, ew jî dema ku bi rengên cuda li gel wan yekeyan dihêne gotin. Em dikarin di vê risteya jêrîn da dîyar bikin:

Azad hat.

Guherîna pileya awazeyê di risteya jorîn da çend watayên cuda dide wê risteyê ku ew jî eger em awazeya wê risteyê carekê bi awazeyeka pirsyarlêkirineka bilind bibêjin û careka din bi awazeya asayî ya nizm an asoyî bibêjin.[216] Ango her carekê ew riste dê watayeka cuda bi xwe ve bigire. Vêca ji ber wê yekê roleka van fonemên nekertî ya dîyar di destnîşankirina wataya wan yekeyên ku di gel wan dihên, heye.

---

(215) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٥٢.

(216) يحيى عبابنة وآمنة الزعبي، ٢٠٠٥، ٨٥.

Herwisa şîyanên vî cureyê watayê hene ku watayeka mîtaforî ji bo risteyên nepesend ên semantîkî dirust bike.[217] Herwekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Gîyanewerî stran gotin.

Wekî em dizanin gîyanewer stranan nabêje, çinku gîyanewer nikare vê yekê bike, lê belê li vir ji alîyê pragmatîkê ve hevpişkên axiftinê dikarin watayeka mîtaforî bidin wê risteyê. Vêca çêdibe mebesta wan li vir ji "gîyanewer"î "mirov" be yan her tiştekê din be ku ev jî li gor mebesta wan û wê dewrûbera nezimanî ya ku ew riste tê da dihê gotin, dimîne.

Ango em dikarin bibêjin ku pêwendîya wataya pragmatîkî bi erkên gihandina zimanî ve heye, yên ku li pişt wataya semantîkî dihên, ango yên ku nikarin wataya semantîkî dîyar bikin, ev jî ji xwendin, derencam, têgih, mebest û arasteyên derûnî û civakî yên cur bi cur pêk hatine.[218]

Hêja ye em vê çendê jî bibêjin ku pêdivîya wataya pragmatîk a her gotinekê bi komelek ji hokar û regezan heye ku divê li gor dewrûbereka nezimanî ew hokar û regez li ber çavan bihêne wergirtin, ew hokar û regez jî pêk hatine ji firêker, wergir, kesên pişkdar, cih, dem, babet, şêwaz, mebesta firêkerî û encamên praktîkî û reftarî yên ku wê gotinê li dev wergirî û kesên pişkdar peyda dikin.[219]

---

[217] شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٥٩.

[218] Jêdera berê, 161.

[219] Jêdera berê, 157.

E. BINEMAYÊN WATAYA PRAGMATÎKÎ

Wataya pragmatîkî, girêdayî çar binemayan e, ew jî "firêker, wergir, babet û dewrûber" in ku bi rêya van her çar binemayan kiryara pêwendîkirinê dikare di navbera firêker û wergirî da dirust bibe.[220] Her dema ku binemayek ji binemayên jor were dûrxistin, wê demê ew kiryar bi ser nakeve. Ji ber ku eger firêker nebe, babet jî nabe, herwiha têgihîştina wê babetê li dev wergirî jî peyda nabe. Çinku ew hêmayên zimanî û nezimanî yên ku babet ji wan dirust dibe ji alîyê firêkerî ve dihêne arastekirin. Herwisa nebûna wergirî di nav wan binemayan da, dibe eger ku ew hêma nehêne vekirin û wataya wan dîyar nebe. Dîsa binemayê babetî jî ji bo dirustbûna wataya pragmatîkî binemayekê giring e, ji ber ku ew hêmayên ku di navbera firêker û wergirî da dihên alûgorkirin, girêdayî babeteka dîyarkirî ne; ew babet ji alîyê firêkerî ve bi rêya axiftin an nivîsînê yan bi rêya îşaretan ji bo wergirî dihê arastekirin û piştî wergir hizirê li wê babeta arastekirî dike, ew wata li dev dîyar dibe.

Ango têgihîştina babetê bi tenê bi rêya hêmayên zimanî bi dest ve nahê. Di vê biwarê da "Hjelmslev" dibêje: Kiryara têgihîştinê ne pêgîr (pabend) e ku tenê bi rêya zimanî bi cih bihê, lê çêdibe ku bi rêyên din jî ew têgihîştina alûgor were dabînkirin. Herwekî têgihîştina ker û lalan ku bi rêya

---

(220) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥١.

îşaret û axiftinê ye. Herwiha hêmayên hatin û çûnê jî dibêjin ku ronahîya kesk wê yekê digihîne ku rê vekirî ye, lê belê ronahîya sor amajeya wê çendê ye ku tu rawestî û derbas nebî. An jî bi rêya her hêmayeka din a nezimanî be ku bikare pêzanînan veguhêze.[221]

Bê guman wataya pragmatîkî bê binemayê dewrûberê, watayeka mijdar hildigire, ji ber hindê dihê gotin: Wataya pragmatîkî "bi dewrûberê pabend e"[222], çinku ew wataya ku vê asta han bi xwe ve digire, ne watayeka aşkera ye ku hemû kes tê bigihin, lê bi rêya dewrûberê ew wataya takekesî û xwedî li dev firêker û wergirî dihê aşkerakirin û tu mijdarî tê da namîne; çi ew mijdarî ji alîyê kesan ve be yan ji alîyê dem û cihî ve be yan jî ji alîyê mebesta firêkerî bi xwe ve be. Ev çende jî dibe eger ku gelek zimannas pragmatîkê bi dewrûberê ve yeksan bikin; çinku dûrxistina dewrûberê ji wataya pragmatîkî dibe eger ku ew babeta ku dihê arastekirin, çend watayan bi xwe ve bigire û biçe nav biwara semantîkê, ji ber ku semantîk dewrûberê li ber çavan wernagire. Loma dewrûber dibe sînor ji bo jevcudakirina semantîkê ji pragmatîkê.

Em dikarin wê pêwendîya ku di navbera wan binemayên wataya pragmatîkî da heyî, di vî wêneyê jêrîn da dîyar bikin:[223]

---

[221] میلکا افیتش، ۲۰۰۰، ۳۲۵.

[222] عەبدلواحید موشیر دزەیی، ۲۰۰٦، ۷۷۹.

[223] مهاباد هاشم ابراهیم، ۲۰۰٦، ۱٦.



Hêjayî dîyarkirinê ye em bibêjin ku veguhastina hizirê ji bo pêzanîneka dîyarkirî li dev wergirî prosesek ji prosesên "kirine hêmayê-encoding" ye. Dêmek kirine hêma bi karê veguhastina hizira firêkerî ji bo sîstemekê ji hêmayên gihandî li dev wergirî radibe, lê wergirtina wan hêmayan ku hilgirên babeta firêkerî ne û zanîna wê hizira ku wan hêmayan hilgirtîye, prosesa "vekirina hêmayê-deconding" jê çêdibe. Ango vekirina hêmayê bi karê dîyarkirin û zanîna mebesta ku firêkerî ji bo wê hinartîye bi rêya hêmayan radibe, piştî ku ew hêma li dev wergirî dihêne şirovekirin.[224]

Li vir em ê hewl bidin behsa binemayên wataya pragmatîkî bikin:

1. Firêker-Sender:

Firêker binemayê yekem ji binemayên wataya pragmatîkî ye. Firêker ew kes e ku bi kiryara pêwendîkirinê radibe û ji wî ew kiryar dest pê dike; ew jî dema ku bi arastekirina babeteka dîyarkirî radibe.

---

(224) میلکا افیتش، ۲۰۰۰، ٤٢٧-٤٢٨.

Piranîya carên ku firêker bi kiryara pêwendîkirinê radibe, li wê yekê vedigere ku handerek dibe egera azirandina wî ku biaxive. Wekî dema ku hizirek an bîrokeyek di mêjîyê wî da çêdibe yan dema ku guh dide pirsyarekê û daxwaza bersivandina wê pirsyarê jê dihê kirin, wê demê firêker alîkarîya zimanî dixwaze; çinku ziman ji komeleka hêmayan pêk hatîye ku civakê li ser wan li hev kirîye. Bi vî rengî firêker hêvî û arezûyên xwe bi rêya zimanî bi cih dihîne. Herwisa firêker di nav zimanî da lîsteyeka dirêj ji yekeyên ferhengî dibîne ku bi girêdaneka lojîkî û derûnî bi mêjîyê wî ve girêdayî ne, ew yekeyên ferhengî li gor pêwendîyên hevwata, dijwata, guncan û cureyên din ên pêwendîyan birêxistî ne ku ji wan pêwendîyên watayî, peyvan hildibijêre; ev jî bê guman divê bi raçavkirina yasayên morfolojî û sentaksî yên zimanî be.[225]

Vêca bi rêya koendamê demarî ku ji hejmareka zor ji xanên (şane) demaran pêk dihê ku dibêjine her yekê ji wan "nîyoron-neoron" li gel hejmareka zor ji davên (mûyên) demarî ku mêjî û masulkeyên bizwêner ên axifinê bi hevdu ve girê dide û di nav xana demarî da karlêkirineka kîmyawî rûdide û rewtekê (gereka) karebayî dirust dibe û demarên culandî (hejandî) axiftinê ji bo masulkeyên dengî vediguhêzin û axiftin peyda dibe.[226]

Di pişkdarîkirina kiryara pêwendîkirinê da, eger ziman keresteyê zimanî yê xav bide kesên pişkdar ên axiftinê, divê li ser çalakîya firêkerî ya zimanî bi dirustî wê babetê bigihîne,

---

(225) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٢.

(226) عبدالرحمن ايوب، ١٩٨٩، ٢٥.

da ku kiryara gihandin û hinartinê bi şêweyekê têgihîştî bi cih bihê. Dema ew axiftina ku dihê gotin guncav be li gor dewrûberên jevcuda yên ku tê da dihê gotin, herwiha ew axiftin ji bo merema peydabûna têgihîştinê di navbera firêker û wergirî da hatibe dirustkirin, wê demê ew çalakî dê serkeftî be.[227] Ji ber ku li vir firêker hêmayên di nav ferhengê da heyî ji bo mebestên taybet û dîyarkirî bi kar tîne. Wekî dema ku firêker peyva "dîwar"ê di risteya "Dîwar her bêdeng nabe." da bi mebesta "milet"î bi kar bîne, pêdivîya vê yekê jî bi dewrûbereka dîyarkirî heye ku wê mebestê li dev wergirî dîyar bike.

Ango firêker bi rêya dewrûberê bi karê veguhastina watayên giştî yên wan hêmayên di nav ferhengê da heyî ji bo hêmayên xwedî bihayekê watayî yê destnîşankirî radibe ku firêker wekî berpirsê rasterast ê kiryarên saloxkirina watayên destnîşankirî dihê hejmartin, ew jî da ku ew hêma li dev wergirî zelal û têgihîştî bin, di nav wê jîngeha ku ew hêma tê da hatine bikaranîn.[228]

Hêjayî amajeyê ye em bibêjin dema ku firêker bi dirustkirina babetê radibe, hejmarek ji regezan têkilî wê babeta dirustkirî dibe ku ew regez bi rêya her bestineka ku hebe bi kesayetîya firêkerî ve dihêne girêdan. Ji wan regezan jî "girîmanên pêşîyê-presuppositions" ne. Mirov dikare girîmanên pêşîyê ji babetê bi xwe dûr bixe, çinku wergir di dirkkirina wan girîmanan da zehmetîyê nabîne û firêker wan

---

(227) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٢.

(228) عبدالقادر عبدالجليل، ٢٠٠٦، ٢١٧-٢١٨.

girîmanan bi rêya wan pêzanînan ên ku wî ji jîngeha xwe ya civakî wergirtine yan bi rêya hewl û bizavên xwe yên takekesî dirust dike.[229] Herwekî firêker bibêje yekî:

Tu bo çî êdî nahêyî qutabxanê?

Ji vê risteya li jor dihê zanîn ku berî wê demê ew kes dihate dibistanê. An dema ku bibêje wergirî:

Tu van rojan zadî kêm dixoyî?

Ji vê risteyê dihê zanîn ku berê wî kesî zad gelekî dixwar. Ev jî bi rêya nasîn û zanîna kesê wergir, firêker wê risteyê dibêje çinku eger di dema borî da serbor, nasîn û pêzanînên firêkerî li ser wergirî nebin, firêker nikare van cureyên risteyan bibêje wergirî.

Herwiha yek ji wan regezên din ên ku têkilî babeta firêkerî dibin, ew e ku piranîya caran axiftina firêkerî wekî boçûnên wî ye. Li vir eger axiftina firêkerî ne wekî boçûnên wî be, hingê ew babet ne rastgo ye. Lê belê eger axiftina wî wekî boçûnên wî be, wê demê ew babet dê rastgo be. Ji bo zanîna vê çendê, em dikarin bi rêya dorhêlê bigihinê ango li vir dorhêl (واقع) dibe dadwer ji bo dîyarkirina rastgoyî û nerastgoyîya babeta firêkerî. Ew jî eger babeta wî wekî ya di dorhêlê da be; wê demê ew babet dê rastgo be û eger babet ne wekî ya di dorhêlê da be, hingê ew babet dê ji rastgoyîyê dûr bikeve.[230] Em dikarin vê çendê di vê risteyê da dîyar bikin:

---

(229) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٣-١٥٤.

(230) Jêdera berê. 154.

Azad bu serokê bajêrvanîyê.

Di vê risteyê da eger rast be ku Azad bûye serokê bajarvanîyê, wê demê ew babet dê rastgo be û eger na, dê berevajî be.

Regezeka din heye ku ew jî mebest e, li vir firêker hewl dide wê mebestê bi rêya babeta darîştî bi cih bîne, ev jî bi rêya karîgerîya şêwaza wê babetê û sepandina cureyekê dîyarkirî ji derbirînê, ew mebesta han dîyar dibe. Her ji wan regezên din ên ku têkilî babeta firêkerî dibin, ew jî ew e ku firêker di kiryara pêwendîkirinê da bi pêşbînîyên destnîşankirî radibe da ku babeta wî bi wê pêdivîyê ra li hev bike û herwiha da ku mebesta ku xwe ji babetê derdibire, bi cih bîne. Herwekî firêker mirovekê zana û biageh li cihê mirovekê nezan û bêageh deyîne û di nîvroyê da ji bo biçûkkirinê bibêjîyê hetav derketîye.[231]

Li gel wan hêmayên zimanî yên ku bi rêya "zimanê siruştî"[232] hatine gotin, firêker hin caran mebesta xwe ji bo wergirî bi rêya hêmayên nezimanî jî derdibire ku ew hêmayên nezimanî girêdayî zimanê îşaretan in; hêmayên nezimanî ji wan îşaretan pêk hatine yên ku mirov bi rêya endamên laşê xwe ji bilî devî, wan derdibire. Wekî "çav, tilî, ser, dest ... û hwd"

---

(231) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٤.

(232) Mebest ji zimanê siruştî, zimanê axiftin û nivîsînê ye.

2. Wergir-Receiver:

Rola wergirî wê demê dîyar dibe, dema bi karê vekirina babeta ku firêkerî jê ra araste kirîye, radibe. Ev jî bê guman roleka erênî ye di temamkirina prosesa pêkanîna babetê da; çinku heta ku di her du qonaxên pêkanîna babetê û vekirina babetê ra derbas nebin, tu prosesên pêwendîkirinê bi dest ve nahên.[233]

Ango wergir ne bi tenê wergirê babetê ye, lê arezûya zanînê û dîyarkirina wê babeta ku ji bo wî hatîye arastekirin, wergirî ber bi zanîna wê babeta wergirtî ve diajo, herwisa palderê maytêkirinê jî wergirî han dide ku pişkdarîyê di vekirina hêmayên babetê da bike û bi xwendina wan watayên ku wê babetê hilgirtine rabe,[234] da ku mebesta firêkerî bizane. Vêca ev babeta han reng e ku bi rêya xwendinê be yan bi rêya îşaretan be; li vir wergir bi rêya çavan wê babetê werdigire yan jî bi rêya gotinê ku li vir wergir bi rêya guhî wê babetê werdigire û di her du rewşan da ew hizir digihe mêjîyê wergirî.[235]

Hêjayî dîyarkirinê ye em bibêjin ku ew babeta ku wergir ji firêkerî werdigire, eger aşkera, hêsan û rasterast be, wê demê wergir dê bi hêsanî tê bigihe. Lê belê eger ew babet ne aşkera, zehmet û nerasterast be, hingê erka mêjîyî giran dibe û pêdivîya wê babetê bi têgihîştineka kûr çêdibe ku hizir

---

(233) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٥.

(234) إسماعيل الملحم، ٢٠٠٣، ١٣.

(235) عبدالله الطويرقي، ١٩٩٧، ٤٢.

lê bihê kirin û dibe ku gelek caran jî giran be ji bo wergirî.[236] Di vê demê da wergir da ku bigihe wataya rasteqînî bi karê berawerdkirina wê babeta wergirtî li gel şarezabûna xwe ya berê ya ku di biwara pêwendîkirinê da heyî, radibe. Herwisa bi alûgorkirina wê babetê li gel firêkerî radibe bi rêya prosesên hizirkirin û derbirînê, lê belê li vir divê wergir wê sîstema hêmayan ji zimanê siruştî û zimanê îşaretan bi temamî bizane, da ku bikare pişkdarîyê bi rengekê karlêkirî di kiryara pêwendîkirinê da bike.

Erka wergirî ya erênî di nav kiryara pêwendîkirinê da zêdetir dibe, ew jî dema ku bi karê temamkirina wê babeta zimanî ya ku kêm gihîştîyê radibe, ew jî piştî ku babeta kêm ji alîyê pişkdarê yekem ve ku firêker e ji bo wî bihê arastekirin. Li vir wergir alîkarîya girîmanên ku ji serborên berê wergirtine dixwaze da ku mebesta wê babeta ku kêm gihîştîyê bi temamî bizane û li dev xwe aşkera û temam bike. Ev jî bi rêya zanîn û bikaranîna wî ji zimanê wî ra ev çende li dev wî dîyar dibe û dizane ku reng e ew çenda borî hêzbûnek be di çarçoveya berzkirina rola wergirî ya erênî da ji bo temamkirina wê kêmbûna ku ji derbirînên zimanî werdigire û ew derbirîn ên ku bi temamî ji bo wî nahêne gotin, nabine eger ku herdem wergir di wan derbirînan da negihe. Vêca li vir çêdibe ku ew kêmgihîştin û rakirin li hokara sentaksî vegerin û bi rêya vê hokarê di şîyan da heye di gelek cihan da ew rakirin peyda bibe, herwisa çêdibe ku roleka giringtir a pêwendîyên derve

---

(236) روي. سي. هيجمان، ١٩٨٩، ١٧٢.

jî di rûdana vê kiryarê da hebe. An jî çêdibe ku gelek axiftin bi xwe bibe egera rûdana wan rakirin û kurtkirinên ku di babetê da rûdidin.[237] Herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Bexdê.

Risteya "Bexdê." di bingeha xwe da "berê xwe bide ewî/ewê" ye, lê belê li vir ew axiftin gelekî hatîye kurtkirin û firêkerî ew riste kêm ji wergirî ra derbirandîye.

Hêjayî gotinê ye em bibêjin ku piranîya caran dema ku hin beşên axiftinê ji babeta arastekirî dihêne labirin, ji encama bawerîya firêkerî bi wergirî ye di nav kiryara pêwendîkirinê da; loma ev rakirin di nav kiryara pêwendîkirinê da rûdide.[238]

3. Babet-Object:

Babet "ew hizir e ku 'firêker' dirust dike, paşê wergir wê dike hêmayeka guncav da ku ji kesê beranberî xwe tê bigihe".[239] Vêca çi ew hêma zimanî be yan nezimanî be. Bi watayeka din babet keresteyê derbirînê ye ku bi rêya wî keresteyî firêker û wergir diçine di nav kiryara pêwendîkirinê da; çi ew pêwendîkirin bi rêya zimanê siruştî be yan jî bi rêya zimanê îşaretan be û di her du rewşan da ew hizira ku firêkerî dirust kirîye, bi rêya wan hêmayên zimanî û nezimanî ji bo wergirî dihê veguhastin û her heman hizir li dev wergirî peyda dibe piştî ku wergir wan hêmayan werdigire.

---

(237) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٦.

(238) Jêdera berê, 157.

(239) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٥، ٥٦.

Li gor wan hêmayên zimanî û nezimanî yên ku pişkdarîyê di gihandina watayê da dikin, em dikarin babetê dabeşî du cureyan bikin:

1) Babeta zimanî: Li vir bi raçavkirina yasayên rêzimanî, firêker wê babeta nivîskî yan jî babeta dirkandî ji wergirî ra vediguhêze.

2) Babeta nezimanî: Li vir bi rêya hêmayên nezimanî (îşaret), ew babeta ku di mêjîyê firêkerî da heyî ji bo kesê beranber dihê veguhastin.

Çiqasî ew babeta zimanî û nezimanî li dev wergirî têgihîştî û aşkera be, ewqas babet dê serkeftîtir be. Ev jî bê guman li ser şîyan û zîrekîya firêkerî di kiryara pêwendîkirinê da dimîne, ji ber ku eger ew babeta arastekirî li dev wergirî ne têgihîştî be, mebesta firêkerî aşkera nabe, herwisa ew kiryara pêwendîkirinê jî bi cih nahê. Ev jî dê bibe egera wê yekê ku ew renc û zehmetîya ku wî di wê kiryara pêwendîkirinê da mezaxtîye bi herweyî û bi belaşî biçe, çinku wê demê ew hizir û mebesta han li dev wergirî aşkera û têgihîştî nabe.

Sebaretî babeta zimanî, eger di wê babetê da pêwendîya keresteyên wî yên bi hev ve girêdayî bi hevdu ve hebe, hingê ew babet dê bi dorhêla derve ve girêdayî be û ev girêdana han zanayên berê di vekolînên xwe da bi navê rade (النسبة) bi nav kirîye. Ev radeya han jî dabeşî du cureyan kirine, ew jî ev in: radeya axiftinê û radeya derve. Vêca eger ew her du rade wekî

hev bin ango ew tiştê ku di axiftinê da dihê gotin wekî wî tiştê heyî be, wê demê ew gotin dê rastgo be û eger na, hingê ew gotin dê ji rastgoyîyê dûr bikeve.[240] Wekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Azad mir.

Di vê risteya jorîn da eger rast Azad miribe, hingê ew riste dê rastgo be û eger na, wê demê ew riste dê ji rastgoyîyê dûr bikeve. Ew jî li ser guncan an neguncana axiftinê bi dorhêlê ve dimîne.

Çawa ku babeta dirustkirî ji alîyê guncan û neguncanê ve bi dorhêlê ve dihê girêdan, dîsa keresteyên babetê jî bi dorhêlê ve dihêne girêdan ji wî alîyî ve ku keresteyên wê amajeyê bi tenê ji derveyî zimanî dikin. Herwisa babet bi pişkdarên xwe ve jî dihê girêdan, ji ber ku firêker babetê li gor boçûn, girîman û mebestên xwe dirust dike, herwiha wergir jî ji ber ku bi rola wergirtin an xwendinê radibe û mêjîyê wî ji pêzanîn, girîman û serborên berê ne vala ye, loma ev hokar hemû kartêkirinê li siruşta têgihîştina babetê li dev wergirî dikin.[241] Herwekî firêker peyva "demokratî"yê di nav babeta arastekirî da bibêje, li vir ji encama pêzanîn û serborên wergirî yên berê yên li ser "demokratî"yê, hizira wî ber bi rêgeha demokratîyê ve diçe.

---

(240) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٩.

(241) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٥٩.

Bi şêweyekê giştî divê wergir ji babeta arastekirî razî be û bibe egera wê yekê ku wergir bi karê lêgerîna wê babeta arastekirî rabe. Komeka merc û taybetmendîyan heye ku babet bihayê xwe jê werdigire û divê ew merc û taybetmendî di nav babetê da hebin. Giringtirîn merc jî ev in:

1- Divê ew babet pesend be û alîkarîya wergirî bike ku bihê bawerkirin.

2- Herwiha jixwe eger babet bi kêmtirîn sînorê xwe jî be, divê ew babet hilgira qayilbûnê be.

3- Pêwîst e firêker piştgirîya babeta xwe bi anîna nimûneyan bike û sembolan jî di nav da bi kar bîne. Ev jî dibe eger ku wergir giringîyê bide wan û hewla çareserîya wan bide.

4- Divê ew babeta ku dîmeneka pesendkirî ji rastgoyîyê hildigire, hêsan jî be, ji ber ku hêsankarî yek ji sîmayên babetê yên giring e.[242] Ji ber ku eger babet li dev wergirî ne hêsan û têgihîştî be, hingê wergir nikare di mebesta firêkerî da bigihe; ev jî dê bibe egera wê yekê ku ew kiryar ne serkeftî be.

4. Dewrûber-Context:

Dema ku ziman ji bo mebesteka dîyarkirî di navbera firêker û wergirî da dihê bikaranîn, bi dewrûberekê ve dihê girêdan da ku ew wataya mijdar a ku babet bi xwe digire,

---

(242) إسماعيل ملحم، ٢٠٠٣، ١٣.

aşkera û dîyar be û mijdarî tê da nemîne. Vêca eger dewrûber li ber çavan nehê wergirtin, mebesta firêkerî li dev wergirî dîyar nabe û wê demê ew babet dê hilgira çend watayan be.

Li vir em ê hewl bidin cuda behsa rola dewrûberê di babeta zimanî û nezimanî da bikin.

Roleka karîger a dewrûberê di babeta zimanî da heye, ew jî ji bo dîyarkirina wataya pragmatîkî di navbera hevpişkên axiftinê da. Mebest ji dewrûberê ew helwesta jiderve ye yan jî çarçoveya civakî ya gîştî ye ya ku pişkdarîyê di kiryara têgihîştina di navbera firêker û wergirî da dike û herwiha ji alîyê dem û cihî ve, bi karê dîyarkirina wê axiftina ku dihê gotin, radibe û ev destnîşankirina watayê û helkefa wê rewşê ku dewrûber pê radibe, daxwaza wê yekê dike ku şarezayîya firêkerî ya pêzanînên civakî hebe yên ku di nav wê axiftinê da dihêne gotin.[243]

Li gor xala borî, em dikarin bibêjin ku dewrûber wan hemû pêzanînên berê û niha yên ku girêdayî kultûr, rewşenbîrî, dem, cih, rewş, seqa û pêzanînên ku bi şarezayîya hevpişkên axiftinê ve girêdayî vedigire û bi rêya wan zanyarî û pêzanînan wergir di mebesta firêkerî da digihe. Çinku ew wataya ku di vê astê da dihê bikaranîn, herwekî berî niha hatîye dîyarkirin, ne watayeka aşkera û asayî ye ku hemû kesên civakê tê bigihin, lê watayeka dîyarkirî ya taybetî ye di navbera firêker û wergirî da. Ji ber vê yekê çêdibe li vir peyva ferhengî li gor dewrûberê bi wataya xwe ya berevajî bihê. Herwekî peyva "zana"yê bi wataya "nezan"ê bihê yan jî ji bo

---

(243) مهاباد هاشم ابراهيم، ٢٠٠٦، ١٦.

her mebesteka din a dîyarkirî bi kar bihê. Ev jî bê guman pêdivîya wê bi dewrûbereka guncav heye ku di navbera hevpişkên axiftinê da hebe.

Her di nav babeta zimanî da, rola dewrûberê li sê xalên sereke dizivire, ew jî "dewrûbera kelçerî, rewşên girêdayî helwestê û harîkarên axiftinê" ne.[244]

1- Dewrûbera kelçerî (çandî):

Di vê dewrûberê da divê jîngeha çandî yan civakî ya ku peyv tê da dihê bikaranîn, bihê destnîşankirin. Herwekî bikaranîna peyvên "rich" û "wealthy"ê di nav civaka brîtanyayî da ku peyva "rich" sebaretî peyva "wealthy"ê amajeyê bi çîneka civakî ya berz dike.[245] An jî peyvên "hevjîn" û "jin"ê li nav civaka kurd ku her yek ji wan amajeyê bi çîneka dîyarkirî dike ku peyva "hevjîn" amaje ye ji bo çîneka berz, lê belê peyva "jin"ê di nav çîneka nizm da bi kar dihê.

Dîsa her kelçerek an grûpek li gor siruşta xwe peyvên taybet bi kar dihîne û di heman demê da wataya wê peyva ku di wan grûpan da bi kar dihê, ji grûpekê heta grûpeka din cuda ye. Herwekî peyva "reg"ê ku li dev cotyarî watayeka wê ya taybet heye û li dev zimannasî watayeka wê ya din heye û li dev matmatîkzanî xwedî watayeka din e ku ji wan her du watayên pêşî cuda ye.[246]

---

(244) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٦١.

(245) أحمد مختار عمر، ١٩٨٢، ٧١.

(246) جاسم محمد عبد العبود، ٢٠٠٧، ١٤٨.

Bi şêweyekê giştî dewrûbera çandî bi jîyana civakî ve girêdayî ye yan jî pêwendîya wê bi kelçerê civakî yê ayînî yan ê sîyasî yan jî yê komelayetî ve heye.[247]

2- Rewşên girêdayî helwestê:

Ev xal wan kawdan û rewşan bi xwe ve digire yên ku bi helwesta babeta zimanî ve girêdayî ne, li gel wan hemû pêwendîyên ku kartêkirinê li wataya wê babeta arastekirî dikin û watayeka taybet didine wê babeta zimanî.[248] Herwekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Tu bi xêr hatî.

Ev risteya jorîn çêdibe ku bi wataya bixêrhatina kesî bihê, ew jî dema ku bi xweşhalî ew riste ji bo kesê beranber bihê gotin. Lê belê eger fermanberek dereng biçe dewamê û berpirsê wî bibêjîyê "Tu bi xêr hatî", wê demê ew riste dê bi wataya tiranepêkirinê (henekpêkirin/qerf) bihê.

Bi şêweyekê giştî, em dikarin wan rewşên bi helwesta babeta arastekirî ve pêwendîdar ên ku kartêkirinê li wataya babeta zimanî dikin, di van xalên jêrîn da dîyar bikin:

a. Rewşa ku pişkdarên axiftinê tê da.

b. Dewrûberên wê rewşa ku babet tê da dihê gotin.

c. Cih û dema ku axiftin tê da rûdaye.

---

(247) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٦١.

(248) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٦٢.

d. Tişt û rûdanên ku ji babeta axiftinê pêk hatine. Bo nimûne dema ku tu bibêjî "seqa sar e" û ew bi xwe germ be, wê demê wergir dê tê bigihe ku tu tirane û galteyan pê dikî.

e. Pêwendîya di navbera hevpişkên axiftinê da ji alîyê pile, paye, temen û cureyê pêwendîya di navbera wan da. Herwekî firêker bibêje wergirî "pencereyê veke". Li vir ka cureyê daxwazîyê ferman e yan dawa (التماس) ye, li ser zanîna wê pêwendîya di navbera hevpişkên axiftinê da dimîne; eger daxwaz ji xwedîyê malê ji bo xulamî be yan ji bavî ji bo kurî be yan ji mamostayî ji bo qutabî be, hingê ew daxwaz dê bibe ferman. Lê belê eger firêker û wergir yek ast bin, wê demê ew daxwaz dê bibe dawa.[249]

3- **Harîkarên axiftinê:**

Pêwendîkirina bi rêya zimanî xwe dispêre hêmayên ku dihêne gotin, lê belê gelek caran di axiftinê da hin hêmayên din pişkdarîyê dikin, wekî hildana birûyan, hejandina milan, rakirin û daxistina serî.[250]

Ew amajeyên laşî yên bi zimanî ra bi kar dihên ku dibine temamker ji wataya axiftinê ra bi têgiha "perezimanî-paralanguage" dihêne binavkirin.[251]

---

(249) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٦٢-١٦٣.

(250) بيار غيرو، ١٩٨٢، ٦٦.

(251) محمد علي الخولي، ١٩٨٢، ٢٠١.

Ango alîkarîyên axiftinê wan derbirînên rûyî yên mirovî û amajeyên destî û nîşandanên serî û hemû livînên din ên laşî vedigirin; ên dibine temamker ji bo peyvên ku firêker dibêje da bikare bi şêweyekê aşkeratir wan peyvan derbire. Giringîya van colandinên (liv û tevger) laşî li gel hevalnavên amajeyê (nîşander) "ew ... a/êhe, eve ... e" û cihnavên amajeyê "ewa/ê he, eve" zêdetir dibe dema ku pêdivîya wan hevalnav û cihnavên amajeyê bi amajeya destî hebe wextê ku dihêne gotin. Ew jî da ku bi şêweyekê aşkeratir tiştê mebestdar bihê dîyarkirin.[252]

Herwekî di nav babeta zimanî da dîsa di nav babeta nezimanî da jî ango di nav zimanê îşaretan da, dewrûber roleka dîyar ji bo dîyarkirina mebesta firêkerî dilîze, bi rêya wan livînên ku bi rêya endamên laşî (ser, dest, çav ... û hwd) derbirînê pêk dihîne, ango bê ku biaxive yan jî binivîse. Ew livîn û colandinên laşî dikevin nav hêmayên nezimanî ku bi rêya wan livîn û colandinan firêker dikare di dewrûbereka destnîşankirî û guncav da, di navbera xwe û wergirî da bi niqandina çavê xwe yan bi hejandina serê xwe li gor rêkeftina wan rabe, bi mebesta bicihanîna kiryareka terorî yan ji bo her mebesteka din be. Ev çende jî ji alîyê firêker û wergirî ve berî hingê yan jî li gor wê dewrûbera ku ew tê da, rêkeftin li ser dihê kirin. Loma zimanê îşaretan jî mil bi milê zimanê siruştî ve pişkdarîyê di kiryara pêwendîkirinê di navbera firêker û wergirî da dike.

---

(252) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ١٦٤.

PIŞKA SÊYEM

WATA DI NAVBERA SEMANTÎK Û PRAGMATÎKÊ DA

A. BOÇÛNÊN ÇEND ZIMANNASAN SEBARETÎ WÊ CUDAHÎYA DI NAVBERA SEMANTÎK Û PRAGMATÎKÊ DA

Herwekî berî niha hatîye dîyarkirin ku du astên watayî hene ew jî semantîk û pragmatîk in. Her yek ji van her du astan bi rengekê cuda ji asta din vekolînê li watayê dike. Vêca li vir em ê hewl bidin çend dîtin û boçûnên zimannasan bînin ku wan zimannasan hewl daye jevcudabûna wan her du astan û sînorê karkirina wan dîyar bikin. Bo nimûne:

1. "Finch" dibîne ku yek ji wan xalên ku semantîkê ji pragmatîkê cuda dike ew e "pragmatîk li wataya axiftinê dikole û herçî semantîk e li wataya risteyê dikole".[253] Em dikarin wataya risteyê ji wataya gotinê di van xalên jêrîn da ji hev cuda bikin:

a) Riste zincîreka peyvan e ku bi rêya rêzimana zimanî dihê encamdan û watayeka wê ya ferhengî ya bêdewrûber heye, lê belê eger riste ji alîyê kesekê dîyarkirî ve li dem û cihekê dîyarkirî hate gotin, wê demê ew riste dê bibe gotin. Ev jî çêdibe bibe eger ku ew risteya dîyarkirî watayeka din bide, bi rengekê ku ji wataya peyvên ku ew riste ji wan dirust bûye, cuda be. Ango wataya gotinê girêdayî firêker, wergir û wan pêwendîyên civakî ye yên ku di navbera wan da hene, ji alîyê hêz, vîyan, rêzgirtin ... û her pêwendîyeka din a civakî ve ku di navbera firêker û wergirî da heye. Bi watayeka din

---

(253) سەلام ناوخۆش بەکر، بڕ سال، ٤٩.

wataya gotinê bi rêya dewrûberê dihê dîyarkirin. Ev jî ji wê pêwendîya ku di navbera firêker û wergirî da heyî pêk hatîye, li gel raçavkirina dem û cih û mebesta firêkerî ji wan peyvên ku di nav wê risteya dîyarkirî da hatine bikaranîn.[254] Herwekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

Ezbenî zadî bixo.

Eger em temaşeyî vê risteya fermandan a navbirî bikin, em ê bibînin ku pileya civakî ya firêkerî ji ya wergirî kêmtir e. Lê belê eger pileya civakî ya firêkerî mezintir be ji ya wergirî, wê demê ew riste dê bibe gotin. Bi watayeka din eger axayek an maqûlek wê risteyê bibêje xulamekê xwe, hingê ew riste dê bibe gotin û dê bi tiranepêkirin wataya xwe bigihîne, ji ber ku peyva "ezbenî" di nav civaka hozayetî da ji bo mirovên xwedî pileyeka civakî ya berz dihê gotin.

b) Watayeka rasterast a risteyê heye, lê belê watayeka rasterast a gotinê nîne. Di şîyan da heye bi rêya nasîna firêkerî û pêzanînên berê yên wê nasîn û dewrûberê, ew wataya nerasterast bihê derxistin û zanîn. Herwekî di risteya "Te pare hene?" (pereyên te hene?) da dîyar dibe. Wataya rasterast a vê risteyê pirskirin e ji wergirî li ser hebûna pereyî. Lê belê wataya nerasterast a wê pirsê ew e ku firêker bi şêweyekê nerasterast û li gor dewrûberê ji wergirî dixwaze ku pereyan bidîyê.[255]

---

(254) شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٨-١٩.

(255) سالم سليمان الخماش، ١٤٢٨، ٦١.

c) Riste bi rêya wê cudahîya di navbera "ziman û axiftinê-language and parole"[256] da ji gotinê dihê cudakirin. Riste (ew pêkhatên zimanî yên aşkera ne) di nav zimanî da cih digire, lê belê gotin (ew aşkerabûnên rasteqîne ne û bicihanîn û niwandinên pragmatîkî ne ji bo risteyan) dikeve di nav alîyê axiftinê da.[257]

d) Yek riste dikare bibe çend gotin û wataya her gotinekê jî hebe.

2. "Leech û Jenny Thomas" cudahîya semantîkê ji pragmatîkê di wê çendê da dibînin ku semantîk giringîyê dide watayê wekî pêwendîyeka duqolî di navbera "form û wata"yê da, lê belê pêwendîyeka sêqolî ya pragmatîkê heye di navbera "firêker, form û wata"yê da.[258] Herwekî di vê risteyê da dîyar dibe:

Ez yê rwîs im. (ez rût im)

Eger em temaşeyî peyvên vê risteya li jor bikin, em ê bibînin ku wataya wê ya rasterast ragihandina rûtîya wî ye ku ev jî wataya ferhengî ya peyvên wê risteyê ye ku ji encama amajekirina peyvên wê risteyê ew wata bi dest ve hatîye; ev

---

[256] Ev her du têgihên "De Saussure"î "ziman û axiftin" li cem "Chomsky"î dibine "şîyan û çalakî". Têgiha "şîyan"ê beranberî têgiha "ziman"ê dihê û têgiha "çalakî"yê beranberî têgiha "axiftin"ê dihê. Ebdilqadir Ebdilcelîl, 2006, 94.

[257] محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٤، ١٤.

[258] جيفري ليش وجيني توماس، ١٤٢١، ١٨٥.

jî asta semantîkî ye. Lê belê ji alîyê şirovekirina pragmatîkî ve dema ku firêker dibêje "Ez yê rwîs im.", li vir bi şêweyekê nerasterast li gor dewrûberê, firêker ji wergirî dixwaze ku jê ra cil û bergan bîne da ku li xwe bike, ji ber ku ew rût e.

3. "Dr Şahir El-Hesen" di cudakirina semantîk û pragmatîkê da ber bi wê gavê ve diçe ku ji alîyê vekolîna watayî ve ew her du ast dibine temamkerên hevdu ku em nikarin bi yekcarî wan her du astan ji hev cuda bikin û tu pêwendîyê di navbera wan da nehêlin. Çinku dema ku semantîk vekolînê li wataya risteyê dike, di çarçoveya kêmtirîn pile da amajeyê bi dewrûberê dike, lê belê di pragmatîkê da di dewrûbereka destnîşankirî û aşkera ji salox û mebestan da vekolîn li wataya risteyê dihê kirin. Ev çende rê dide semantîk û pragmatîkê ku çareserîya watayê bikin. Wekî di "nîşankar"an da dîyar dibe û ji wan nîşankaran "hevalnav û cihnavên amajeyê û cihnavên kesî û hevalkarên dem û cihî" ne.[259] Wekî di vê risteya jêrîn da dîyar dibe:

"Tu nuke zivirî?" (tu niha zivirî?)

Ji alîyê semantîkê ve:

"Tu": Cihnava kesî ya serbixwe ye ji bo kesê duyem ê yekhejmar; çi nêr çi jî mê be.

"Niha": Hevalkara demê ye, amajeyê bi dema zivirîna wî yan wê dike.

---

[259] شاهر الحسن، ٢٠٠١، ١٦٠.

Ji alîyê pragmatîkî ve:

Pêdivîya "tu"yê bi dewrûbereka destnîşankirî û aşkera heye ku dîyar bike ka cihnava "tu"yê Azad e yan Newzad e yan Şirîn e ... û hwd.

"Niha": Pêdivîya wê bi dewrûbereka destnîşankirî û aşkera heye ku dîyar bike ka hevalkara "niha"yê sibeh e yan nîvro yan êvar e ... û hwd.

4. "Levinson" bi vî rengê li xwarê wan her du astên watayê ji hevdu cuda dike:

a) Semantîk: Ew zanist e ku vekolînê li watayê dike.

b) Pragmatîk: Ew zanist e ku vekolînê li bikaranîna zimanî dike.[260]

5. "Mihemed Mihemed Yûnis Elî" dibêje: Pêwendîyeka bihêz a wê cudahîya di navbera watayên zimanî û mebestên firêkeran da bi wê cudakirina di navbera semantîk û pragmatîkê da heye. Mebest ji watayên zimanî ew wata ne yên ku rêkeftin ji alîyê civakê ve li ser wan heye ku bi rêya peyvên zimanî û pêkhata wan ew wata dihêne fêmkirin û zanîn. Ev jî diçe di nav çarçoveya giringîpêdanên semantîkê da; ji ber ku pêdivîya dîyarkirin û aşkerakirina wan watayên zimanî bi regezên ji derveyî wê pêkhata zimanî nîne. Lê belê mebestên firêkeran berevajî wan watayên zimanî ne yên ku bi rêya peyv û pêkhatên wan bi dest ve dihên. Çinku di şîyan

---

[260] Levinson, 1997, 5.

da nîne bi wê rêyê mebestên firêkeran bihêne dîyarkirin. Ji ber ku di şîyan da heye ew mebest bi rêya zanîna wan dewrûberan bihê dîyarkirin ên ku ew axiftin di wan da dihê gotin, li gel nasîna firêker, wergir û wan şîyanên wergirî yên derencamkirinê, dema ku serederîyê li gel wê axiftinê dike, pştî ku jê ra dihê gotin.[261] Bi watayeka din semantîk ew asta watayê ye ku vekolînê li wê watayê dike berî ku bikeve di nav dewrûberê da. Lê belê Pragmatîk berevajî semantîkê vekolînê li wê watayê dike piştî ku di dewrûberê da bi dest ve dihê.[262]

Ji van boçûnên zanayên navbirî dîyar dibe ku her du astên watayê "semantîk û pragmatîk" pişkdarîyê di vekolîn, gihandin, şirovekirin û dîyarkirina watayê da dikin, "... çinku qet yek ji wan nikare bêyî ya din bibe jêdera watayê".[263]

Di vê pişka şîkarî (analîzî) da, em ê hewl bidin bi rêya wan pêzanîn û zanyarîyên ku di pişkên yekem û duyem ên teorî da amaje bi wan hatîye kirin li gel wan pêzanîn û zanyarîyên navbirî yên ku berî niha hatine behskirin, şirovekirina watayê di navbera semantîk û pragmatîkê da bi vî rengê li xwarê dîyar bikin:

---

(261) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٤، ١٥.

(262) محمد محمد يونس علي، ٢٠٠٧، ٨.

(263) عەبدلواحید موشیر دزەیی، ٢٠٠٦، ٧٦٥.

B. PABENDNEBÛNA BI DEWRÛBERÊ VE Û PABENDBÛNA BI DEWRÛBERÊ VE

1) Pabendnebûna bi dewrûberê ve:

Di asta semantîkê da em bi dewrûberê ve ne pabend in, çinku semantîk şirovekirina wataya asayî ye ku watayeka ferhengî ye û heta radeyekê ne guhêrbar e. Çinku eger em xwe bi dewrûberê ve girê bidin, wê demê dawî li wataya peyv û risteyê nahê, ev jî sînorê semantîkê derbas dike. Bo nimûne risteyeka wekî:

Xanîyê wî çendê (çiqas) bilind e.

Ev riste risteyeka ragihandinî ye ku ji encama wataya peyvên "xanî + wî + çend + bilind e" hatîye li gel karîgerîya rêzimanî ya wê û guh nade wê yekê ka ev riste ji kê ye û ji bo kê ye û di çi dem û kêlîk û dewrûberê da hatîye gotin.

2) Pabendbûna bi dewrûberê ve:

Dewrûber dikeve di nav asta pragmatîkê da, çinku ew wataya ku bi rêya dewrûberê bi dest ve dihê ji "dewrûbera zimanî + komeka regezên nezimanî" pêk dihê. Bi watayeka din, ew wataya pragmatîkî ya ku ji encama dewrûberê bi dest ve dihê, bi tenê bi rêya kartêkirina peyvên li rex û dora wê peyvê, wataya wê peyv an risteyê dîyar nabe, lê divê li gel raçavkirina wê dewrûbera zimanî, komeleka regezan li ber çavan bihê wergirtin da ku ew mijdarîya watayî ya di dewrûbera zimanî da heyî nemîne. Ew regez jî ji kesayetîya firêker û wergirî, pile û payeya wan, kesên pişkdar, seqa, rewşa

gişti ya axiftinê, pêzanînên berê û niha yên ku pêwendîya wan bi wê gotinê ve heyî, pêk hatîye, li gel raçavkirina dem, cih, kelçer, mebest, şêwaz, amajeyên dest, serî û lêvan û her regezeka din ku pêwendîya wê bi wê axiftinê ve heye.

Bo nimûne risteya navbirî, "Xanîyê wî çendê bilind e.", dema ku kesê firêker destê xwe bilind bike û wê risteyê bibêje wergirî, dê van mebestan bide:

Firêker: Xanîyê wî çendê bilind e. Nirxandin e

Wata "Xwedîyê wî çendê dewlemend e".

Wergir: Li wî pîroz be.

Dîsa her heman riste dê wataya xwe berevajî bide û dê bi tiranepêkirinê bihê, eger firêker bi çavniqandin an bi pêkanînê ve wê risteyê bibêje wergirî.

C. YEKEYÊN SEMANTÎKÎ Û YEKEYÊN PRAGMATÎKÎ

1. **"Morfema bend, peyv, fraz" û îdyem:**

- "Morfema bend û peyv û fraz":

Morfema bend û peyv û fraz yekeyên semantîkî ne; ji ber ku watayeka asayî û dîyar a van yekeyan heye û hemû takekesên civakî di wataya wan yekeyan da digihin. Ev jî dibe eger ku wataya wan yekeyan ji watayên xwedî û neasayî û taybetî dûr be û em dikarin wan yekeyên semantîkî li xwarê dîyar bikin:

Morfema bend:







Peyv:

- **Sade:**



- **Dariştî:**

Wêjevan ⟶ Ew kes e ku edeb û toreyê dinivîse. (mirov e)

Dadvan ⟶ Ew kes e ku yasayê cîbicî dike. (mirov e)

- **Lêkdayî:**

Quranxwîn ⟶ Ew kes e ku bi karê xwendina Qurana Pîroz radibe. (mirov e)

Xebatker ⟶ Ew kes e ku bergirîyê ji welatê xwe ra dike. (mirov e)

- **Fraz:**





- **Îdyem:**

Îdyem yekeyeka pragmatîkî ye; ji ber ku watayeka neasayî û kûr û nedîyar a vê yekeyê heye. Ku bi tenê bi rêya dewrûberê di şîyan da heye ku wataya wê yekeyê bihê dîyarkirin. Herwekî di van nimûneyên jêrîn da dîyar dibe:

1- Dilpîs.

Ev îdyema navbirî li gor dewrûberê bi wataya "bêbawer" dihê, lê belê dema ku dewrûber ji bikaranîna wê îdyemê bihê dûrxistin, dê bibe eger ku ew îdyem watayeka mijdar û nedîyar û neasayî bi xwe ve bigire; çinku di bingeha xwe da dilê pîs nîne.

2- Mêjîhişk.

Ev îdyema navbirî li gor dewrûberê bi wê watayê dihê ku "kesek zû fêrî tiştekî nabe". Dîsa ev îdyema han herwekî îdyema "dilpîs"ê dema ku dewrûber ji bikaranîna wê dihê dûrxistin, dibe eger ku ew îdyem watayeka neasayî bi xwe ve bigire.

3- Zimanreş.

Ev îdyema han, herwekî her du îdyemên navbirî, dema ku ji dewrûberê were dûrxistin, wê demê ew îdyem dê watayeka neasayî bi xwe ve bigire, lê belê li gor dewrûberê ew îdyem bi wataya "xeberbêj"ê dihê.

4- Destkurt.

Ev îdyema navbirî li gor dewrûberê bi wataya "bêdesthilat"ê dihê, lê belê ji derveyî dewrûberê watayeka asayî ya vê îdyemê nîne.

2. <u>Riste û gotin (coteriste):</u>

- Riste:

Riste yekeyeka semantîkî ye; çinku wataya wê bi rêya rêzkirina peyvan li gor yasayên rêzimanî bi dest ve dihê. Ji ber ku riste dewrûberê li ber çavan wernagire, ji watayeka zelal, asayî û rasterast pêk dihê; ev çende jî dibe eger ku hemû takekesên civakê di wataya risteyê da bigihin.

- Gotin (coteriste):

Gotin an coteriste yekeyeka pragmatîkî ye; ji ber ku gotin risteyek e ku di dewrûbereka dîyarkirî da bi kar hatîye. Ev çende jî dibe eger ku gotin hilgira watayeka taybet, nerasterast, neasayî û veşartî be, herwiha di şîyan da nîne ku hemû takekesên civakê di wataya wê da bigihin. Vêca li vir li gor dewrûberên jevcuda, reng e ku yek riste çend watayan bide û her watayek ji wan watayên ku riste dide, dibe gotinek.

Bi watayeka din, wataya gotinê ew cureyê watayê ye yê ku li gor dewrûberê ji wataya risteyê dihê derencamkirin û zanîn, vêca ew gotin a ku ji risteyê peyda dibe di kîjan biwara pragmatîkê da be bila bibe; wekî "nîşankar, kirdeyên axiftinê, derkevteyên axiftinê û girîmanên pêşîyê". Em dikarin wan her du yekeyên semantîkî û pragmatîkî "riste û gotin" bi rêya van nimûneyên li xwarê ji hevdu cuda bikin:

1- Min tu gava din li wêrê (wir) dîtî.

Di risteyê da nîşankar li ber çavan nahê wergirtin ku dîyar bike ew dem û cih û kes kî ne; ji ber vê yekê mijdarî di risteya navbirî da peyda dibe. Lê belê eger ev risteya navbirî di dewrûbereka dîyarkirî da hate bikaranîn, wê demê ew riste dê bibe gotin û çêdibe ku ew riste li gor dewrûberên jevcuda bibe çend gotin û watayeka dîyarkirî ya taybet a her gotinekê hebe. Bi vî rengî em dikarin van gotinên li xwarê li gor dewrûberê ji wê risteya navbirî derxin:

Gotina yekem:

Nîşankarên kesî "min, tu": Nazdar, Awaz.

Nîşankara demê "gava din": Şev.

Nîşankara cihî "li wir": Dihok.

Gotina duyem:

Nîşankarên kesî "min, tu": Azad, Newzad.

Nîşankara demê "gava din": Demjimêr 3yê êvarî.

Nîşankara cihî "li wir": Zaxo.

Gotina sêyem:

Nîşankarên kesî "min, tu": Azad, Şirîn.

Nîşankara demê "gava din": Nîvro.

Nîşankara cihî "li wir": Sêmêl.

Gotina çarem:

Nîşankarên kesî "min, tu": Azad, Ciwan.

Nîşankara demê "gava din": Sibehê.

Nîşankara cihî "li wir": Hewlêr.

Gotina pêncem:

Nîşankarên kesî "min, tu": Behzad, Şêrdil.

Nîşankara demê "gava din": Mexreb.

Nîşankara cihî "li wir": Silêmanî.

Gotina şeşem:

Nîşankarên kesî "min, tu": Dîlan, Mihabad.

Nîşankara demê "gava din": Berî demjimêrekê.

Nîşankara cihî "li wir": Kerkûk.

... û hwd.

Ev gotinên navbirî ango "gotina yekem", "gotina duyem" ... û hwd bi rêya şirovekirina "nîşankaran" ji risteya "Min tu gava din li wêrê dîtî." ra hatin derxistin.

2- Wî marek di mala wan da dît.

Ew risteya navbirî hilgira watayeka asayî û zelal e ku ew jî ragihandin e li ser dîtina wî ji marî ra di mala wan da. Lê belê dema ku ew riste dikeve di nav dewrûberê da, wê demê ew riste dê bibe gotin û dikare bi rêya awazeyê çend watayên veşartî bi xwe ve bigire û her watayek ji wan watayên veşartî li gor wê dewrûbera ku tê da bi kar dihê, dê bibe gotinek. Herwekî çêdibe ku li gor dewrûberê bibe:

a- Pirsyar.

b- Hêbetî.

c- Amojgarî.

d- Hoşdarî (haydarkirin).

... û hwd.

Ev gotinên navbirî ango "pirsyar", "hêbetî", "amojgarî" ... û hwd bi rêya şirovekirina "kirdeyên axiftinê" ji risteya "Wî marek di mala wan da dît." ra bi dest ve hatine.

3- Serê min diêşe.

Watayeka rasterast û asayî ya risteya navbirî heye. Lê belê dema ku ew riste dikeve di nav dewrûberê da, wê demê ew yekeya semantîkî dê bibe yekeyeka pragmatîkî û li gor dewrûberên jevcuda dikare çend watayan bi xwe ve bigire ku her watayek ji wan watayan, dê bibe gotinek. Ew wata jî ev in:

a) Gelekî neaxive.

b) Min bibine nexweşxaneyê.

c) Ez îro nikarim bême dibistanê.

d) De em biçin malê.

e) Televizyonê vemirîne.

f) Parasîtol li cem te hene?

... û hwd.

Gotinên "a) Gelekî neaxive.", "b) Min bibe nexweşxaneyê." ... û hwd ji risteya "Serê min diêşe." bi dest ve hatine; ew jî bi rêya şirovekirina "derkevteyên axiftinê".

4- Rezê we hişk bûye.

Ev riste jî herwekî risteya borî xwedî watayeka asayî û rasterast e, lê belê dema ku ew riste di dewrûberan da bi kar bihê, dê çend gotin jê peyda bibin. Wekî:

a) Hûn naçine avdana wî rezî.

b) Ez hez dikim hûn biçine avdanê.

c) Berî niha rezê we ne hişk bû.

d) We ew rez bi pişt guh ve avêtîye.

e) Jîyana mala we li ser wî rezî ye.

... û hwd.

Gotinên "a) Hûn naçine avdana wî rezî.", "b) Ez hez dikim hûn biçine avdanê." ... û hwd bi rêya şirovekirina "girîmanên pêşîyê" ji risteya "Rezê we hişk bûye." bi dest ve hatine.

3. Deq û gotar:

- Deq:

Deq yekeyeka semantîkî ye; ji ber ku wataya peyv û risteyan tê da bi rêya peyv û risteyên din ên wê deqê bi dest ve dihê. Ev çende dibe eger ku ew peyv û riste hemû bi hev ra wekî yekeyeka watayî serederî di gel wan bihê kirin û bi navê deqê bihê binavkirin. Lê belê ya giring di nav deqê da ew e ku dewrûber li ber çavan nahê wergirtin, ev çende dibe eger ku kes, dem û cih, rewş û mebestên tê da heyî bihêne feramoşkirin (piştguhkirin).

- Gotar:

Gotar yekeyeka pragmatîkî ye; ji ber ku gotar deqek e ku di dewrûbereka dîyarkirî da bi kar hatîye. Ev çende dibe eger ku gotar ji pêkhata deqê zêdetir mebest, rewş û regezên nezimanî jî li ber çavan wergire.

Li vir em ê hewl bidin bi rêya vê nûçeya li xwarê wan her du yekeyên semantîkî û pragmatîkî "deq û gotar" ji hevdu cuda bikin:

"Evro Serokê Hikumeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi serokayetîya şandekî gehişte Bexda û li ber e gengeşê li ser çend pirsên di navbera Hewlêr û Bexda da li gel Serokwezîrên Iraqa Fîdral Nûrî Malikî û berpirsên din ên Iraqê biket.

Di çarçovê seredana xwe da bo Bexda Serokê Hikumeta Herêma Kurdistanê dê pirsa qanûna petrol û gazê û girêbestên petrola hikumeta herêmê û çend pirsên din ên qanûnî di navbera Hewlêr û Bexda da gengeşe ket."[264]

(îro Serokê Hikûmeta herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi serokayetîya şandeyekê gihîşte Bexdayê û dê gengeşeyê li ser çend pirsên di navbera Hewlêr û Bexdayê da li gel Serokwezîrê Iraqa Fedral Nûrî Malikî û berpirsên din ên Iraqê bike.

Di çarçoveya seredana xwe ji bo Bexdayê da Serokê Hikûmeta herêma Kurdistanê dê pirsa qanûna petrol û gazê û girêbestên petrola hikûmeta herêmê û çend pirsên din ên qanûnî di navbera Hewlêr û Bexdayê da gengeşe bike).

Ev nûçeya navbirî dibe deq eger semantîk wê şirove bike û şirovekirina wê dê bi vî rengê li xwarê be:

Îro Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê "Nêçîrvan Barzanî" bi serokayetîya şandeyekê gihîşte Bexdayê, ji bo kombûna li gel "Nûrî Malikî" Serokê Encumena Wezîrên Iraqê û berpirsên din, ji bo çareserkirina kêşeyên girêbestên petrolê û yasayên petrol û gazê di navbera hikûmeta herêmê û hikûmeta navendî ya Iraqê da.

Her ev nûçe dibe gotar jî eger em wê ji alîyê pragmatîkê ve şirove bikin û şirovekirina wê dê bi vî rengî be:

---

(264) Televizyona Dihokê, 21.06.2008.

1. Hikûmetek bi navê "Iraq"ê heye paytexta wê "Bexda" ye û navê Serokwezîrê wê "Nûrî Malikî" ye. Herêmeka fedral jî bi navê "herêma Kurdistanê" heye û paytexta wê "Hewlêr" e û Serokwezîrê wê "Nêçîrvan Barzanî" ye.

2. Kêşeya girêbestên petrol û gazê di navbera hikûmeta herêma Kurdistanê û hikûmeta Bexdayê da heye û "Nêçîrvan Barzanî" li gel çend kesên pispor ji bo çareserkirina vê kêşeyê çûye.

3. "Nêçîrvan Barzanî" di demjimêr "..." da li roja înîyê li gel şandeyekê çû firokxaneyê û li wir li firokeyeka taybet siwar bû û ji esmanê Hewlêrê derbas bû û di demjimêr "..." gihîşte Bexdayê û li wir jî ji alîyê çend berpirsan ve hate pêşwazîkirin û hemû bi hev ra ji bo cihê mebestdar çûn.

4. Hikûmeta Iraqê kêşeyan ji hikûmeta herêmê ra çêdike û karekê neasayî dike, çinku li gor yasayê hikûmeta herêmê, mafê kurdan ê îmzakirina girêbestan heye û hikûmeta herêmê razî nabe ku pişêlkarîya (binpêkirin) yasayî bihê kirin, lê divê kêşeyan bi rêya gotûbêj û danûstandinê çareser bike.

5. "Nêçîrvan Barzanî" ne li Kurdistanê ye û çûye Bexdayê û li wir dê çend rojan bimîne.

6. "Nêçîrvan Barzanî" li gel şandeyekê dê li gel berpirsên kurd li Bexdayê kom bibe û dê bîrûrayan (raman û nerîn) di navbera xwe da alûgor bikin.

7. Çûna "Nêçîrvan Barzanî" ji bo çareserkirina kêşeyan bû, ne ku ji bo dîtina "Receb Teyb Erdogan"î bû herwekî hin medyayên nehez ew çûn bi wî rengî rave kir.

8. Ev nûçe bi zarê kurmancî di "Televizyona Dihok"ê da ji alîyê bêjer "Befrîn Selman Mihemed Tahir" ve hatîye xwendin û ji bo bîneran hatîye ragihandin.

9. Ew kesên ku dixwazin seredana Encumena Wezîran li Hewlêrê bikin, dema ku vê nûçeyê bibihîzin, dê seredana xwe bi paş bixin heta dema vegera serokê wezîran.

... û hwd.

D. ŞÎYANA ZIMANÎ Û ÇALAKÎYA AXIFTINÊ

1. **Şîyana zimanî:**

Pêwendîya şîyana zimanî bi asta semantîkê ve heye; ji ber ku ev têgiha han wan yasa û destûrên zimanî bi xwe ve digire yên ku di nav mêjîyê takekesên zimanekê dîyarkirî da parastî ne ku ji yasa û destûrên fonolojî û rêzimanî û watayî pêk hatine. Bi rêya wan yasa û destûran axiverên her zimanekî dikarin hejmareka bêsînor ji risteyên rêzimanî û pesend berhem bînin ku hemû takekesên wê civakê di wataya wan risteyan da bigihin.

2. **Çalakîya axiftinê:**

Çalakîya axiftinê karê pragmatîkê ye; çinku bi rêya vê têgihê wergir dikare watayeka guncav ji risteyên nepesend û nawêze ra bibîne, ew jî dema ku xwe bi wê dewrûberê ve girê bide ya ku firêker wan risteyan tê da dibêje ku bi rêya wê dewrûberê wergir dikare di mebesta firêkerî da bigihe.

Li vir em ê hewl bidin van nimûneyên li xwarê ji alîyê şîyana zimanî û çalakîya axiftinê ve şirove bikin:

1- Dîwarî Azad kujt.

Ev risteya navbirî ji alîyê "şîyana zimanî" ve risteyeka nawêze û nepesend e. Lê belê wergir bi rêya çalakîya axiftinê dikare di mebesta firêkerî da bigihe û watayeka guncav ji wê risteyê ra bibîne. Herwekî dîwar bi ser Azadî da heriftibe û ji encama wê heriftinê Azad miribe.

2- Ewî zelamî çar pê hebun. (çar pêyên wî zilamî hebûn.)

Ev riste herwekî risteya jimar "1" risteyeka nawêze ye; çinku tu zilamên çarpê nînin, ji ber vê yekê şîyana zimanî nikare wê risteyê şirove bike. Ev çende jî dibe eger ku wergir bi rêya çalakîya axiftinê di mebesta firêkerî da bigihe û watayeka guncav ji bo wê risteyê bibîne. Ew jî eger ew zilam gelekî bilez û xêra (سريع) be.

3- Wî kurî sê dayikên heyîn. (sê dayikên wî kurî hene.)

Ev riste herwekî wan risteyên navbirî ji alîyê şîyana zimanî ve risteyeka nepesend û nawêze ye; çinku wekî em dizanin bi tenê yek dayika her kesekî heye, ji ber vê yekê şîyana zimanî neçar dibe ku wê risteyê bide çalakîyê û wergir li vir dizane ku ew gotin li gel dewrûberê nagunce, çinku li vir pêzanînên kesî û dewrûber ji bo şirovekirina vê risteyê divên; ew jî eger sê jinên bavê wî kurî hebin.

4- Ber bi rê ve çû.

Ev riste jî herwekî risteyên din ên borî ne ji alîyê "şîyana zimanî" ve, risteyeka nawêze û nepesend e; çinku wekî aşkera ye ber nikare bi rê ve biçe, lê belê wergir bi rêya çalakîya axiftinê û wê dewrûbera ku ew riste tê da hatîye gotin, dikare watayeka guncav bide wê risteyê; ew jî dema ku firêker ji bo mebesteka dîyarkirî peyva "ber"ê bi kar bîne, herwekî mebesta wî peyva "ber"ê di wê risteyê da "mirov" be yan her tiştekê din be.

5- Ew kur beraz e.

6- Pên wan biçav in. (pêyên wan biçav in)

7- Wê kiçê sê çavên heyîn. (sê çavên wê keçê hene.)

8- Maleka çavvekirî ye.

Risteyên jimar "5", "6", "7" û "8" herwekî risteyên din ên borî, risteyên nawêze ne. Ev çende dibe eger ku "şîyana zimanî" neçar bibe ku şirovekirina wan risteyan bide alîyê "çalakîya axiftinê". Li vir wergir dê bizane ku ew riste

risteyinên neguncav û nepesend in. Ev jî wî neçar dike heta ku bikare mebesta firêkerî dîyar bike, xwe bi axiftina kesî ve girê bide li gor wê dewrûbera ku ew riste tê da hatine gotin.

Hêjayî amajepêkirinê ye em bibêjin ku şîyana zimanî nikare piranîya gotinên mezinan şirove bike; ji ber ku ew gotin ji alîyê wataya semantîkî ve nawêze û nepesend in. Lê belê wergir dikare bi rêya çalakîya axiftinê di mebesta firêkerî da bigihe û watayeka guncav ji bo wan gotinan bibîne. Herwekî di van nimûneyên jêrîn da dîyar dibe:

1- Dîwar biguh in.[265]

Ev gotina han li gor dewrûberê bi wê watayê dihê ku divê mirov ageh ji derdora xwe hebe û hemû axiftinan nebêje.

2- Axiftinên mezinan nexşê li berî ne.[266]

Ev gotina han li gor dewrûberê bi wê watayê dihê ku axiftinên ku mezinan gotine, di cihê xwe da ne.

3- Dunî ji kêçê çê dike.[267]

Ev gotina han li gor dewrûberê bi wataya temaî û çikûsîyê dihê.

---

[265] حەجی جەعفەر، ١٩٨٦، ٥١.

[266] Jêdera berê, 12.

[267] حەجی جەعفەر، ٢٠٠٦، ٧٥.

E. GIRINGÎNEDANA BI NÎŞANKARAN Û GIRINGÎDANA BI NÎŞANKARAN

1. **Giringînedana bi nîşankaran:**

Giringînedana bi nîşankaran erka semantîkê ye; ji ber ku di vê asta watayê da amaje bi wataya hêmayan dihê kirin, bê ku dewrûbera ku ew hêma tê da dihên gotin li ber çavan bihê wergirtin, ev jî dibe eger ku ew nîşankarên dem, cih, kesî û civakî yên ku di vê asta watayê da bi kar dihên, mijdarîyê bi xwe ve bigirin û çend watayan hilgirin.

2. **Giringîdana bi nîşankaran:**

Giringîdana bi nîşankaran karê pragmatîkê ye; ji ber ku di vê asta watayê da dewrûber li ber çavan dihê wergirtin. Ev çende jî dibe eger ku mijdarî di wan nîşankaran da nemîne.

Ji bo ku bêhtir ew nîşankarên dem, cih, kesî û civakî û çawanîya serederîkirina asta semantîk û pragmatîkê li gel wan nîşankaran were dîyarkirin, em ê hewl bidin çend nimûneyan wergirin. Wekî:

1- Mamostayî wane got.

Dema ku ev risteya navbirî ji alîyê semantîkê ve dihê şirovekirin, mijdarî di nîşankara civakî, mamosta, da peyda dibe, çinku di vê asta watayî da mirov nikare destnîşan bike ka ew mamosta kî ye, ji ber ku ev asta han dewrûberê li ber çavan wernagire. Lê belê dema ku ew riste ji alîyê pragmatîkê ve were şirovekirin, wê demê ew mijdarîya di wê risteyê da

heyî namîne; çinku ew dewrûbera ku di navbera hevpişkên axiftinê da heyî, aşkera dike ka ew mamosta kî ye û mamostayê kîjan waneyê ye.

2- Azad li vêrê (vir) bû.

Di risteya jorîn da eger ew riste ji alîyê semantîkê ve hate şirovekirin, nîşankara cihî "li vir" nahê destnîşankirin ka kîjan cih e; ji ber ku di semantîkê da dewrûber li ber çavan nahê wergirtin. Ev çende jî dibe eger ku semantîk giringîyê nede nîşankaran û jê ra ne giring be bizane ka "li vir" kîjan cih e. Lê belê heta ku bihê zanîn ka "li vir" pirtûkxane ye yan nexweşxane ye yan mal e yan her cihekê din e, divê ew riste ji alîyê pragmatîkê ve bihê şirovekirin, ji ber ku pragmatîk giringîyê dide nîşankaran, ew jî bi rêya dewrûbera ku ew nîşankar tê da hatîye gotin. Vêca eger ew riste li pirtûkxaneyê bihê gotin, wê demê "li vir" dê bibe pirtûkxane, lê belê eger ew riste li nexweşxaneyê bihê gotin, wê demê ew cih dê bibe nexweşxane ...

3- Me xanî ava kir.

Ev risteya navbirî, dema ku ji alîyê semantîkê ve dihê şirovekirin, mijdarî di nîşankara kesî "me" da peyda dibe; ji ber ku semantîk giringîyê nade nîşankaran. Vêca heta ku bihê zanîn ka "me", "Azad û Newzad" in an "Şirîn û Dîlan" in an "Azad, Şirîn û Hêriş" in, divê ew riste ji alîyê pragmatîkî ve bihê şirovekirin. Ev jî bê guman pêdivîya wê bi dewrûbereka dîyarkirî heye, heta wan kesan dîyar bike.

4- Subehî (sibe) xanî dê hête (were) avakirin.

Nîşankara demê "sibe" di risteya navbirî da herwekî nîşankarên civakî û cihî û kesî, dema ku ji alîyê semantîkê ve dihê şirovekirin, mijdarîyê bi xwe ve digire; ji ber ku semantîk dewrûberê li ber çavan wernagire, da ku em bizanin "sibe" kîjan roj e. Lê belê ji alîyê şirovekirina pragmatîkê ve mirov dikare binase ka ew roj şemî ye yan yekşem e yan rojeka din e. Vêca eger ew riste di roja înîyê da bihê gotin, wê demê nîşankara demê dê bibe şemî, lê belê eger di şemîyê da ew riste were gotin, wê demê sibe dê bibe yekşem ...

F. BICIHANÎNA BINEMAYÊ ALÎKARÎYÊ Û DERBASKIRINA WÎ BINEMAYÎ

1. Bicihanîna binemayê alîkarîyê:

Têkilîya bicihanîna binemayê alîkarîyê bi her çar cureyên wî ve "çendêtî, çawayî, pêwendî û şêwazî", bi asta semantîkê ve heye. Ji ber ku dema firêker an wergir pêgirîyê bi bicihanîna vî binemayî dike, ji çarçoveya wataya ferhengî û asayî ya peyvan dernakeve:

a. Binemayê çendêtîyê:

Heta ku ev binemayê han were bicihanîn, divê tibaba gotinê ne kêm û zêde be, herwisa ji bo wê tibaba daxwazkirî bimifa be. Herwekî di bersivandina van her du risteyên jêrîn da dîyar dibe:

a- **Firêker:** Te çend kur hene?

Wergir: Du

b- **Firêker:** Azadî xwend û nivist?

Wergir: Belê.

b. Binemayê çawayî:

Eger ew gotina ku dihê arastekirin ne rast û belgedar be, binemayê çawayî nahê bicihanîn. Wekî di bersivandina van her sê risteyên jêrîn da dîyar dibe:

a- **Firêker:** Bejna wê kiçê ya çewa ye?

Wergir: Bejna wê ya bilind e.

b- **Firêker:** Azad di şerî da yê çewa bû?

Wergir: Yê zîrek bû.

c- **Firêker:** Rewşa Iraqê nuke yê çewa ye?

Wergir: Yê xweş nîne. (ne xweş e).

c. Binemayê pêwendîyê:

Ev binemayê han wê demê bi cih dihê, dema ku pişkdarî di gotinê da bi wê pêdivîyê ra pêwendîdar û guncav be. Herwekî di bersivandina van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

a- **Firêker:** Tu li gel babê xwe diaxivî?

Wergir: Ew li gel min naaxivît.

b- **Firêker:** Tu bo çî naçîye qutabxanê?

Wergir: Heta Azad bihêt.

Ew watayên ku ji encama bersivandinên her du risteyên navbirî bi dest ve hatin, li gor wan dewrûberên ku ew her du risteyên navbirî tê da hatine gotin, bi pirsên firêkerî ra pêwendîdar û guncav in.

d. Binemayê şêwazî:

Heta ku ev binemayê han were bicihanîn, divê firêker an wergir:

1. Xwe ji mijdarîya derbirînê dûr bixe:

a- **Firêker:** Azad kî ve (bi ku ve) çûye?

Wergir: Çû qutabxanê.

Di vê risteya jorîn da wergirî binemayê şêwazî bi cih anîye; ji ber ku tu mijdarî di bersiva wî da nîne.

2. Xwe ji neaşkerayîya derbirînê dûr bixe:

a- **Firêker:** Ew rêveber çewa serederîyê li gel xelkî diket?

Wergir: Gelek rêzê li xelkî digirît.

Di vê risteya jorîn da wergirî binemayê şêwazî bi cih anîye; ji ber ku bi aşkerayî bersiva firêkerî daye.

3. Xwe ji dirêjbirîya derbirînê dûr bixe:

a- **Firêker**: Wî biraderî duhî çi gote hewe?

Wergir: Simînarek.

Di vê risteya jorîn da bersiva wergirî ji dirêjbirîyê dûr e ku bi kurtî bersiva firêkerî daye.

4. Xwe ji rêkûpêkîya derbirînê dûr nexe:

a- **Firêker**: Kengî Perlemanê Kurdistanê hatîye damezrandin?

Wergir: Li nuzdeyî pênc (di nozdehê meha pêncan da), li sala hezar û neh sed û not û diwê.

Di vê risteya jorîn da wergirî binemayê şêwazî bi cih anîye; ji ber ku wî bi rêk û pêkî bersiva firêkerî daye.

2. Derbaskirina binemayê alîkarîyê:

Pêwendîya derbaskirin û ladana binemayê alîkarîyê bi asta pragmatîkê ve heye; ji ber ku ew wataya ku ji encama wê derbaskirinê bi dest ve dihê, hilgira watayeka neasayî û neferhengî û taybetî ye. Ev jî ji encama wê kêm û zêdehî, bêbelgeyî, neguncan, çewtî û wê dirêjbirîya di nav axiftinê da peyda dibe, bi dest ve dihê. Vêca li vir bi rêya wê dewrûbera ku di navbera hevpişkên axiftinê da heyî, mirov dikare wan watayên nerasterast, neasayî û neaşkera, aşkera bike û wan mebestan dîyar bike.

Hêjayî dîyarkirinê ye em bibêjin ku ew kêm û zêdehî, bêbelgeyî, neguncan, çewtî ku di nav axiftinê da rûdidin, çi ji alîyê firêkerî ve be yan ji alîyê wergirî ve be, li wê çendê vedigerin ku herdem nikarin axiftina xwe bi şêweyekê zelal, dirust û bibelge derbirin ango binemayê alîkarîyê bi cih bînin. Ev çende dibe eger ku ew neçar bibe wî binemayî bide alî. Herwekî di dûrxistin û derbaskirina wataya van binemayan da dîyar dibe:

a. Derbaskirina binemayê çendêtîyê:

Binemayê çendêtîyê wê demê dihê derbaskirin, dema ku kêm û zêdehî dikeve di tibaba gotinê da, herwisa dema ku ew pişkdarîya ku di axiftinê da dihê kirin ji bo bireya daxwazkirî ne bimifa be. Herwekî di bersivdana van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

a- **Firêker:** Te çend kur hene?

Wergir: Komek in.

Di bersivdana vê risteya jorîn da wergirî binemayê çendêtîyê derbas kirîye; ji ber ku kêm û zêdehî di bersiva wî da heye. Çinku çêdibe ku peyva "komek" "5" be û çêdibe ku "10" be û ... hwd.

b- **Firêker:** Azadî xwandin û nivist? (Azadî xwend û nivist?)

Wergir: Azad nivist.

Wergirî di vê risteya jorîn da binemayê çendêtîyê derbas kirîye; ji ber ku firêkerî du pirs jê kirine û wî bi tenê bersiva pirsekê daye û behsa "xwendin"ê nekirîye. Ev çende dibe eger ku firêker tê bigihe ku Azadî nexwendîye.

b. Derbaskirina binemayê çawayîyê:

Herwekî berî niha hatîye gotin, ev binemayê han ango binemayê çawayîyê heta ku bihê bicihanîn, divê ew axiftina ku ji alîyê firêkerî ve yan ji alîyê wergirî ve dihê gotin rast û belgedar be. Lê belê eger ev her du taybetmendî di nav axiftinê da neman, wê demê ew binema dê bihê derbaskirin. Herwekî çawa derbaskirina vî binemayî di bersivdana van risteyên jêrîn da dîyar dibe:

a- **Firêker:** Bejna wê kiçê ya çewa ye?

Wergir: Ji dara spîndarê bilindtir e.

Di vê risteya navbirî da wergirî binemayê çawayîyê derbas kirîye; ji ber ku tu keç nîne bejna wê ji dara spîndarê bilindtir be. Lê belê ji ber bilindîya wê keçê, wergirî bi zêdebêjî hestê xwe derbirandîye û bejna wê keçê ji dara spîndarê bilindtir kirîye ku di bingeha xwe da bejna tu keçê ji dara spîndarê ne bilindtir e.

b- **Firêker:** Azad di şerî da yê çewa bû?

Wergir: Şêr bû.

Li vir wergirî binemayê çawayîyê derbas kirîye, ji ber ku wergirî "Azad" bi "şêr"î mînandîye. Herwiha eger wergir bi ken wê bersivê bibêje yan jî bi gotina wê ra çavê xwe bineqîne yan jî eger dirêjepêdan di derbirînê da hebe, ew bersiv dê wataya xwe bi tiranepêkirin bigihîne.

c- **Firêker**: Rewşa Iraqê nuke yê çewa ye?

Wergir: Agir lê dibarît.

Wergirî di bersivdana vê risteya navbirî da herwekî her du risteyên borî binemayê çawayîyê derbas kirîye; ji ber ku zêdebêjî di bersivdana wî da heye.

c. Derbaskirina binemayê pêwendîyê:

Binemayê pêwendîyê wê demê dihê derbaskirin, dema ku pişkdarîya di gotinê da li gel pêdivîya daxwazkirî ne pêwendîdar û guncav be. Wekî di bersivdana van risteyên jêrîn da dîyar dibe.

a- **Firêker**: Tu li gel babê xwe diaxivî?

Wergir: Bi xatira te, jivanê min bi ser ve çû.

Di vê risteya jorîn da wergirî binemayê pêwendîyê derbas kirîye; ji ber ku bersiva wî ne guncav e ji bo wê pirsa ku jê hatîye kirin. Lê belê firêker dê tê bigihe ku ew naxwaze wê babetê veke û bersiva wê pirsê bide. Ev jî dê bibe eger ku firêker wisa tê bigihe ku hê jî ew bi bavê xwe ra neaxiftîye.

b- **Firêker**: Tu bo çî naçîye qutabxanê?

Wergir: Em kengî biçîne bazarê?

Di vê risteya jorîn da wergirî binemayê pêwendîyê derbas kirîye; ji ber ku firêkerî pirsa sedema neçûna dibistanê ji wergirî kirîye û divîya wergirî bersiveka guncav bigota, lê li vir wergirî bersiveka neguncav gotîye, lê belê firêker dê tê bigihe ku wergirî navê behsa wê babetê bike.

d. Derbaskirina binemayê şêwazî:

Ev binemayê han wê demê dihê derbaskirin:

1. Dema ku mijdarî di gotinê da hebe:

a- **Firêker**: Azad kî ve çû?

Wergir: Çu şîrî bînît.

Di vê risteya navbirî da wergirî binemayê şêwazî derbas kirîye; ji ber ku mijdarî di bersiva wî da heye. Çinku wergirî dîyar nekirîye ka "Azad" çûye "şîrê vexwarinê" bîne yan çûye "şemşîr"î (şûr) bîne.

2. Dema ku gotin bi aşkerayî nehatibe derbirîn:

a- **Firêker**: Ew rêveber çewa serederîyê li gel xelkî diket?

Wergir: Bi difnê li gel xelkê diaxivît.

Li vir wergirî binemayê şêwazî derbas kirîye; ji ber ku wergirî bi aşkerayî bersiva firêkerî nedaye û negotîye ku serederîya wî rêveberî li gel xelkî ne baş e.

3. Dema ku dirêjbirî di gotinê da bibe:

a- **Firêker:** Ewî kabrayî (biraderî) duhî çi digote hewe?

Wergir: Simînarek li ser tîrorê gote me, mûyên serê me rabûn.

Di vê risteya navbirî da wergirî binemayê şêwazî derbas kirîye; ji ber ku wergirî karîbû di bersivdana firêkerî da bi tenê bigota "simînarek" an "simînarek li ser tîrorê", lê belê ew dirêjbirî bûye eger ku dûrxistin di wî binemayî da peyda bibe, çinku mû şipê (jipêya) ranabin.

4. Dema ku gotin ne bi rêk û pêk be:

a- **Firêker:** Kengî Perlemanê Kurdistanê hatîye damezrandin?

b- **Wergir:** Li heyva pêncan li nozdê, li sala hizar û neh sed û not û du.

Ev gotina navbirî ne bi rêk û pêk e, lê belê firêker bi rêya dewrûberê dikare di mebesta wergirî da bigihe.

G. XWENDINA HÊMAYÊ Û XWENDINA MÊJÎYÎ

Ji ber ku di kiryara gihandina watayê da, her car wataya ku hatîye derbirîn li dev wergirî rasterast nabe; ji ber vê yekê her du zana "Clark û Lucy" di vê biwarê da dibêjin, heta ku wergir bikare di wataya rasterast da bigihe, divê sê qonaxan li ber çavan wergire:

Qonaxa yekem: Destnîşankirina wataya ku hatîye derbirîn bi rêya wê pêkhata sade ya watayên wan peyvan.

Qonaxa duyem: Berawerdkirina wê wataya derbirî li gel wê dewrûbera ku ew wata tê da hatîye gotin da bizane ka ew wataya ku ew tê da digihe, ew wataya mebestdar e yan na.

Qonaxa sêyem: Eger wergirî dît ew wataya ku hatîye derbirîn li gel dewrûberê negunce, wê demê wergir dê alîkarîyê ji hin zanyarîyên kesî û kultûrî û dewrûberî bixwaze, da ku wê wataya nerasterast an mebestdar destnîşan bike û bizane.[268]

1. Xwendina hêmayê:

Pêwendîya xwendina hêmayê bi qonaxa yekem ve heye ku karê semantîkê ye; ji ber ku di vê qonaxê da dema ku firêker bi arastekirina babeteka dîyarkirî radibe, wergir bi hêsanî û bê ku hîç giranî û zehmetîyê bibîne di mebesta wî da digihe. Ji ber ku li vir firêker ji çarçoveya wataya ferhengî ya hêmayan dernakeve, ev jî dibe egera wê yekê dema ku wergir bi xwendina hêmayan di nav babeta arastekirî da radibe yekser di wan hêmayan da digihe.

2. Xwendina mêjîyî

Xwendina mêjîyî karê pragmatîkê ye ku ew jî ji qonaxa duyem dest pê dike heta ku digihe qonaxa sêyem. Çinku dema wergir dibîne ku ew wataya derbirî û ew dewrûbera ku ew axiftin tê da hatîye gotin, bi hevdu ra naguncin, neçar dibe

---

(268) جمعه سيد يوسف، ١٩٩٠، ١٢٨.

mêjîyê firêkerî bixwîne; da ku bizane ka firêkerî ew hêma ji bo çi wata û mebestê bi kar anîye. Ev jî bi alîkarîya zanyarîyên wî yên kesî û kultûrî û dewrûberî dihê bicihanîn. Herwekî di van her du nimûneyên jêrîn da dîyar dibe:

a- 1- Azad li ser şûlî (karî) yê çewa ye?

2- Yê nivistî ye.

3-(Digirnijît).

Di vê deqa bikarhatî da, divê mêjîyê firêkerî bihê xwendin, da ku bihê zanîn ka mebest çi ye. Çinku ew wata bi rêya hêmayan nahê şirovekirin, ji ber ku kesê sêyem "digirnije" ango dewrûber ne "şev" e, ji ber ku tiştê asayî ew e ku nivistin bi şevê be. Ev çende dibe eger ku dewrûber ne asayî be û ev neasayîya dewrûberê di wê çendê da ye ku karê nivistina li ser karî û gêjatî pêk ve dihên. Ango hemû sîfetên gêjatî û hayjixweneyîyê daye pal "Azad"î, li vir girnijîna kesê sêyem asayî dibe.

b- 1-Babê wî çi karî diket?

2-Cadan dipîvît.

3-(Dikene).

Ew deqa han wekî deqa berî niha, divê mêjîyê firêkerî bihê xwendin da ku bihê zanîn ka mebest çi ye. Çinku ew wata bi rêya hêmayan nahêne şirovekirin, ji ber ku kesê sêyem "dikene", ango dewrûber neasayî ye, çinku bavê wî ne rêpîver e heta ku dewrûber asayî be. Ev çende jî ji pêkenîna kesê sêyem

dîyar dibe. Ji ber ku eger karê bavê wî rêpîverî bûya, wê demê karê pîvana cadan dê asayî bûya û kesê sêyem jî nedikenîya. Ango hemû sîfetên bêkarî û tembelî û betalîyê daye pal bavê wî, li vir pêkenîna kesê sêyem asayî dibe.

H. WATAYA FERHENGÎ Û WATAYA MEBESTDAR

1. Wataya ferhengî:

Pêwendîya wataya ferhengî bi asta semantîkê ve heye; ji ber ku ew wataya gîştî û berbelav a peyvê di ferhengê da, hemû takekesên civakê tê digihin. Herwekî em bibêjin "keç" yekser dê wêneyê keçekê di mêjîyê wergirî da dirust bibe yan bibêjin "gul" kesê beranber dê tê bigihe em behsa riwekekê dikin. Herwisa dema ku behsa "rovî"yî dihê kirin, hizira kesê beranber ji bo gîyanewerê rovî diçe. Herwiha dema ku amaje bi peyva "dîwar"ê dihê kirin, wêneyê dîwarê xanî yan dibistanekê di mêjîyê kesê beranber da dirust dibe.

Ev rêkeftina civakî li ser watayên wan peyvên ferhengî yên navbirî li wê yekê vedigere ku ew peyv hilgirên çend sîmayên cudaker in ku bi rêya wan sîmayên cudaker takekesên civakê di wataya wan peyvên ferhengî da digihin. Em dikarin sîmayên watayên peyvên "keç", "gul", "rovî" û "dîwar"ê li xwarê dîyar bikin:

Keç:

Rovî:



Gul:



Dîwar:



2. Wataya mebestdar:

Wataya mebestdar watayeka pragmatîkî ye; çinku li vir wataya peyva ferhengî bi rêya dewrûberê dihê dîyarkirin. Ev çende dibe eger ku di vî cureyê watayê da peyv di mebesta xwe ya resen da bi kar bihê, ji ber ku firêker bi rêya dewrûberê, peyva ferhengî ji bo watayeka taybetî û xwedî û destnîşankirî bi kar tîne ango peyv bi tenê dibe hilgira yek watayê. Bi watayeka din, di wataya mebestdar da ew wataya gîştî û berbelav a peyva ferhengî namîne, çinku dewrûber û mebest dihêne hebûnê. Vêca li vir çêdibe ku mebesta firêkerî ji peyva "keç"ê pîrejinek be û ji peyva "rovî" mirovek be yan her tiştekê din be û mebesta wî ji peyva "gul"ê keçek be yan welat be û ji peyva "dîwar"ê desthilat be yan jêrxaneya (binesazî) civakî be yan jî projeyeka dîyarkirî bejî planek be yan her tiştekê din be ku wergir bi rêya dewrûberê dê di mebesta firêkerî da bigihe û ew wataya mebestdar dê li cemê aşkera û dîyar bibe.

I. WATAYA AŞKERA Û WATAYA VEŞARTÎ

1. Wataya aşkera:

Wataya aşkera watayeka semantîkî ye; ji ber ku di vî cureyê watayê da rûyê jiderve û rûyê jinavda yên risteyan hevdu digirin. Ev çende dibe eger ku di vê watayê da mebesta firêkerî bi aşkerayî bihê derbirîn û hemû takekesên civakê di wataya wan risteyan "ragihandin, fermandan, pirs" da bigihin.

2. Wataya veşartî:

Wataya veşartî watayeka pragmatîkî ye; ji ber ku di vî cureyê watayê da rûyê jiderve û rûyê jinavda yê risteyan hevdu nagirin, ji ber vê yekê di vê wataya pragmatîkî da eger dewrûber nebe ku pile û radeya awazeyê dîyar bike, wê demê wergir nikare di mebesta firêkerî da bigihe. Vêca li vir ji bilî wê yekê ku ew riste bi pirs an ragihandin an fermandanê hatibe derbirîn, dema ku dihêne derbirîn, hin watayên din ji wan risteyan peyda dibin.

Li vir em ê hewl bidin wataya aşkera û veşartî di van risteyên jêrîn da dîyar bikin:

1- Tirumbêlê bi şev nehajo.

Da ku wataya vê risteya li jor aşkera bibe, divê mebesta firêkerî ji wê risteya derbirî bi tenê fermandan be, ne ku amojgarî û gef be ... û dema ku mebest bû amojgarî û gef ..., wê demê pragmatîk dê serederîyê li gel wê watayê bike. Ev jî bê guman bi rêya "awazeyê-intonation" li gel raçavkirina dewrûberê, mebesta firêkerî li dev wergirî aşkera dibe ku wê demê ew wata dê bi navê wataya veşartî bihê binavkirin.

2- Ez di nav ahengê da nebûm.

Herçende ev risteya li jor risteyeka ragihandinî ye, lê belê di gel wê yekê jî li gor dewrûber û awazeyê dikare bi mebesta "bêgunehîyê-تبرئة" jî bihê. Ev çende dibe eger ku wataya risteya navbirî ji wataya xwe ya aşkera derkeve û bikeve çarçoveya wataya veşartî.

3- Ji ber çi hwîn giringîyê bi zanistî naden?

Wataya aşkera ya vê risteya navbirî pirskirina egera giringînedana bi zanistê ye. Lê belê bi rêya dewrûber û awazeyê ew riste çend watayên din jî bi xwe ve digire; wekî gazin, nerazîbûn, daxwazî û amojgarî û ... hwd ku ev jî watayên veşartî yên wê risteyê ne.

4- Wê zad xwar?

Herçende ev risteya navbirî, risteyeka pirsê ye ku ev wataya aşkera ya wê risteyê ye, lê belê bi rêya awaze û dewrûberê di şîyan da heye ew riste bi mebesta ragihandinê bihê ku ev jî dibe wataya veşartî ya wê risteyê.

ENCAM

1. Tu watayên destnîşankirî yên peyva ferhengî nînin. Lê wê demê wataya wê dihê destnîşankirin, dema ku di dewrûbereka dîyarkirî da bi kar dihê.

2. Dema ku pêwendîkirin bi rêya sêgoşeya watayî dihê encamdan, du wêne li dev kesê wergir dirust dibin; wêneyek ê endîşeyî ye, ew jî di mêjîyê wî da dirust dibe û wêneyê din ew wêneyê rasteqîneyî ye, ew jî di cîhana jiderve da heye.

3. Dema ku "riste" dikeve dewrûberê bi navê "gotin"ê dihê binavkirin û dema ku "deq" dikeve dewrûberê dibe "gotar".

4. Semantîk bi tenê serederîyê li gel hêmayên zimanî dike, lê belê pragmatîk serederîyê li gel hêmayên zimanî û nezimanî dike û ev çende dibe eger ku tevî di bingeha xwe da her yek ji wan zanisteka serbixwe ye jî têkilîyek di navbera hêmalojî û pragmatîkê da peyda bibe.

5. Guherîna wataya semantîkî li gor guherîna civakî ye, lê belê wataya pragmatîkî li gor kes û dewrûberê dihê guhartin.

6. Wataya semantîkî xwedî watayeka giştî û asayî ye, lê belê wataya pragmatîkî watayeka taybet û neasayî ye.

7. Pêwendîya wataya semantîkî bi wataya ferhengî û wataya pêwendîyê ve heye; lê pêwendîya wataya pragmatîkî bi wataya dewrûberê ve heye.

8. Herçiqas wataya wê bi rêya wataya pêwendîyê jî hatibe dîyarkirin, mijdarî di wataya semantîkî da heye.

9. Wataya semantîkî van tewereyan bi xwe ve digire: "pabendnebûna bi dewrûberê ve", yekeyên semantîkî: "morfema bend, peyv, riste, deq", "şîyana zimanî", "giringînedana bi nîşankaran", "bicihanîna binemayê alîkarîyê", "xwendina hêmayê", "wataya ferhengî" û "wataya aşkera".

10. Wataya pragmatîkî jî van tewereyan bi xwe ve digire: "pabendbûna bi dewrûberê ve", yekeyên pragmatîkî: "îdyem, gotin, gotar", "çalakîya axiftinê", "giringîdana bi nîşankaran", "derbaskirina binemayê alîkarîyê", "xwendina mêjîyî", "wataya mebestdar" û "wataya veşartî".

LÎSTEYA JÊDERAN

A- JÊDER BI ZIMANÊ KURDÎ

1. ئارا عەلی ئەحمەد، گۆتێن واتایا شێوازی بۆ هەڤ واتایا تەواو، گوڤەرا بادینان، ناما ماستەرێ، کۆلێژا ئاداب، زانکۆیا دهۆک، ٢٠٠٧

2. ئورەحمانی حاجی مارف، وشەی زمانی کوردی، چاپخانەی کوری زانیاری کورد، بەغدا، ١٩٧٥

3. احمد حسن فتح الله، بکەر وەکو بەشێکی سەرەکی رستە لە زمانی کوردیدا، نامەی ماستەر، کۆلیجی ئاداب، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ١٩٩٠

4. بەکر عومەر عەلی مەعروف، میتافور لە روانگەی زمانەونیەوە، نامەی دکتۆرا، کۆلێژی زمان، زانکۆی سلێمانی، ٢٠٠٠

5. بێخال عبدالله سعید، واتاسازی وشە، نامەی ماستەر، کۆلیجی ئاداب، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ١٩٨٩

6. سازان رضا معین، واتا و دەوروبەر، نامەی ماستەر، کۆلیجی پەروەردە بۆ زانستە مرۆڤایەتییەکان، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ٢٠٠٥

7. سەعید حەجی تاهر و پیرۆژ حسین ئەحمەد، چەند لایەنەکێن جئدا د ناڤبەرا هەر دوو شیوەزارێن شنگالێ و ئامێدی دا، گوڤارا رامان، ژ (١٩)، هەولێر، کانوونی دووەمی ١٩٩٨

8. سەلام ناخۆش، پۆختەیەک دەرباری زمانناسی: مێژوویی، بونیادگەری، چومسکی، چاپی یەکەم، چاپخانەی چوارچرا، هەولێر، ٢٠٠٥

9. سەلام ناخۆش، پۆختەیەک دەرباری پراگماتیکس-ەوە لە (زمانناسی و هەندێ بابەتی زمانناسی کوردی)، بڵاوکراوەکەکانی کتیبفروشی سوران، هەولێر، (بێ سال)

10. طالب حسين علي، هەندێ لایەن لە پەیوەندی نێوان ڕستە و واتا لە کوردیدا، نامەی دکتۆرا، کۆلێژی ئاداب، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ١٩٩٨

11. عەبدوڵا عەزیز محەمەد، گۆڕانی واتای وشە لە زمانی کوردیدا، نامەی ماستەر، کۆلیجی ئاداب، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ١٩٩٠

12. عەبدولسەلام نەجمەدین عەبدوڵلا، شیکردنەوەی دەق شیعری لە ڕووی زمانەوانیەوە، نامەی ماستەر، کۆلێجی زمان، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ٢٠٠٧

13. عەبولواحید موشیر دزەیی، واتا لەنێوان سیمانتیک و پراگماتیکدا، مجلة الأستاذ، العدد (٥٦)، ٢٠٠٦

14. عەبدولواحید موشیر دزەیی، ڕەهەندی دەروونی لە بواری ڕاگەیاندن دا، چاپی یەکەم، چاپخانەی شەهاب، هەولێر، ٢٠٠٥

15. فاضل عمر، نێفگر د زمانێ کوردی دا، گوڤاری ڕۆشنبیری، ژ (١٠٩)، بەخدا، ئاداری ١٩٨٦

16. ڤیان سلیمان حاجی سلێمانەیی، ڕێکەوتن لە شێوەی ژووروویی زمانی کوردیدا، نامەی ماستەر، کۆلیجی ئاداب، زانکۆی سەلاحەددین – هەولێر، ٢٠٠١

17. قەیس کاکل توفیق، ژن و ئافرەت لەدیدی سیماپێکهێنەرەکاندا، چاپخانەی زانکۆی سەلاحەددین، هەولێر، ٢٠٠٠

18. محمد معروف فتاح، هێماکاری و زمانەوانی، گۆڤاری کاروان، ژ (٢٨)، بەغدا، کانونی دووەم ١٩٨٥

19. محمد معروف فتاح، زمانەوانی، زانکۆی سەلاحەددین، ١٩٩٠

20. وریا عومەر ئەمین، ئیملای کوردی و چەند تێبینیەک، گۆڤاری کوری زانیاری عیراق – دەستەی کورد، ژ (٩)، بەغدا، ١٩٨٢

21. وریا عومەر ئەمین، بواری زمانەوانی و ئاسەکانی شیکردنەوە، ئەکادیمی کۆواری کۆری زانیاری کوردستان، ژمارە (٥)، هەولێر، ٢٠٠٧

B- JÊDER BI ZIMANÊ EREBÎ:

22. **ابراهيم انيس**، دلالة الالفاظ، مكتبة الانجلو المصرية، ١٩٥٨

23. **احمد مختارعمر**، علم الدلالة، مكتبة دار العروبة للنشر والتوزيع، الطبعة الأولى الكويت، ١٩٨٢

24. **اسماعيل الملحم**، التجربة الابداعية، دراسة في سايكولوجية الاتصال والابداع، اتحاد كتاب العرب، دمشق، ٢٠٠٣ (انترنيت: www.awa-dam.org)

25. **ازولدوتزيفان، الدلالة والمرجع**، دراسة معجمية من (المرجع والدلالة في التفكير اللساني الحديث) ترجمة وتعليق: عبدالقادر قنيني، افريقيا الشرق، لبنان، ٢٠٠٠

26. **اف. آر. بامر**، علم الدلالة، ترجمة: مجيد عبدالماشطة، مطبعة العمال المركزية، بغداد، ١٩٨٥

27. **بطرس حرفوش**، المنجد في الاعلام، الطبعة السادسة والعشرون، الناشر مؤسسة انتشارات دار العلم، طهران، ايران، ١٣٨٦ (٢٠٠٧)

28. **بيار غيرو**، السمياء، ترجمة: انطوان ابي زيد، الطبعة الأولى، منشورات عويدات، بيروت – باريس، ١٩٨٢

29. **بير جيرو**، علم الدلالة، ترجمة: منذر العياشي، الطبعة الأولى، دار طلاس، دمشق، ١٩٩٢

30. **توني لحسن**، التعريف المصطلحات في بعض المعاجم العربية، التعريف المصطلح التداولي نموذجا (انترنيت: www.members.lycos .far)

31. **جاسم محمد العبود**، مصطلحات الدلالة العربية، دراسة في ضوء علم اللغة الحديث، الطبعة الأولى، دار الكتب العلمية، بيروت، ٢٠٠٧

32. **جمعة سيد يوسف**، سايكولوجية اللغة والمرض العقلي، سلسلة عالم المعرفة، سلسلة (١٤٠) ، الكويت، ١٩٩٠

33. **جورج مونان**، مفاتيح الألسنية، ترجمة: طيب بكوش، تقديم: صالح قرمادي، تونس، ١٩٨١

34. **جون لاينز**، علم الدلالة، ترجمة: مجيد عبد الماشطة وآخرون، كلية الآداب، جامعة بصرة، ١٩٨٠

35. **جون لاينز**، علم الدلالة السلوكي، ترجمة: مجيد الماشطة، دار الحرية للطباعة، بغداد، ١٩٨٦

36. **جون لاينز**، اللغة والمعنى والسياق، ترجمة: عباس صادق عبدالوهاب، دار الشؤون العلمية الثقافية العامة، بغداد، ١٩٨٧

37. **جيفري ليش وجيني توماس**، اللغة والمعنى والسياق: البراغماتية، المعنى في السياق، من (الموسوعة اللغوية)، تحرير: ن. ي. كولينج، ترجمة: محي الدين الحميدي وعبدالله الحميدان، المجلد الأول، النشر العلمي والمطابع، جامعة الملك سعود، رياض، ١٤٢١ (٢٠٠٠)

38. **خضر اكبر حسن كصير**، التفكير الدلالي عند الجاحظ في ضوء السيميائية الحديثة، رسالة ماجستير، كلية اللغات، جامعة سليمانية، ٢٠٠٤

39. **داوود عبدة**، دراسات في علم اللغة النفسي، الطبعة الأولى، مطبوعات جامعة كويت، ١٩٨٤

40. **دومينيك مانغونو**، المصطلحات المفاتيح لتحليل الخطاب، ترجمة: محمد يحياتين، الطبعة الأولى، منشورات الاختلاف، الجزائر، ٢٠٠٨

41. **رانيا سالم الصرايرة**، صراع الانماط اللغوية، الطبعة الأولى، دارالشروق للنشر والتوزيع، عمان، الأردن، ٢٠٠٠

42. **رجب عبدالجواد ابراهيم**، دراسات في الدلالة والمعجم، دار غريب للطباعة والنشر والتوزيع، القاهرة، ٢٠٠١

43. **روبرت شولز**، السيمياء والتأويل، ترجمة: سعيد الغانمي، الطبعة الأولى، ١٩٩٤

44. **روي. سي. هيجمان**، اللغة والحياة والطبيعة البشرية، ترجمة: داوود محمد السيد، الكويت، ١٩٨٩

45. **سالم سليمان الخماش**، المعجم وعلم الدلالة، للطلاب المنتظمين، ١٤٢٨ (٢٠٠٧) (انترنيت: htt:/ /www.angelfire.com/tx /lisan)

46. **ستيفن اولمان، دور الكلمة في اللغة**، ترجمة: كمال بشر، الطبعة الثانية عشرة، دار غريب للطباعة والنشر والتوزيع، القاهرة، ١٩٩٧

47. **شاهر الحسن**، علم الدلالة السمانتيكية والبراجماتية في اللغة العربية، الطبعة الأولى، دار الفكر للطباعة والنشر والتوزيع، عمان، الاردن، ٢٠٠١

48. **شكور كاظم العوادي**، البحث الدلاي عند ابن سينا، في ضوء علم اللغة الحديث ((اللسانيات))، رسالة ماجستير، كلية الآداب، جامعة بغداد، ١٩٩٠

49. **صالح الكشو**، مدخل في اللسانيات، الدار العربية للكتاب، صقارض، تونس،١٩٨٥

50. **صفية مطهري**، الدلالة الإيحائية في الصيغة الإفرادية، منشورات اتحاد كتاب العرب، دمشق، ٢٠٠٣ (انترنيت: www.awu-dam.org)

51. **صلاح فضل، نظرية البنائية في النقد الأدبي**، القاهرة، ١٩٩٢

52. **عادل فاخوري**، الاقتضاء في التداول اللساني، مجلة عالم الفكر، مجلد (٢٠) ، العدد (٣)، الكويت

53. **عبدالرحمن ايواب**، تحليل عملية التكلم، مجلة عالم الفكر، مجلد (٢٠) ، العدد (٣)، الكويت، ١٩٨٩

54. **عبدالقادر أبو شريف وآخرون**، علم الدلالة والمعجم العربي، الطبعة الأولى، دار الفكر للنشر والتوزيع، عمان، الأردن، ١٩٨٩

55. **عبدالقادر عبدالجليل**، المعجم الوظيفي لمقاييس الأدوات النحوية والصرفية، دار الصفاء للنشر والتوزيع، عمان، الاردن، ٢٠٠٦

56. **عبدالكريم مجاهد**، علم اللسان العربي، فقه اللغة العربية، الطبعة الأولى، دار أسامة للنشر والتوزيع، عمان، الأردن، ٢٠٠٥

57. **عبدالله الطويرقي**، علم الاتصال المعاصر، دراسة في الانماط والمفاهيم وعالم الوسيلة الاعلامية، الطبعة الثانية، الناشر: مكتبة العبكيان، الرياض، ١٩٩٧

58. **عبدالهادي بن ظافر الشهري**، استراتيجيات الخطاب، مقاربة لغوية تداولية، الطبعة الأولى، دار الكتاب الجديد المتحدة، بيروت، ٢٠٠٤

59. **عبالوهاب ترو**، وعي البعد الالسني لمسألة الدلالة، مجلة الفكر العربي المعاصر، العدد (٦٨-٦٩) ، بيروت، ١٩٨٩

60. **عزمي اسلام**، مفهوم المعنى دراسة تحليلية، حوليات كلية الآداب، الحولية السادسة، الكويت، ١٩٨٠

61. **علي زوين**، منهج البحث اللغوي بين التراث وعلم اللغة الحديث، الطبعة الأولى، دار الشؤون الثقافية العامة، بغداد، ١٩٨٦،

62. **فردينان دي سوسور**، علم اللغة العام، ترجمة: يوئيل يوسف عزيز، مراجعة: مالك يوسف المطلبي: مطابع دار الكتب للطباعة والنشر، جامعة الموصل، ١٩٩٨

63. **فريد عوض حيدر**، علم الدلالة، دراسة نظرية وتطبيقية، الطبعة الأولى، النشر: مكتبة الآداب، القاهرة، ٢٠٠٥

64. **فوزي حسن الشايب**، محاضرات في اللسانيات، منشورات وزارة الثقافة، عمان الأردن، ١٩٩٩

65. **كريم ذكي حيام الدين**، التحليل الدلالي اجراءاته ومناهجه، الجزء الأول، دار الغريب للطباعة والنشر والتوزيع، القاهرة، ٢٠٠٠

66. **كلود جرمان وريمون لوبلان**، علم الدلالة، ترجمة: نور الهدى لوشن، المكتب الجامعي الحديث، ٢٠٠٦

67. **محمد الجزار**، الفكر الانساني، الطبعة الأولى، مركز الكتاب للنشر، القاهرة، ٢٠٠٦

68. **محمد حماسة عبداللطيف**، النحو والدلالة، مدخل لدراسة المعنى النحوي الدلالي، دار غريب للطباعة والنشر والتوزيع، القاهرة، ٢٠٠٦

69. **محمد علي الخولي**، معجم علم اللغة النظري، انكليزي-عربي، بيروت، لبنان، ١٩٨٢

70. **محمد محمد داوود**، العربية وعلم اللغة الحديث، دار غريب للطباعة والنشر والتوزيع، القاهرة، ٢٠٠١

71. **محمد محمد يونس علي**، مقدمة في علمي الدلالة والتخاطب، الطبعة الأولى، دار الكتاب الجديد المتحدة، بيروت، ٢٠٠٤

72. **محمد محمد يونس العلي**، المعنى وظلال المعنى، انظمة الدلالة في اللغة العربية، الطبعة الثانية، دار المدار الاسلامي، بيروت، لبنان، ٢٠٠٧

73. **محمود السعران**، علم اللغة، مقدمة للقارئ العربي، اسكندرية، مصر، ١٩٦٢

74. **محمود عكاشة**، لغة الخطاب السياسي، دراسة لغوية تطبيقية في ضوء نظرية الاتصال، دار النشر للجامعات، القاهرة، ٢٠٠٥

75. **محمود عكاشة**، التحليل اللغوي في ضوء علم الدلالة دراسة في الدلالة الصوتية والصرفية والنحوية والمعجمية، دار النشر للجامعات، القاهرة، ٢٠٠٥

76. **منقورعبدالجليل**، علم الدلالة، اصوله ومباحثه في التراث العربي، منشورات اتحاد كتاب العرب، دمشق، ٢٠٠١

77. **مهاباد هاشم ابراهيم**، الانزياحات الخطابية والبيانية في كتاب دلائل الإعجاز لعبدالقادر الجرجاني في ضوء المنهج التداولي، رسالة ماجستير، كلية اللغات، جامعة صلاح الدين-اربيل، ٢٠٠٦

78. **ميشال زكريا**، الالسنية علم اللغة الحديث المبادئ والاعلام، الطبعة الثانية، المؤسسة الجامعية للدراسات والنشر والتوزيع، بيروت، ١٩٨٣

79. **مليكا افيتش**، اتجاهات البحث اللساني، ترجمة: سعيد عبدالعزيز مصلوح ووفاء كامل فايد، الطبعة الثانية، الهيئة العامة لشؤون المطابع الاميرية، ٢٠٠٠

80. **نور الهدى لوشن**، علم الدلالة، دراسة وتطبيق، المكتب الجامعي الحديث، الازراريطة، الاسكندرية، ٢٠٠٦

81. **نوري جعفر**، اللغة والفكر، الرباط، المغرب، ١٩٧١

82. **ن.ي. كولنج**، الموسوعة اللغوية، ترجمة: محي الدين حميدي وعبدالله الحميدان، المجلد الثالث، النشر العلمي والمطابع، جامعة الملك سعود، رياض، ١٤٢١ (٢٠٠٠)

83. **هدسون**، علم اللغة الاجتماعي، ترجمة: محمود عبدالغني عياد، مراجعة وتقديم: عبدالامير الاعسم، بغداد، ١٩٨٧

84. **يحيى عبابة وآمنة الزغبي**، علم اللغة المعاصر، مقدمات وتطبيقات، دار الكتاب الثقافي، اربد، الأردن، ٢٠٠٥

C- JÊDER BI ZIMANÊ FARISÎ

85. **كورش صفوي**، در امدى بر معنى شناسى، چاپ دوم، نشر سوره مهر، تهران، ١٣٨٣ (٢٠٠٤)

86. **مهرى باقرى**، مقدمات زبانشناسى، چاپ هفتم، نشر قطره، تهران، ١٣٨٣ (٢٠٠٤)

87. Aitichson. J, linguistic, Great Britain, hodder dstonghton, 1993

88. Cruse. D. A, lexical semantics, Cambridge, Cambridge University Press,1986

89. Crystal. D, A dictionary of linguistics and phonetics, Cambridge, 1991

90. Farrokhpey. M, language, fourth edition, Azmon, Tehran, 1997

91. Leech. G, Semantics, London, Longman, 1974

92. Levinson s. C, Pragmatics, Cambridge, Cambridge University Press, 1997

94. Loyns. J, Semantics, volume^2, Cambridge, Cambridge University Press, 2000

94. Verchuerence. J, Understanding Pragmatics, Oxford, Oxford university Press, 2003

95. yule. G, Pragmatics, oxford, oxford university press, 2000

96. yule. G, The Study of language, third edition, Cambridge, Cambridge University Press, 2006

97. Televizyona Dihokê, Deng û Bas, 21.06.2008

98. Hecî Ceifer, Bejn û Gotinêt Kurdî, Dezgeh Spîrêz, Çapxaneya Hecî Haşim, Hewlêr, 2006

99. Hecî Ceifer, Gotinêt Mezinan li Devera Behdînan, Çapxaneya Elai, Bexda, 1986

FERHENGOK

intonation	awaz
pa role	axiftin
idiom	îdyem
encoding	kirine hêma
object	babet
maxim of relation	binemayê pêwendîyê
maxim of quantity	binemayê çendêtîyê
maxim of quality	binemayê çawayîyê
maxim of manner	binemayê şîwazî
paralanguage	perezimanî
syntagmatic relation	pêwendîya asoyî
reference relation	pêwendîya amajeyî
paradigmatic relation	pêwendîya stûnî
pragmatics	pragmatîk
referent	ten
signifier	dal (form)
semantic units	yekeyên watayî
text	deq
implicature	derkevte

context	dewrûber
decoding	vekirina hêmayê
minimal pair	cotuk
performance	çalakî
surface structure	rûyê jiderve
deep structure	rûyê jinavda
linguistics	zimannasî
basictriangs	sêgoşeya watayî
competence	şîyan
sender	firêker
speech acts	kirdeyên axiftinê
presupposition	girîmanên pêşîyê
utterance	gotin
discourse	gotar
receiver	guhdar/wergir
signified	medlûl
deixis	nîşankar
homonymy	hawbêj
arbitrary	xwebixweyî
synonym	hevwata
thought	hizir

semiotics	hêmalojî
icon sign	hêmaya aykonî
index sign	hêmaya îndêksî
symbol sign	hêmaya sembolî
sign	hêma
connotative meaning	wataya barkiraw
themantic meaning	wataya babetê
sense meaning	wataya pêwendîyê
conceptual meaning	wataya çemkî
expressive meaning	wataya derbirînê
effective meaning	wataya derûnî
contextual meaning	wataya dewrûber
proper meaning	wataya rasteqîneyî
reflected meaning	wataya rengvedanê
external meaning	wataya zelal/wataya aşkera
grammatical meaning	wataya rêzimanî
semantics	watasazî
syntax meaning	wataya sentaksî
stylistics meaning	wataya şêwazî
lexical meaning	wataya ferhengî
phonological meaning	wataya fonolojî

internal meaning	wataya veşartî
intended meaning	wataya mebestdar
morphology meaning	wataya morfolojî
metaphorical meaning	wataya mîtaforî
non-descriptive meaning	wataya nepesinî
the meaning of meaning	wataya watayê
descriptive meaning	wataya pesinî
collective meaning	wataya pêkvehatinê
sound image	wêneyê dengî

ملخص البحث

يتناول هنا البحث (المعنى بين الدلالة والتداولية) والتي تقوم كل واحدة منهما بدراسة المعنى من وجهة نظر خاصة.

يتكون هذا البحث من مقدمة وثلاثة فصول مع النتائج المستنبطة منها.

يتناول الفصل الاول المعنى والوحدات الدلالية والذي يتألف من خمسة محاور ، يتضمن المحور الاول مفهوم المعنى والمحور الثاني علاقة الدال بالمدلول والمحور الثالث مخصص للمعنى والعلاقة المكانية والمحور الرابع يدرس أنواع المعنى (القاموسي، الفونولوجي، القواعدي، الاسلوبي، السياقي، الموضوعي، المجازي والضمني)، والمحور الاخير يبحث في الوحدات الدلالية (المورفيم المقيد، الكلمة، التركيب، الكناية، الجملة، القول، النص والخطاب) .

الفصل الثاني يحمل العنوان مستويات المعنى ويتألف من خمسة محاور، المحور الأول يدرس مقدمة عن مستويات المعنى والمحور الثاني يتناول المعنى الدلالي والمحورالثالث يوضح مبادئ المعنى الدلالي (الرمزوالظاهرة) والمحور الرابع مخصص للمعنى التداولي، أما المحور الاخير يدرس مبادئ المعنى التداولي (المرسل، المتلقي، الموضوع والسياق).

الفصل الثالث مخصص للمعنى بين الدلالة والتداولية ويتألف من تسعة محاور، المحور الاول يتناول آراء بعض اللغويين بخصوص الاختلاف بين الدلالية و التداولية والمحور الثاني التقيد بالسياق وعدم التقيد به والمحور الثالث يدرس الوحدات الدلالية والوحدات التداولية والمحور الرابع يتضمن القدرة اللغوية والأداء الكلامي، أما المحاور الخمس الاخيرة فتتألف من (عدم اهتمام بالتعين والاهتمام به)، (الالتزام بمبدأ التعاون وأختراق هذا المبدأ)، (قراءة الرموز وقراءة العقل)، (المعنى القاموسي والمعنى المقصود) أما المحور الاخير فهو يتضمن المعنى الظاهر والمعنى المخفي.

وفي نهاية هذا البحث توصلنا الى جملة من النتائج.

ABSTRACT

This study deals with the meaning between Semantics & Pragmatics in which each deals with meaning differently. This thesis consists of an introduction & three chapters in addition to its concluded results.

In Chapter one, the researcher deals with meaning & semantic units wich consist of five axes: the first axis talks about the concept of meaning, the second one handles the relation between the signifier & the signified, the third axis is dedicated to the meaning & adverb of place, the fourth one studies the types of meaning (The Lexical, the phonological, the grammatical, the Stylistics, the contextual, the thematic, the metaphorical & the implicit meanings) the final axis is dedicated to semantic units (the bound morpheme word, compound, sentence, text, and discourse).

Chapter two tackles levels of meaning which also includes five axes:

The first axis studies an introduction on levels of meaning, the second one deals with the semantic meaning, the third axis explains the principle of semantic meaning (the sign & the phenomenon), the fourth one is dedicated to the pragmatic meaning, the final axis deals with the principle of pragmatic (sender, receiver, subject & context).

Chapter three tackles the meaning in semantics and in pragmatics, this chapter consists of nine axes: the first axis deals with the opinions of some linguists about the difference between Semantics &Pragmatics the second one concerned with not conforming to context &conforming to context, the third one studies the semantics & the Pragmatics units, the fourth axis comprises the linguistic competence & speech performance & the final five axes consist of not caring for deixs & caring for deixs, the commitment to the cooperative principle & violating it, reading the signs & mind, the lexical & the intended meaning & the final axis contains the external & the internal meaning.

Eventually, we reached a number of results.

Ev pirtûk, nameyeka "master"ê ye, di sala 2008'an da pêşkêşî Kolêja Adabê ya Zankoya Dihokê bûye, wekî pişkek ji pêdiviyên pileya masterê di edebê kurdî da, Name bi serperiştîya "Dr Ebdilwahid Xorşîd Dizeyî" bû.

SZK